

# folklora kurdan

Zargotin zêgotin e,  
Zêgotin zorgotin e!

Sal: 2  
Hejmar: 7  
Tîrmeh  
Gelawêj  
Rezber  
2016



KURDÎ-DER  
NAVEND



ŞAREDIRIYA BAJARÊ  
MEZIN A AMEDÊ



ELÎ XENDAN

Kovara Folklorê ya  
Sê Mehane  
Sal: 2 Hejmar: 7

**Xwedî:**

Li ser navê Şaredariya  
Mezin a Amedê,  
Gultan KIŞANAK

**Edîtor:**

Jêhat ROJHILAT  
Zehra GULTEKÎN


**Redaksiyon:**

Mezher AKTAŞ

**Desteya Weşanê:**

Mahpûs SERHEDÎ  
Semra BÎRTANE  
Denîz MAYA  
Weyî RÊZAN  
Asmîn ÛYANIK  
Mem MUKRIYANÎ  
Serhat KILIÇ

**Wêne:**



WÊNEÎSTAN  
DİFAK  
Orhan KARTAL  
Dûrzan CÎRANO  
Omîd FARROKH  
Îskan ALTIN  
Şinasi ÖZKILIÇ  
Darîus FELAT  
Nesiho ASÎRAKÎ  
Yunus BARTIN  
Nofa ROZA  
Ozan SOLHAN  
Bîşar BEKTAŞ  
Nupelda Zilan KAYNAK  
Mazlum EZİN  
Behçet ÇİFTÇİ

Grafik  
Sêwirandin  
**naturel**  
Naturel Medya Reklam  
www.naturelbasin.com  
0412 251 61 98






Zafer HAN  
Abduh KAPLAN  
Vedat AKTÜRK  
Huseyin SEÇKİN  
Dündar UGURLU  
Tahsin MEMİŞ  
Mehmet DEĞİRMENCİOĞLU

**Xêz:**

Yusuf ALKAN  
Serkan KARA  
Murat BİNGÖL  
Ergin KAYA (Kawa)  
Guldar TURSUN ÖZSOY

**Navnîşan:** Huzurevleri Mah.  
Doktor Sıtkı Göral Cad. 13. Sok.  
No: 4-1 Kayapınar-Diyarbakır  
Tel: 0530 301 11 53

**Têkilî:**

 folklorakurdan@gmail.com  
 kovora folklorakurdan  
 kovarafolklorakurdan

**Her nivîskar ji nivîsa xwe  
berpirsiyar e.**

**Çap:** Gün Matbaacılık  
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23  
Küçükçekmece/İSTANBUL  
Tel: 0212 580 63 81



- 3 Ji Edîtoriyê
- 4 Di Zargotina Kurdan de Gotinên Pêşyan û Biwêj, **Jêhat ROJHILAT**
- 13 Çiklikçadir, **Ridvan TAY**
- 14 Kulturê Ma ra Tay Numûneyê Mîtolojîkî, **Sedef KANDEMÎR**
- 16 Eliyê Pîrê, **Jana DILA**
- 24 Elîyo Kor, **Mehmet TOPAL**
- 25 Çîrokên Çêbûna Sewalan, **Mustafa GAZÎ**
- 28 Navê Pez û Dewarên Kedî û Alav û Amûrên Wan, **Şêxmûs ASLAN**
- 32 Hîkayeya Şuware, **Ugur SERMÎYAN**
- 34 Çend Xwarinên Mûşê, **Ozan AKTEKÎN**
- 40 Çend Dûrikên Kurdî ji Dêrdora Gimgimê, **Cihan ROJ**
- 44 Dirûkê Maya Ehmedî, **Zehra GULTEKÎN**
- 46 Elî Tico, **Zeynep YAŞ**
- 50 Nifirên bi Tîpa "D" yê, **Asmîn ÎYANIK**
- 52 Gûevendê Cindûn, **Veysi ŞİMŞEK**
- 54 Kincên Kurdên Horasanê, **Şoreş REŞÎ**
- 58 De Wayê (Wey Dil), Stranek Şakiro, **Fadil BOTAN**
- 62 Şamî (Werd), **Surya HÛMAN**
- 64 Çîrokên Navlêkan 6, **Mem MÛKRÎYANÎ**
- 69 Baweriyên Gel, **Bahoz BARAN**
- 71 Siûd, **Denîz MAYA**
- 74 Kulî û Çivê, **MAHPÛS SERHEDÎ**
- 81 Mintiqaya Şankuşî ra Tay Fiqrayî, **M. Mamet QETEKONIJ**
- 83 Lîstikên Zarokan ên Herêma Farqînê, **Leyla SANCAR**
- 86 Elik û Fatik, **Wîldan SEVÎM**
- 88 Zîzanê, **Feratê DENGIZÎ**
- 90 Sosê û Besê, **Omer TEKÎN**
- 92 Numûneyê Bawerîyanê Qedîman Zîyarî, **Serhat KILIÇ**
- 94 Hedlîlîkê û Medlîlîkê, **Feqiyê DÎNİK**
- 96 Jehr ji Merê Kor, Tenduristî ji Xwedayê Dilovîn, **HASAN AKBOGA**
- 98 Vateyê Verênan, **Semra BÎRTANE**
- 100 Melayê Gulê, **Mehmet Emîn HEZER**
- 102 Mamik, **Mewlûd BAWER**
- 103 Dekî, **Leyla GULTEKÎN**



## Dostno.

Xwişk birayên ezîz, kal û pîrên dilzîz û keç û xortên dilovan; di nava van keft û leftên siyasî de, ji paytexta dilan, ji Amedê silav ji bo we hemûyan. Silav ji her çar perçeyên; ku îro di malzaroka xwe de hêvî û neviyên pêşerojê dihevin.

Em car din bi hejmareke bi dilê we li gel we ne. Di vê hejmarê de em ê we geh bibin çiya û baniyên Xorasanê û cil û bergên Kurdên Xorasanê yên rengorengo li bejn û bala we ya tenik û zirav bikin; geh em ê we bibin zozanên Serhedê xwarinên Mûşa şewitî bi we bidin nasîn; da ku hûn tilf û pêçiyê xwe jî pê re bixwin. Em ê ji wir berê we bidin Farqîna rengîn; cih û warê Zembîlfiroş, Siyabend û Xecê, em ê we li landika periyana demê siwar bikin û we bibin zaroktiya we ya şîrîn; da ku hûn bi darqîtik, gogê bilîzin bi vîzvîzokê li dora xwe bigerin û gêj bibin. Em ê we geh bibin şevbihêrkan bi çîrokên kal û pîran şa bikin û em ê çend şîretên pêşiyana li we bikin da ku şevên me veguherin rojan. Lê ku hûn bi vana yekê jî qîma xwe neyînin em ê nav û nûçikên eceb li we kin û em ê tonek nifiran li we bibarînin. Lê na, em qêmîşê we canik û ciwanmêran nabin, bila di şûna we de stûyê neyar û xêrnexwazan bi heft cihan bişikê, derdê bêderman bikeve canê wan û dermanê wan goştê canê wan be! Bi kin û kurtasî, bi şertê ku hûn tê de nefetisin, kerem bikin bikevin nava behra zargotina me ya şîrîn û tê de bi kêfa dilê xwe avjeniyê bikin.

Heta hejmarek din bibînin di nav xêr û xweşiyê de.

# DI ZARGOTINA KURDAN DE DE GOTINÊN PÊŞIYAN Û BIWÊJ

Jêhat ROJHILAT

## KURTE

Di zargitina hemû gelan de rol û mîsyona “gotinên pêşiyên û biwêjan” cîyekî xwe yê pir girîng heye. Em ê di vê gotarê de, di destpêkê de hem balê bikîşînin ser vê xalê; hem jî em ê bi kurtasî bi nêrîna zanista folklorê bala xwe bidin pêvajoya derketina holê ya gotinên pêşiyên û biwêjan û kemilandina wan. Herwiha em ê bigîştî li gor erdnîgariyê, belavbûn û bikaranîna gotinên pêşiyên û biwêjan û gotinên herî zêde bi van qaliban re tî ev tevlihevkerin, destnîşan bikin. Di beşa herî dawî de jî em ê gotinên pêşiyên û biwêjan ji alî naverok û teşê ve li ser çend xalên esasî binirxînin da ku cudabûn û hevpariya wan derkeve holê û bi hev re neyên tevlihevkerin. Ji bo ku nivîsa me pir dirêj nebe; me mînakên gotinên pêşiyên û biwêjan rave nekirine.

**Peyvên Kilîl:** Gotinên pêşiyên, biwêj, wate, dirûv, naverok, gel, zargotin, herêm.

## Destpêk

Li gor lêkolînên li ser zimên û mirovahiyê, yê ku heta roja me hatine kirin, ne wek îro be jî, ziman herdem amûrekê sereke yê tekilî û tîgîhîştinê bûye. Herdem daxwaz û xwestek, kefxweşî, şîr û şahî, hest û raman bi zimên hatine hûnandin û ji nivşekê gîhîştine nivşekî din. Bi demê re pêşketina hizir û raman bi xwe re ziman û bi gîştî vegotin jî xurtir kiriye. Vê pêşketinê jî rê daye ku sînor û bergehê peyvê û gotinê berfirehtir bibe. Bi vî awayî jî derveyê wateya wan a rasteqîn, hin wateyê din jî lê hatine bar kirin. Ji van qalibên zimên re biwêj û gotinên pêşiyên tî ev gotin.

## 1. GOTINÊ PÊŞIYAN

Bêguman pêvajoya gotinên pêşiyên bi qasî dîroka mirovahiyê dûr û dirêj e. Demeke pir dirêj xebata herî kevn ya di derbarê gotinên pêşiyên de wek pirtûka Meseleyên Suleyman dihate zanîn. Lê nêzî du sed sal berê lêkolînên li ser Misira Kevn (B.Z. Ss 3 - 1.) ev nêrîn ji holê rakir û gotinên pêşiyên ên Misiyariyan derketin holê. (Kramer Noah S, (2014)

Dihat bawerkirin ku ew gotinên ku wek gotinê pêşiyên li ser perestgehan hatibûn nivîsîn, ji aliyê heft zanbaran ve hatine vegotin. Di nava Hîndûyan de jî Sûtrayên (gotinên pêşiyên) ku di deqên pîroz de jî derbas dibûn, derdikevin pêşberî me. Herwiha gotinên pêşiyên li Rojava, ji ber ku kin û kurt bûna wan di hunera gotinbêjîyê (xîtabet) de ji aliyê Arîsto ve hatine bikaranîn. Pirtûkên pîroz ên weke Zebûr, Tevrat û Încîl jî çavkaniyên sereke yê gotinên pêşiyên û biwêjan tên hesêb.

Lê berhevkarîyên gotinên pêşiyên yê herî kevn ên nivîskî, yê ku gihîştine roja me, xwe digihîne Someriyan (B.Z. Ss 4.-1.) Ji roja me zedetirî 3500 sal berê li ser nivîstekê (kîtabe), ku bi nivîsa mîxî hatiye nivisandin, cih dane derdora 300 gotinên pêşiyên (Sağlam Yaşar, M, 2001). Bêguman ji pêvajoya derketin û kemilandina van gotinên pêşiyên re, bivê nevé pêvajoyeke dûr û dirêj divê. Ev tê wê wateyê ku beriya ev gotin werin nivîsîn jixwe di nava gel de ji mêj ve berbelav bûne.

Wateya ferhengî ya "gotinên pêşiyên" di Erebî de; darbi-mesel, darabi-mesel, durûbu-emsal, mesel û beyan, derbas dibe. Di zimanê Osmanî de; ibare, beyan û îstilah hatiye gotin. Di Tirkî de; pêşî tabîr, dûre bûye atasözü. Di zimanên Ewropî de jî wekî expresion, saýing, idiom, parable, metaphor, paradox tê binavkirin.

Di Kurdî de; bi awayê "peyv" û "gotinên pêşiyên" derbas dibe. Di Kurdî de sedema "peyv" û "gotin" ji hevdu cihê dibe jî lê bitenê di hevokê de ye. Peyv, tê wateya kelîmeyekê bi tenê, lê gotin tê wateya peyvên dibin hevok û biwate. Li hin deverên Kurdan peyv jî di wateya gotinê de tê bikaranîn.

Wateya wêjeyî: Gotinên pêşiyên; hevokên bi darazî, hukmî û bi pendî li nava gel ji bo vegotin û rexneya tiştêkî, bûyerekê yan ramanekê hatin zimên in (Mazî, Ç, 2005). Gotinên pêşiyên li gor herêman bi navên cuda cuda tên bilêv kirin. Weke mînak, li herema Amedê wek gotinên bav û kalan, li herema Botanê gotinên pîr û kalan û li herema Mêrdînê jî wek gotinên pêşiyên me tên binavkirin.

Her wekî ku di wateya peyvê de jî xwe dide der. Gotinên pêşiyên ji bîr û baweriya civakê ya bi hezar salan dawerivîne û gihîştine roja me. Bûyer û tiştê ku tu nikarî bi deqe û saetan vebêjî bi gotineke pêşiyên an biwêjekê, tu dikarî derba xwe ya mirinê lê bidî û ji navê derkevî. Ji ber ku gotinên pêşiyên ce-ribînên bi hezaran salan in. Di wan de kemilandin û xemilandineke bêemsal a dîrok, felsefe, bawerî, çand û dîroka şaristaniyê heye. Bi kurtasî, jiyane di paxila xwe de dihewînin, dilorînin, dimijînin, dimeyînin û wan radigihînin me.

Weke ku Wray û Perkins jî gotiye: Gotinên pêşiyên bi awayekî kin û kurt; ji bo axêver di bilêvkirina hizr, raman û axaftinê de bidestxistina rêya herî hêsan e (Tüm, G, 2010).

Herwiha li gor William R. Bascom (2005, r, 144) fonksiyona gotinên pêşiyên, beralîkirina nerazîbûn û nelihêvkirinên civakî ye û ji bo kesê ku di nava he-wildana lihev kirina hawirdor û qedera xwe jî, rêya aştkirinê ne.

Fonksiyona gotinên pêşiyên û biwêjan ew e, ku hizr û ramanên axêver bilêv bike, bi awayekî pişt-giriyê bide wan hizr û ramanên axêver û herwiha peyama xwe ne rasterê bide guhdaran; da ku şikestinek, dilmayînek, nerazîbûnek pêk neyê. Li vir peyvira guhdêr jî ew e ku divê ji xwe re şîretêkê ji van gotinan hilde; ku hebe şaşiyên xwe jî sererast bike.

Çiya Mazî, di ferhenga xwe ya gotinên pêşiyên de; jêderka gotinên pêşiyên wiha radigihîne me: "Mirov dikare bibêje ku li cihê ku perwerdehî û ragihandinê kêm bûye, hatine gotin. Heta mirov dikare bibêje ku jêderka gotinên pêşiyên li her welatî gund in. Ji ber ku li gundan xwendin kêm e û mirov hê pir bi peyvê ramanên xwe derdikin. Jixwe di şibandin û remzên gotinan de jî ev diyar dibe. Mînak: "nîr, das, ga, dar, devî, cot, kadîn, şivan û ajal (Mazî, Ç, 2005)." Ev nêrîn beriya Çiya Mazî demek dirêj ji aliyê folklornasên Ewropî ve jî hatiye bilêv kirin.

Her çendî gund ji bo gotinên pêşiyên jêderkên sereke bin jî, em di vê xalê de ji birêz Çiya Mazî cuda difikirin. Em nikarin bibêjin ku tekane jêderk gund in. Ji ber ku cihê ku civak lê hebe, gund dibe bajar dibe, bi awayekî hemû hêmanên folklorê jî li wir hene, zindî ne û di nava guherînekê de ne.

## Kevnbûn Nûbûn û Derketina Wan:

Gotinên pêşiyên û biwêj, bêguman cara ewil ji aliyê kesekî ve hatinê gotin; lê di demê de ji aliyê gelek kesan ve hatine pejirandin û bikaranîn. Bi vî awayî civakê li gor xwe teşeyek daye pêşnûmeya cara ewil. Civak bi demê re hinek tiştan li van gotinan zêde dike, hinekan jî jê kêm dike. Aha bi vî awayî gotinên pêşiyên dibin malê gel (Asım Ömer, A. 2007). Piştî ku bi sed hezaran sal di bîra gel de teşe digirin, di gotinên pêşiyên de ji alî teşe û naverokê ve hin guherîn pêk tên. Bi demê re hinek gotinên wan jî çiyê xwe didin hin gotinên din. Hinek ji wan jî, bi demê re ji holê radibin. Her wiha bi demê re û li gor pêdiviyên jiyane, yên nû jî tên afirandin û belav dibin.

## Li Gor Bikaranîna Wan:

Hinek gotinên pêşiyên hene, ku hema bibêje li her deverên cîhanê bi dirûvên cihê cihê; lê di heman wateyê de tên bikaranîn. Di vê derbarê de Gülden Tüm(2010) di gotareke xwe de ji welatên cuda cuda çend mînak dane. Em jî gotineke xwe ya pêşiyên li van mînan zêde bikin û hevpariya di navbera van gotinên pêşiyên ên ji welatên cihê cihê bi hev re destnîşan bikin.

**Kurdî:** Gotina xweş, ji qulê derdixe marê reş.

**Almanî:** Lob wirkt mehr als Tadel ( Pesindayîn, ji irz şikestinê bi bandortir e.)

**Çekî:** Slušné slovo odemyká mnohé dveře. (Gotineke xweş, hemû deriyên vedike.)

**Litvanî:** Liežuvis geležinius vartus išlaužtų.(Ziman dikare deriyê hesinê veke.)

**Macarî:** A szép szó az ellenséget is kibékíti. (Gotina xweş dijmin sekan/aram dike.)

**Tirkî:** Tatlı dil yılanı deliğinden çıkarır. ( Zimanê şîrîn, mar ji qulan derdixe.)

**Slovakî:** Dobré slovo odplaší hada z jeho miesta. (Wek ya Tirkî ye)

Hinek ji wan li her deverên welêt tên bikaranîn. Ev li hemû erdnîgariya welêt belav bûne; Kurmancî, Kimancî, Soranî, Goranî di hemû zaravayan de çiyê xwe qewîn kirine û tên bikaranîn.

Hinek ji wan jî bi tenê li herêmekê tên bikaranîn, bi tenê malê wê heremê ne, ku ev form xurt bin, bi demê re li deverên din jî belav dibin. Ji bo ku ev

rewş baş bê fêmkirin, li gor bikaranîna herêman divê hem lêkolîn û berhevkariyên berfireh, hem jî yên herêmî bîn kirin; da ku mirov bizanibe, kîjan ji wan herêmî ne, kîjan ne herêmî ne. Ji ber ku ev mijar bi serê xwe mijareke sereke ye. Em ê di vê gotarê de li ser vê mijarê pir zêde hûr nebin.

## Gotinên ku bi Gotinên Pêşiyên re Tê Tevlihevkirin:

Gotinên herî zêde bi gotinên pêşiyên re tên tevlihevkirin "biwêj" in. Dema ku mirov taybetmendiya gotinên pêşiyên û biwêjan baş nizanibe, bi gotineke din, mirov baş serwest nebe; dê mirov bi hêsanî herduyan tevlihev bike. Ji ber ku bi rastî, gotinên pêşiyên û biwêj ji gelek aliyên ve wek hev in û dişibihin hev du. Armanca me yek jê ew e ku ; bi vê gotarê ev tevlihevî hinekî be jî bê beralîkirin.

Her wiha, gotinên navdaran jî gelek caran bi gotinên pêşiyên re tên tevlihevkirin. Dema ku mirov gotineke navdaran bihîsti be û navên wan kesan ku ev gotin gotibe neyê bîra meriv, dibe ku her du jî bîn tevlihevkirin. Ji xeynê van, ên ku wek qalib tên bikaranîn, wek; lava/dua, nifir, çêr(dijûn) zûgotinok, mamik û hwd. Carcaran hinek ji wan jî, bi gotinên pêşiyên re tên tevlihevkirin. Her wiha, hinek ji wan hene ku, digel ku di forma nifir, zûgotinok û mamikan de bin jî; ji ber ku agahiyên giştî didin, wek gotinên pêşiyên tên hesêb.

## Ji Alî Wate û Naverokê ve Hin Taybetmendiya Gotinên Pêşiyên:

1. Ji bo ku rîstek bibe gotina pêşiyên; gerek peyvên wê rîstê lihevhatî bin, sal û zeman di ser re derbas bibin û wateya wan ji alî gel ve hatibe pejirandin.

### Mînak:

*Aşê dîna bê av digere.*

*Bext, kela mêran e.*

*Gayê pîs, tim golik e, mêrê pîs, tim lawik e.*

*Kes nabê dewê min tirş e. Ş. Aslan, (2006)*

2. Berî her tiştî di gotinên pêşiyên de darazek heye. Bi vê taybetiyê, mirov dikare gotinên pêşiyên ji biwêjan cuda bike û veqetîne. Ji ber ku di biwêjan de darazekê giştî tune ye; bi tenê şîrovekirina rewşeke taybet heye.



**Mînak:**

*Barê bîaqilan, li piştta bêaqilan e.*

*Çavê kul, ji çavê kor çêtir e. M. Borak, (2005)*

3. Bi gelemperî di wateya mecazî de ne. Tîştê ku qal dikin û tiştê ku li ser radiwestin cuda ne. Bi gelemperî armanc tiştê ku tê qal kirin nîn e. Lutz Rohrich û Wolfgang Mieder, vê rewşê wisa bilêv dikin: Gelek caran wateyên ku bêjeyên gotinên pêşyan di xwe de dihewênin; dixwazin ji derveyê wê hin tiştên din vebibêjin. (Sağlam, M). Ev taybetmendîya gotinên pêşyan, sêwirandina wêjeya gel a bi hezar salan jî nîşan dide. Di vir de heman tişt ji bo biwêjan jî derbasdar e.

**Mînak:**

*Malê bi tirê hatî, bi virê diçe.*

*Masiyê mezin, di ava kûr de digerin.*

*Meke lez, tu yê zimanê xwe bikî gez.*

*Mezînan got, biçûkan fîrot.*

4. Hin gotinên pêşyan hene, ku di wan de têtîkîliya jiyân û xwezayê pir berbiçav e. Gelek caran gotinên pêşyan ji qewimîn û bûyerên xwezayê jî mînakên didin, bîngeha xwe ji wir digirin.

**Mînak:**

*Adarê xweştir e, ji savarê.*

*Av, li serê kaniyê şêlo dibe.*

*Nîsanê dew li kîsan e, li cem kotî û pîsan e.*

*Meha Adarê, berfê da guliyê darê, nema heta êvarê.*

5. Gotinên pêşyan, hinek jê jî rasterast şîretan li ser sincê (exlaq) didin. Di vî warî de, ji qewimîn û cerebeyên berê, şîretên ku hatibin derxistin nîşan didin; da ku peyrevên din jî heman xeletîyan nekin, zirar û ziyaneke nebinin û ji xwe re dersekê jê hildin.

**Mînak:**

*Nesekî zîmano, rehet nebû cano.*

*Pariyê mezin bixwe, gotinên mezin meke.*

*Pariyê xwe xweş kir, rûyê xwe reş kir.*

*Pêşî bifikire, paşê bîaxive.*

6. Hinek ji wan hene ku, tiştê ku jê tê qalkirin, ji bo ku rewş bêtir şênber bibe, li ber çavan were raxistin, hin mînakên li ser hev rêz dikin. Ev piranî ji sê, çar hevokan pêk tên. Hinek ji wan jî wek ristên rêz kirin.

**Mînak:**

*Bi sê awayan mêr hene; ker, kûçik, mêr.*

*Bi sê awayan dost hene; cano, malo, gano.*

*Sê tişt hene bilezet: rez, pez û hurmet.*

*Sê tişt xweş in bi sarî: tîrşîk, mehîr û karî.*

7. Hinek gotinên pêşyan jî di hin waran de, derheqê hinek rastî, felsefe, ferasetan de agahiyan didin û rêbaza nîşanî mirovî didin.

**Mînak:**

*Berê guhdarî bike, paşê bîaxive.*

*Bertîl kevira jî nerm dike.*

*Aqil taca zêrîn e, li serê herkesî nîn e.*

*Aqil li seriyan ne, ne li dirêjiya çokan e.*

*Aşê dînan bê av digere.*

*Av heta şêlo(şêlî) nebe, zelal nabe.*

8. Gotinên pêşyan ên her neteweyekê neynika rabirdûya(pêşeroj) wan in. Di gotinên pêşyan de jiyân, bawerî û toreyên gelî, zîrekî û hişmendîya civakê bi awayekî xweşik(estetîk) cî digire. Ji ber vê yekê gotinên pêşyan neynika neteweyî ne. Bûyer û bobelatên ku hatine serê wê civakê, bîr û bawerîya wê û toreyên wê nîşan didin. Li hemberî bûyerên civakî bîr û bawerîya gelî, helwestên li hember van bûyeran şîrove dikin.

Bêguman zanyarên ku li hember vê nêrînê derdikevin jî hene. Nîvîskarê navdar yê Alman Goethe di vê derbarê de wiha dibêje: Gotinên pêşyan neteweyan vedibêjin; lê divê tu bixwe wan nas bikî. Herwiha li gor folklorên wek Lutz Röhrich-Wolfgang Mieder(2006) jî ne pêkane ku gotinên pêşyan bi giştî xisleta(karakter) wê neteweyê bi me bidin nasîn û li ber çavê me raxin. Herçendî bi kurtasî weke ku Goethe û Lutz Röhrich-Wolfgang Mieder jî li jor: Bi gotinên pêşyan nasandina neteweyekê ne pêkan be jî; bêguman derbarê neteweyan de hin agahiyên bîngehîn jî di xwe de di hewînin.

**Mînak:**

*Av ava biçûkan, peyv peyva mezinan.*

*Avê bîne ji kaniyan, jinê bîne ji esliyan.*

*Axa dewlemend be, xulamê wî serxweş digere.*

*Cîranê xirab weke êşa diranan e.*

9. Hinek ji wan jî di heman mijarê de ji alî wateyê ve, du nêrînên tam dijberî hev derdexin pêş; angoy dijwate ne.

**Mînak:**

*Bila şewata rûyan be, ne tîra dilan be.*

*Bira yarê bira be, jina wî mehr nake.*

*Bila mirov derdê dilan bikêşe, êşa diranan nekêşe*

*Bira tê hawara bira.*

10. Carinan hinek gotinên pêşiyên hene ku ji aliyê wateya naverokê ve pir sivik û ji rêzê xuya dikin; lê mirov nikare bibêje ku ev ne gotinên pêşiyên e. Di van gotinan de wateya wan a mecazî herdem li pêş e, divê mirov li ser wateya wan a duyem bifikire.

**Mînak:**

*Li ser çavan birû hene.*

*Behr bê pêl nabe, kanî bê av nabe.*

*Xwedê derd daye, derman jî daye.*

*Ez ez im, tu tu yî.*

11. Hin gotinên pêşiyên hene ku li gor herêman, çend peyvên wan diguherin. Hinek jî hene ku ji aliyê teşeyê ve bi temamî ji hev cuda ne; lê belê wateya wan yek e; yan jî pir nêzî hev in. Carinan her herêm li gor xwe teşe dide van qaliban û bi vî awayî di nava gelî de belav dibin û tîn pejirandin. Ev awa(form) ne xeletiyek e; ev devlemendiya vegotinê ye.

**Mînak:**

*Biçe mala gur; lê seyê xwe bi xwe re bibe.*

*Biçe mêvaniya dijmin; lê çeka xwe li mal ji bîr meke.*

*Çavê li deriyan, xwelî li seriyên.*

*Çavê li deriyan, birijîn ji seriyên*

*Bila dil bi dil be, bila (li) welatê dûr be; bila tûrê parsê li mil be, binê tûr jî qul be.*

*Bila dil bi dil be, lihêf ji heft cihê qul be; balgîh ji kevir be.*

**Nîşe:** Hinek gotinên pêşiyên hene mirov dibêje qey vê rêbazê xira dikin. Di van gotinên pêşiyên de rêza peyvan tê guhertin, ji rêzkirina nû wateyê cuda derdikeve, rêza rista nû dibe gotineke pêşiyên a nû. Ş. Aslan (2006). Birastî jî dema ku meriv li van gotinan dinihêre, kîjan bêje li ber pêveberê be ew tê kirpandin. Di gotina "Car zane, zêr zane, zor zane." de girîngiya zorê derdikeve pêş; lê di gotina "Zêr zane, zor zane, car zane" de ya herî girîng "car" e û ew hatiye kirpandin.

**Mînak:**

*Car zane, zêr zane, zor zane.*

*A mêran jêhatin e, ne lêhatin e.*

*Zêr zane, zor zane, car zane.*

*A mêran lêhatin e, ne jêhatin e.*

*Silav li miyan e, ne li rûyan e.*

*Bila rindik be, bila hindik be.*

*Silav li rûyan e, ne li miyan e.*

*Bila hindik be, bila rindik be. Ş. Aslan (2006)*

**Ji Alî Teşê/ Dirûv ve Gotinên Pêşiyên:**

1. Gelek gotinên pêşiyên ji hevokên kin û kurt pêk tên. Bi kêm bêjeyan gelek tiştan vedibêjin.

**Mînak:**

*Bi pirs e, ne tirs e.*

*Biratî bi rastî.*

*Hemû mên nabin şêr.*

2. Hinek ji wan, ji du hevokan pêk tên, di navbera van hevokan de ji aliyê mijar û rêzbend (kafiyeyê) ve pêwendiyek heye û bi bêhnokê bi hev ve girêdayî ne.

**Mînak:**

*Dawet daweta mîran, agir ketiye feqîran.*

*Bi dinê bişêwire, bi aqilê xwe bike.*

*Bi lez ket, dereng ket.*

*Bibêjin lal e, nebêjin tiral e.*

3. Bi gelemperî di dema fireh de û di raweya fer-  
manî de hatine kişandin.

**Mînak:**

*Tu bûyî mîr, Xwedê meke ji bîr.*

*Qesas namîne qiyametê.*

*Pişta xwe bide dîwarê heq.*

*Pîr bike û ji bîr meke.*

4. Hinek gotinên pêşiyên wek vegotina çîrokekê  
ne, di wan de bûyereke heye. Carinan di vegotina vê  
bûyere de rêbaza diyalogê tê bikaranîn; ango dirêj  
in. Ji wan hinek cure jî wek pirs û bersiva pirsan ha-  
tine vegotin.

**Mînak:**

**Bivir got:** *Darê ez hatim te !*

**Darê got:** *Destiyê te ji min e.*

*Dayê tu çima min dihejîne? Yek dayê jî dihejîne.*

**Gotin:** *Guro stûyê te çima stûr e? Bi destê xwe dikim,  
bi devê xwe dixwim.*

**Gotin lawik:** *Tu çi kes î?*

**Lawik got:** *Ez hê nezewicî me.*

5. Bi gelemperî gotinên pêşiyên bi (rêzbandî) kafiye  
ne. Ji bo ku bi hêsanî di bîra mirovî de bimînin, di  
navbera peyvên de ji aliyê dengî ve pêwendiyêke  
pir xurt heye. Mirov bi hêsanî dikarin bibêjin ku di  
navbera bêjeyan de mûsîkiyêke bêhempa heye,  
ango mûsîkal in. Jixwe ji ber vê yekê bi taybetî  
gelek gotinên ku di stranên dengbêjiyê de hatine  
bikaranîn, bîngeha xwe ji gotinên pêşiyên û biwê-  
jan girtine.

**Mînak:**

*Birijîne, lê bi şûn ve meşîne.*

*Birîna hevalan, tîra kendalan.*

*Bûka xalê, ezîza malê.*

*Cihê bêyî şêran, rovi xwe nîşan dide weke mêran.*

6. Hin gotinên pêşiyên hene ku li gor kafiye, cihê  
ku behnok tê bikaranîn, mirov ji hev cuda bike û  
rist bi rist binivîse, wek helbestan dibin malik. Ev  
malikana jî ji sê, çar rêzên lihevhatî pêk tên.

Ş. Aslan (2006)

*Gundê bê rez*

*Teqreqa fera*

*Konê bê pez*

*Şeqşeqa pera*

*Mêrê bibê ez*

*Fiqfiqa jina Lê dûr here.*

*Fireh dike dila.*

7. Ji bo ku kafiya wan xirab nebe û bi vî awayî di  
bîra mirov de bimînin, hinek ji wan jî wek hevokên  
bêrist hatine saz kirin.

**Mînak:**

*Bi tedbîr, tê kolandin bîr.*

*Emrê leglegê, çû bi leqleqê.*

*Dostê bigirîne, baştir e ji yê dikenî ne.*

*Edetên bav û bapîran, kerik xweştirin ji hêjîran.*

8. Bêjeyên gotinên pêşiyên ji aliyê wateyê ve nêzî  
hev bin, hemwate bin jî di dewsa hev de nayên bi-  
karanîn. Ji ber ku gotin bi awayê xwe yê resen di  
nava gel de belavbûne û bi vî awayî hatine bihîstin.  
Dema ku peyvguhêziyek hebe, ev awa ji bo kesê  
guhdar xerîb tê û ji wateya xwe ya resen hinekî  
dûrdikeve. Lê di destpêkê de ev peyvguhêzî ji me  
re çiqas xelet were jî, em dibînin ku di pêvajoyê de  
carinan li gor rihê demê ev guherîn pêk tê, di nav  
zar û zimanan de bi vî awayî çiyê xwe qewîn dike.

Weke mînak, gotina kûzê avê li riya avê. Li hin he-  
rêman digehure di dewsa kûz de hemwateya  
peyvya "cêr" tê bikaranîn û weke "cêrê avê li riya  
avê" tê gotinê. Ev her du awa ji ber ku di nava gel  
de hene, em viya wek xeletî nikarin bihesibînin; lê  
ji ber ku di nava gel de tune ye û ne berbelav e mî-  
nakên duyemîn xelet in.

**Mînak:**

*Ecelê bizinê tê, nanê şivên dixwe.*

*Ê ku çû Helebê hat, ê ku çû helawê nehat.*

*Ecelê nêrî tê nanê gavan dixwe. (şaş)*

*Ê ku çû Wanê hat, ê ku çû helawê nehat. (şaş)*

## 2. BIWÊJ

Bi dîroka mirovahiyê re heta roja me hinek ziman geş bûne, hinek ji wan jî bi tevahî ji holê rabûne. Ji bo ku em bikarin rewşeke xweş, baş û bi derbtir rave bikin, hinek gotinên qalibî bi demê re derketine holê. Ji van gotinên qalibî yê sereke yek jê jî biwêj in. Biwêj, pir caran bi tenê ji bo şîrovekirina rewşekê ne. Rewş û bûyera heyî bi alîkariya biwêjan baştir û xweştir tê vegotin. Ango biwêj qalibê xweş vegotinê ne. Bi gelemperî biwêj jî wek gotinên pêşiyar mecazî ne. Biwêj, li gor gotinên pêşiyar zûtir di nava gel de belav dibin. Wek gotinên pêşiyar, ji bo kemilandinê pêwîstiya wan bi demeke pir dûvdirêj jî tune ye. Ji ber vê yekê jî, çîrokên derketina biwêjan di bîra gel a hevpar de li gor gotinên pêşiyar bêtir berbelav in û tîz zanîn.

Biwêj jî wek gotinên pêşiyar ji jiyar û bîra gelî ya hevpar dawerivîne û gihîştine roja me. Ji ber vê yekê jî wek gotinên pêşiyar, nîşane û remzên netewî di xwe de dihevin. Ji ber van sedeman ev gotinên qalibî dibin çavkaniyên her cure lêkolînên li ser wê netewê. Biwêj jî wek gotinên pêşiyar carcaran bi gotinên navdaran, bêjeyên hevedudanî û nifir, dijûn û hin qalibên din re tîz tevlihevkin; lê ew jî herî zêde bigotinên pêşiyar re tîz tevlihevkin.

### Ji Alî Wate û Naverokê ve Hin Taybetmendiyên Biwêjan:

1. Armanca biwêjan ragihandin û şîrovekirina rewşên taybet e; ya gotinên pêşiyar rênîşandan, pend û şîret, hilgirtina dersekê ji mijarên jiyarê ye, ragihandina tiştên bi giştî ye. Biwêj rewşa giştî şîrove nakin û ranagihînin. Herwekî ku me di mijara gotinên pêşiyar de jî gotibû, ev cudahî cudahiya herî girîng a di navbera gotinên pêşiyar û biwêjan de ye.

#### **Mînak:**

*Bêvila xwe rakirin.*

*Diranî wî/wê qîç bûn.*

*Paş stûyê xwe xurandin.*

*Bûn bilq û birûsk.*

2. Herwekî ku ji pênasê wan jî diyar dibe, bi gelemperî tiştê ku tê gotin û tiştê ku dixwazin bidin fêmkirin cuda ne, anga mecazî ne. Herçiqas şibandin hebe jî, gelek caran wate pir cuda ye.

#### **Mînak:**

*Bi qûna tazî, tembûrê dixwazî.*

*Çavbirçî bûn.*

*Dendikê xwe çizirandin.*

*Barê ceh û genim ji hev kifş bûn.*

3. Pêvajoya derketina holê û teşegirtina biwêjan, bi qasî gotinên pêşiyar ne kevn e. Ji ber vê taybetiyê, çîrokên wan li gor gotinên pêşiyar hîn jî di nava gelî de bêtir tîz zanîn. Kesên ku biwêjan

kom dikin, divê bi wan re çîrokên wan jî berhev bikin. Ji ber ku di çîrokên biwêjan de dîrok û feraseta serdemekê ya wî gelî jî veşartî ye.

Her wiha, dema çîrokên biwêjan bîz zanîn, bêtir bi bandor dibin û bi vî awayî nayên jibîrkirin jî. Di vî warî de xebata Mehmet Oncu 101 Biwêj û Çîrok (Oncu, Mehmet, 2015) û xebata Mustafa Borak (Borak, M.2005) çavkaniyên pir heja ne. Borak, xebateke bi tenê ji çîrokên biwêjan pêk tê amade kiriye û xebat niha li ber çapê ye.

#### **Mînak:**

*Heleb teze bû Heleb*

*Erê Gulê, ez ne mele bûm, te ez kirim mele.*

*Bûye Eliyê xemxur.*

*Bûye trêna Karazê.*

4. Di heman mijarê de biwêjek bi formên cihê cihê û li dewerên cuda cuda derdikeve pêşberî me. Li gor gotinên pêşiyar, em bêtir rastî ve taybetiya biwêjan tîz. Ji ber ku ji aliyê gelî ve kemilandina pêvajoya gotinên pêşiyar, li gorî biwêjan bêtir demeke dûr û dirêj e. Ji ber vê yekê jî, ew hemû li serad û bêjînga gelî dikevin; ên ku li ser bêjîngê dimînin digihên roja me.

#### **Mînak:**

*Bûkê ziman tune, Xwesûyê îman tune.*

*Ji xelkê re gul e, ji me re derd û kul e*

*Bûkê tune zar, ziman, Xwesûyê tune dîn îman.*

*Ji xelkê re tixtor e, ji xwe re kor e.*

5. Her çendî biwêj ji bi piranî wek gotinên pêşiyên mecazî bin jî; yên ku bi wateya rasteqîn, yekemîn tên bikaranîn jî hene.

**Mînak:**

*Nav û deng (yekî) belav bû. (Navdar bû)*

*Li soza xwe xwedî derneket.*

*Li xwe mehr kir.*

*Me kir, tu meke.*

6. Her tiştê jiyana gelî dikare bibe mijara biwêjan. Ji ber vê yekê nifir û lava /dua, çêr û gotinên mustehcen jî hinek ji wan dibin mijara biwêjan.

**Mînak:**

*Xwedê te nehêle.*

*Kezeba te reş be.*

*Stûna te bi zêr be.*

7. Hinek ji wan, wek gotinên pêşiyên li ser edet, tore û bawerîya gelî ne.

**Mînak:**

*Kî diya min mehr bike, ew bavê min e.*

*Konê reş, warê xweş.*

*Kurdî, halê xwe wer dî.*

*Ma bavê te bilûrvan e, yan kalikê te. (çîroka gur)*

*Ne dengbêj e, bi zirneyê re, Ne peya ye bi siwaran re.*

*Newroza siltanî, dar û gopalê xwe hilanî, Sala kevn û teze ji hev deranî.*

### Ji Aliyê Têşe/Dirûv ve Biwêj

1. Hinek ji wan bi tenê ji du bêjeyan pêk tînin.

**Mînak:**

*Çavreş bûn, Çarçavî bûn,*

*Hawarî kirin, Hêlahêl kirin Jê rewîn.*

2. Hinek biwêj bi şibandina tiştêkî din ava bûne. Di van biwêjan de jî, bikaranîna hunereke ku jê re dibêjin hunera şibandîne heye. Di wêjeyê de ev jî rebazeke vegotinê ya sereke ye. Bi şibandinê rewş bêtir li ber çavê mirovî zelal û şênber dibe.

**Mînak:**

*Nola bûma bûn.*

*Fena pizot bûn*

*Wek holika dînan bûn.*

*Mîna marê zer bûn.*

3. Hinek ji wan jî cotepeyv in. Bi dubarekirina peyvvan hatine çêkirin.

**Mînak:**

*Kûzekûz kirin, Oreor kirin*

*Pîtepit kirin, Niçeniç kirin, Hîrehîr kirin.*

4. Hinek ji wan di rewşa raderî de tînin bikaranîn.

**Mînak:**

*Bi pêş ve birin,*

*Di nivê rê de hiştin,*

*Jehrdayî kirin,*

*Pere nekirin.*

5. Hinek biwêj wek helbestan hatine nivîsin; ango bi kafiye ne. Hinek gotinên wan ji aliyê wateyê ve ne pêwîst in, ji bo ku ahengê temam bikin di hevokê de cî digirin.

**Mînak:**

*Banê me yek ban e,*

*Aliyek deşt e, yek zozan e.*

*Heke ne fend e, Ew çî dar û bend e.*

*Nikaribûn bi yê berdayî, Çûn yê girêdayî.*

*Pariyê xwe xweş kir, Ruyê xwe reş kir.*

Ne xema wê ye, ne dema wê ye; Qirçeçirça benîştê wê ye, Çêleka sor qelendê wê ye.

6. Hinek biwêj hene ku di forma pirsê de ne; lê di van pirsan de jixwe bersiv jî heye. Ev jî bikaranîna rebazeke hunerên wêjeyê ye.

*Tir li ku, das li ku ?*

*Ma ez keziyê xwe şeh dikim ?*

*Ma tu hatiye agir bi deyn dibî ?*

*Ma paniya diya min pê xwîn bûye ?*

7. Hinek ji wan wek gotinên pêşiyên vegotina bûyerekê, çîrokekê ne.

**Gotin:** Gayê te dizîn! Got: Wey dikê min! Gotin çima wisa dibêjî ?

**Got :** Wekî min li dikê xwe bipirsiya ,gayê min nedîçû."

**Gur gote sê:** "Behna xwe bide min! Sê gotê: Ku bidime te, tu yê dinyayê talan bikî."

*Navbera min û kîjan cînarê min xera bibe; jina min diçe li ber deriyê wan, teşîya xwe dirêse.*

## Encam

Çêj, huner û estetîka her zimanekî di gotinên pêşyan û biwêjên wî gelî de de veşartîye. Bikaranîna van qalibên taybet, bergeh û perspektîfeke bêhempa ji zimên re vedike. Derfetên herikbarî û livbaziya hunerî dide zimên. Weke hemû hêmanên folklorê derketin û kemilandina gotinên pêşyan û biwêjan jî girêdayê pêvajoyekê ye; ku ji aliyê bîra gel ya hevpar ve bîn pejirandin dijîn. Ku neyên pejirandin ji holê radibin, ciyê xwe didin hin gotinên din.

Her çendî ji aliyê wate û teşeyê xwe ve hevpariyên gotinên pêşyan û biwêjan hebin jî; cudabûnên wan jî hene. Di gotinên pêşyan de darezek û şîreteke giştî heye û hemû di forma hevokê de ne; lê di biwêjan de ev daraz û şîretên giştî tune ne û armanca wan xweşvegotina rewşeke taybet e. Her çiqas ji aliyê teşeyê xwe ve biwêjên di forma hevokê de hebin jî; yê raderî jî hene, an gelek ji wan dikarin raderê bigirin. Her wiha biwêj, ji gotinên pêşyan cudatir dikarin hin qertafên deman, raweyên xwestek û daxwazên kesane jî bigirin. Dema ku em di vê çarçovê de li van her du qaliban binêrin, alozî û tevlihevkirina wan dê kêmtir bibe.

## ÇAVKANÎ

- ▶ Aslan,Ş. (2006a) Biwêj, Amed, Söz.
- ▶ Aslan,Ş. (2006b) Gotinên pêşyan, Amed, Söz.
- ▶ Asım Ömer, A. (2007) Gotinên Pêşyan, 28, Istanbul, inkilap.
- ▶ Bascom Willam, R. (2005, r.144) Teoriyên Gelnasiyê, (Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar) Ankara, Geleneksel.
- ▶ Borak, M (2005) Ferhenga Biwêjan, r. 15, Stenbol, Enstîtuya Stenbolê.
- ▶ Farqînî, Z. (2012) Ferhenga Tirkî- Kurdî (çapa berfirehkirî ya duyemîn), Stenbol, Zend.
- ▶ Ferheng.org, stranbêj.com
- ▶ Kramer Noah Samuel, (2014) Dîrok bi Someriyên Dest pê Dike, Stenbol, Kabalci.
- ▶ Mazî,Ç.(2005) Ferhenga Gotinên Pêşyan, Stenbol, Elma.
- ▶ Oncu, Mehmet,(2015) 101 Biwêj 101 Çîrok, Avesta, Stenbol.
- ▶ Röhrich, L. Mieder, W(2006) Teoriyên Gelnasiyê, (Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar) Ankara, Geleneksel.
- ▶ Sağlam Yaşar, M(2001) Di Gotinên pêşyan û Biwêjan de Hêma, Kovara Zanîngeha Hacerrepeyê ya Beşa Wêjeyê Cilda 18. hejmar 1, r. 45-51. Lutz Röhrich ve Wolfgang Mieder (1977, s.53)
- ▶ Tüm G.(2010) Di Têgihîştina çand û Zimanên Cûda de Rola Gotinên Pêşyan. Turkish Studies International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume 5/4 Fall.
- ▶ WRAY, Alison, & PERKINS, Michael R, Di Têgihîştina çand û Zimanên Cûda de Rola Gotinên Pêşyan The Functions of Formulaic Language: An Integrated Model. Language & Communication, 20, 2000, s.1-28.



## ÇIKLIKÇADIR

Serey wesar, peynîya aşma sibat û serey aşma adare de. Kila pîl dekewtêni binî erd. Wextê ki na kile kewna bin erdî, Vaş şîn beno. Darûber pind dono. Na kile Mizgîna herayey dona însonan.

Şaristana Amede navçeya Pîron dewa Gulzun û a heremi de no wexti de yew edet xom est o. Demo ki no wext ameynî, ewil dewa Qelbîn de adir veşnaynî. Wextî ke Qelbîn de adir veşaynî Gulzun de aye roj, millet kom kerdinê. Heyanî mexreb govend girewtîne heme millet keyfweş bîyînî. Mexrebî ra pey heme keye, yew gilzeyê velgê xo gorutîne û şênî serî bonûn. Gilzeyê velge adir panaynê. Dormarey adirî de şîyîne ameynê. Tililî kaş kerdîne.

Wexti kila adir qeyday çiklîka adirî gorutîne. Numeyî hîgay xo daynî. Hîgayî inan kam kışt se kewtîni sek çiklîka adirî têşonaynê têşonaynê û çengkerdênê aye kinar se û vatênî:

- Çiklîkçadır çiklîkçadır yew hîgayî yemo yew çaring  
Çiklîkçadır çiklîkçadır yew hîgayî ûti yew çaring...

Çime: Hezoya Husî

Herem: Pîran

Arêkerdax:  
Ridvan TAY

## KULTURÊ MA RA TAY NUMÛNEYÊ MÎTOLOJÎKÎ



Sedef  
KANDEMÎR



Çira kes efsaneyanê ma nêzano? Çimkî Lîlîth û Medusa ameyê nuştiş û ameyê açarnayiş. Nê wextî ra tepîya êdî ma dest bi nuştişî bikerê. Êdî ma vacê Lîlîtha ma zî esta Medusaya ma zî esta. Ma kê nîyê!



## Mîtolojiyi Ser o

Manayê mîtoloji efsane yo. Baweriyê yew qismê şarî ra yeno. Ge ge vanê bawerî, ge ge zî vanê mîtoloji. Efsaneyî bi vatişî ya yenê ewro. Taybetiyê efsane "vatiş" o "nuştiş" nîyo. La çiyêko muhîm esto ke tena vatiş nêbeno. Efsaneyê ma, mîtolojiyê ma, baweriyê ma vîndî benê. Ma ganî binusê. Ma Medusa zanê la ma Meyreman nêzanê. Ma Lîlîth zanê la ma Pîrhebok nêzanê. Çira kes efsaneyanê ma nêzano? Çimkî Lîlîth û Medusa ameyê nuştiş û ameyê açarnayiş. Nê wextî ra tepîya êdî ma dest bi nuştişî bikerê. Êdî ma vacê Lîlîtha ma zî esta Medusaya ma zî esta. Ma kê mî nîyê!

## Huşşşşşş Qolo Yeno!

Qeçekîya mi de Qolo estbi. Qolo jew cinawir bi. Verê o zî merdim bîyo. La qet vengê qeçekan ra hes nêkerdêne. Dima maya ci bi zor ey zewicnayo. Bol qeçekê ci zî bîyê. qeçekê ey tim û tim bermayêne. Rojêk fina qeçekê ey bermayêne, Qolo zî şîyo qeçekanê xo het û ey fekê qeçekanê xo destanê xo reyde girewtê. Qeçekan zî boye nêgirewta. Tepîya heme zî merdê. Homayî zî o lanet kerdo. Qandê lanetê Homayî Qolo vurîyayo bîyo jew cinawir. Xeyalê mi de zî Qolo cinawiro sîya yo. Şekl û şemalê ci çin o. Demoke şew beno, qeçekî nêrakewenê, kay kenê, ney zî bermenê maya înan vanê "Huşşşşş Qolo yeno, rakewe!"

## Medusaya Ma

Meyremane ser bol çî yeno vatiş. Meyremane jew dewe de ciwîyayêne. Meyremane winî cinîyêka xaseke bîya ke kes qîmîş nêbîyêne biewne aye ro. Merdim vano qey pêrî ya. Rojêk Meyreman bîya cine. Kes nêzanayêne senî vurîyaya. Meyreman qandê xasekîya xo lanetê Homayî girewto. Ge ge zî vanê Meyremane xora cine bî. Demo ke şew beno tim û tim şîyêne axur. Aye estoran ra bol hes kerdêne. Şew ra hetta şefeqî Meyreman tim û tim niştêne estoran ser. Axurî ra bol veng ameyêne. La her kes tersayêne. Qandê ey kes nêşênê şîrê zerreyê axurî. Dewijî şewdir ra weriştêne şîyêne axurî ke porê estoran ameyê mûnitiş. Rojêk jew dewij şîyo axur. Uca de ey sêneyê Meyremane ra firkete kerda. Nişka Meyremane bîya sey perî. Êdî a bîya xizmetkara ey. Dewij Meyremane reyde zewicîyayo.

Medusaya Yunanî zî nizdîya Meyreman a. Medusa zî bol xasek bîya. Homayê behran mavajê Poseîdon zî zerrîye devista Medusaye. Athena zî Poseîdon ra hes kerdêne. Athena Homaya Yunanî ya. Tepîya Athena Medusa dîya û aye ra celîyaya. Athena hêrs bîya û Medusaye ra jew cinawire viraşta. Her têlê porê aye ra jew mar viraşto. Athena nêvinderta, lanetê aye dewam kerdo. Kamî ke çimê Medusaye ewnîyêne bîyêne kerra. Athena hetkarîyê birayê xo waştêne. Aye vatêne ke ez wazena ke Medusa bimira. Mi lanet kerd qandê ey kes nêşênê biewno ke bikişo. Nameyê birayê ci zî Perseus o. Perseus qebil keno û vano ez şêna bikişo. O şino Medusa het û eyne reyde ewneno çimanê aye. Înan şer kenê û Perseus sereyê aye ckeno.


Tîya de çîyo muhim esto ke o zî kemanîya ma çin a. Heme çiyê ma esto. Medusa zî bol xasek bîya Meyreman zî. Medusa zî lanetê Homayê girewto, meyreman zî. Tepîya Medusa zî Meyreman zî maxlup bîyê. Dinyaye de her kes Medusa zano. Nika ra dima êdî Meyreman zî esta.

## Lilith-Pîrhebok

Lîlîth û Pîrhebok hema hema sey pê yê. Ma de Pîrhebok jew cin a. Demo ke cinîyî qeçekan anê dinya, Pîrhebok musallatê înan bena. Hetta çewres rojî ganî cinîyî tena nêmanê. Ganî binê balişnaya cinîyan de meqes ney zî kardî bibo. Meqes ney zî kardî cinîyan Pîrhebok ra paweno. Tewratî de zî Încîlî de zî Lîlîth ameya nuştiş. Reyna demo ke cinîyî qeçekan anê dinya, Lîlîth musallatê cinîyî û qeçekê xo bena. Hetta çewres rojî ganî cinîyî û qeçekê xo tena nêmanê. Qandê ey ê ge ge resmanê melekan xêz kenê ge ge zî çiyêk asinîn reyde xo pawenê.

# ELIYÊ PÎRÊ

Berhevkar:  
jana Dila





Hebû qet tune bû, pîrê bi kurê xwe ve pir feqîr, hêsîr û belengaz bûn. Pariyek nan tune bû ku bixwin. Her ro her ro, kurê pîrê ji xwe re diçû çolê, piştiyek dirrî dianî. Dibir li çarşiya Pasûrê difiro. Ji pîra diya xwe re dida bi nan û firingiyan. Wisa debara xwe dikirin. A karê Eliyê Pîrê wisa bû..

Rojekê Eliyê Pîrê diçe mexelekê ku dirriyan berhev bike. Çima ji nav koma dirriyan têlekî nefinî gêr nabe. Dibîne ku hêkek e. Piştiyê dirriya xwe datîne ser milê xwe, hêka xwe dike deste xwe, berê xwe dide çarşiya Pasûrê.

Li çarşiya Pasûrê heft cihû (file) hene. Ew cihû dizane ku ew hêka di destê Eliyê Pîrê de hêkek pir girîng û buha ye. Ji Eliyê Pîrê dipirse yek ji wan:

- Xwarzê tu hêka xwe nafiroş î?

- Çawa nafiroşim.

- Eger tu bidî me, em ê zêrekî bidin te.

- Law! Tinazên xwe bi min neke. Buhayê hêkê bi çî ye, wî bide min bes e. Eliyê Pîrê nizanibû ev hêk buha ye û bi qedr û qîmet e.

Wele hevdu dibin û tînin. Hêkê dide bi du zêran. Eliyê Pîrê piştiyek dirriyê xwe û hêka xwe difiroşe, du zêrên xwe ji cihûyan distîne. Ji diya xwe re goşt, delingek, kirasek û şimikek kirî, hat malê. Diya wî çawa

çavberê van tiştan da kêfa wê pir hat, lotikek li qûna xwe xist. Der û beran paqij kir.

Rojekê Elo nexweş dikeve. Pîrê diçe çarşiya ji bo dikê xwe bifiroşe. Cihû derdikevin pêşiya pîrê û pîra reben dixapînin. Dîkê pîrê jê pir bi erzanî distînin. Pîrê tê malê, Elo rewşê fam dike û dibêje ku ez Eloyê Pîrê bim, vê yek ê ji cihûyan re nemîne.

Eloyê Pîrê teyrê ku di bin dirriyan de bû difikire. Di ber xwe de dibêje; ez ê çawa herim wî biqefêlim. Rojekê şeveqa tarî berê xwe dide erdê Solo, diçe mexelê. Hê tav baş derneketiye. Diçe ber kema dirriyan. Teyr way di hêlînê de ye. Elo dibêje viiiiirrr xwe diavêje ser teyr. Teyrê diqefilîne. Teyrê dide ber milê xwe, êdî dev ji dirrî mirriyan berdide. Tê, berê xwe dide çarşiya Pasûrê. Heft cihû li ber kargehên xwe ne. Yek ji wan dibêje:

- Xwarzê! Tu teyrê xwe nafiroş î?

- Wele ez dixwazim bifiroşim.

- Ka bide me, em ê pênc zêran bidin te.

- Law tinazên xwe bi min nekin! Kîrkujên lawê kîrkujan...

- Eloyê Pîrê dewlemend dibe tê malê, koşkekê lê dike. Tola diya wî hê di bîra wî de ye, ji ber ku cihû diya wî xapandibûn ew ê tola xwe bistendana. Pla-



nekê çêdike di serê xwe de. Ji diya xwe re dibêje ez ê te bişînim hecê. Diya wî:

- Kurê min nabe, ez êdî extiyar im. Nikarim. Elo:

- Na na! Ez dixwazim te bişînim hecê. Elo radibe diçe destekî cilê jinan li xwe dike. Ji diya xwe re dibêje:

- Dayê.

- Haa.

- Min bibe dikana filan kes, ji wan re bibêje ez diçim hecê, bila keça min li cem we be. Ku ez ji hecê ve-geriyam jixwe ez ê keça xwe ji we bistînim, lê ku ez venegeriyam bila keça min ji we re be. Hema li kurekî xwe mar bikin.

Buhayê teyran li her dere bi çî ye ewqas bidin min bes e. Welhasil hevdu birin û anîn, hatin ser bîst zêran

Diçin ber dikana cihûyan. Diya Elo dibêje:

- Ez ê herim hecê, bila keça min li cem we be. Ku ez ji hecê ve-geriyam jixwe ez ê keça xwe ji we bistînim, lê ku ez venegeriyam bila keça min ji we re be. Hema li kurekî xwe mar bikin. Ji bo keça min dizîka nanê we naçe ser agir, hema hûn ê pariyekî bidinê. Pîrê tê malê, Elo li wir dimîne.

Dikanê digirin, tên malê. Pir kêfa kurên cihûyan tê. Dibêjin pîrê jixwe extiyar e, ji hecê venagere, ew ê bimire. Em ê vê keçikê li birayê xwe yê biçûk mar bikin.

Heft rojan li def û zirneyê dixin. Gelê Pasûrê diçin û tîn dipirsin:

- Gelo ew çî dawet e?

- Wele daweta cihûyan e. Pîrik çû hecê, keça xwe danî ber me, got dema ez ji hecê venegerim hema li kurekî xwe mar bikin. Daweta birayê min ê biçûk e.

Dawet diqede, zava diçe odeya xwe, bûk jî li du zava ye. Zava nizane ku bûk mêr e. Bûk çavên xwe li odeyê digerîne û dibêje:

- Xelk ewqas pesnê we dide, qet mal û milkê we tune ye, tu tiştêkî we tune ye. Zava bersivê dide:

- Meriv dizane tu qîza pîrêya xêtik î ha! Zava heft deriyan vedike, ji bûkê re dibêje, hela were binêre em feqîr in an na?

Diçe hemû odeyan nişan dide, bavo rebeno, kîjan odeyê nişan dide, tije zêr û zîv in. Deriyê paşîn vedike, tê de mengeneyek heye. Bûk dibêje:

- Evaya çî mengene ye? Zava:

- Ev mengene ji bo kuştina misilmanan e. Dema em wan diqefilînin, wan dikin hundirê vê mengenyê, bi vî awayî em wan dikujin. Bûk dibêje:

- Hela ez bikevim hundirê mengenyê, tu jî ba bide, hela binêrim çawa dişixule? Belkî min jî rojek é yek qefalt û tu ne li ba min bî, ez ê wî/ê bikujim. Bûkê serê xwe dike mengenyê, zava ba dide. Bûkê:

- Uyyy! Te ez kuştim huu! Îcar tu bikevê ez bişixulînim. Zava çawa serê xwe dike mengenyê, bûkê ba dide, ba dide, zavayê niv rihî dike. Zava namire lê niv rihî dibe. Wî di mengenyê de dihêle.

Roja din dibe sibe, dibe nîvro, dibe esir zava naçe dikanê. Birayê wî yê mezin ew meraq dike. Tên odeya birayê xwe, dibînin ku birayê wan di mengenyê de niv rihî ye û li dîwêr kaxizek heye. Li ser kaxizê wisa dinivîse:

*Ez Elo me!*

*Eloyê kurê pîrê me.*

*Dîk dibe deve, deve dibe gamboxe*

*Hê xax û paxên giran, ji bo we ji para ne.*

Elo diçe malê, destek cilê dixtoran li xwe dike. Di-keve nav kuçe û kolanên bajêr.

Dibêje; li nexweşan ez belaş dinêrim.

Cihûyek çû, ma şeş bira. Tên ber Eloyê Pîrê, dibêjin; dixtor efendî,

- Ha, kerem kin.

- Wele birayê me nexweş e. Hela dikarî lê binêrî? Dixtor dibêje, ka lê binêrim. Çawa lê dinêre, ji wan re dibêje, tu nexweşiyêke birayê we tune ye, parîkî qirika wî hatiye jidandin. Ji qirika xwe birîndar e. De ka derkevin derve, min û nexweşê min bi tene bi-hêlin. Birayên wî derdikevin derve, ji hev re dibêjin; çî dixtorêkî baş e! Bi nexweşiya birayê me dizane.

Dixtor derziya mirinê li birayê wan dixê. Lêva wî jê dike, çixareyekê jî dike devê wî, wî datîne ber pacê. Zêr mêrên wan çî hene hemû berhev dike, nivîsekê jî li pişt derî dixê:

*Ez Elo me!*

*Eloyê kurê pîrê me.*

*Dîk dibe deve, deve dibe gamboxe*

*Hê xax û paxên giran, ji bo we ji para ne.*

*Ûû lê dixê diçe.*

Birayên nexweşî tîn ber derî, ji hev re dibêjin law çawa bû? Evanan derneketin! Meraq dikin, derî vedikin. Way birayê wan ê nexweş li ber pacê ye, çixarak di devê wî de ye û dikene. Vanan çawa dikevin hundir tev dişiqitin. (Eloyê Pîrê hundir şil kiribû ku bişiqitin) hevdu tem didin. Birayê mezin şîrmeqekê li birayê mirî dixê, ê mirî dibe guuuuuuummm! di-keve xwarê. Vana bala xwe didinê ku birayê wan mirî ye.

Dizivirin îcar nivîsa li ser derî dibinin:

*Ez Elo me!*

*Eloyê kurê pîrê me.*

*Dîk dibe deve, deve dibe gamboxe*

*Hê xax û paxên giran, ji bo we ji para ne.*

Van birayan dikevin pey şopa Elo, lê digerin. Digerin nagerin nabînin, dema dibînin jî nikarin bi Elo, ji ber vê yekê êdî dev ji Elo ber didin. Diçin dikanên xwe, dest bi karên xwe dikin.

Rojekê şeş bira kom dibin, tev bi hev re diçin walîlixê gîfî dikin. Dibêjin dizek di bajêr de heye. Eloyê Pîrê hîn dibe ku vana diçin walîlixê, ew jî diçe destek cilê nobedaran li xwe dike, li ber deriyê walîlixê disekine. Eloyê Pîrê:

- Hûn bi ku ve diçin?

- Wele dizek ketiye bajêr, wî dizî birayê me kuştîye, zêrên me dizîye, em diçin wî gilî dikin.

- Malmîrat! Ez li forsa we dinêrim matmayî dimînim; saetên li ser we tev zêr in, cil û bergên we giş ên buha ne. Demançê we giş zêr in. Bi vî awayî wele walî li karê we nanêre.

- Ê ka em ê çawa bikin?

- Bisekinin! Ez herim ji we re hinek cilên kevn bînim, hûn cilên xwe biguherînin. Dema hûn ketin hundir, we giliyê xwe kir piştê werin ba min, ez ê cilên we bidim we. Jixwe ez hertim li vir im, li ber vê deriyê me, nobedar im. Tu kes nikare dest biva-  
vêje eşyayên we.

- Temam ewçax.

Elo diçe depoyê, hinek cil milên kevn berhev dike û ji wan re tîne. Vana çawa dikevin hundir, Elo hemû cilên wan dike torbeyekî dide ser milê xwe, li ser derî jî wisa dinivîse:

*Ez Elo me!*

*Eloyê kurê pîrê me.*

*Dîk dibe deve, deve dibe gamboxe*

*Hê xax û paxên giran, ji bo we ji para ne.*

Vana çawa ji hundir derdikevin ku cilên xwe li xwe bikin, çî cil e, çî hal e. Nobedar jî tune ye. Vana dîsa diçin cem walî, meseleyê ji serî de jê re qal dikin. Walî tê, nivîsê dibîne:

*Ez Elo me!*

*Eloyê kurê pîrê me.*

*Dîk dibe deve, deve dibe gamboxe*

*Hê xax û paxên giran, ji bo we ji para ne.*

Walî ji cihuyan re dibêje êdî ev leke lekeya min e, hûn herin malê, ez ê hal bikim.

Şeş cihu tên malê, êdî dev ji heyfa birayên xwe ber didin. Walî difikire ku çawa dikare Eloyê Pîrê biqefilîne. Diçe cem wezîrê xwe, wezîr mirovekî aqilmend e.

Wezîr mezîr giş kom dibin, deveyekê tînin. Heqîvê diavêjin ser deveyê. Aliyêkî heqîvê tije zêr aliyê dinê jî tije zîv dikin. Dibêjin ev diz kî be, ew ê were van zêr û zîvan jî bidize. Nobedarekî jî datînin ber devê. Wezîr û hemû nobedarên din giş didin ber deveyê, mehek, du meh, sê meh deve digere. Deve li hemû kolanên Diyarbekir digere. Diz der-nakeve. Êdî nobedar diwestin rûdinên, deve ji xwe re bi tenê digere. Eloyê Pîrê vê gavê ji hêlê tê. Dinêre ku deve way li ber deriyê wî ye. Hema şûrê xwe diavêje qirika devê û devê kaşê hundirê mala xwe dike. Nermê wî dike qelî, estiyê wî jî dike binê erda mala xwe. Xeber ji walî re diçe, dibêjin diz her kî bû, zêran teyî devê bir. Wezîr û nobedar jî newêrin herin ber walî.



Walî diçe cem Pîrasér. Pîrasér dibêje; dizê te her kî be ez ê derxim. Walî dibêje tu yê çawa derx î? Pîrasér:

- Ez ê kolan bi kolan bigerim û bibêjim kurekî min heye, nexweş e. Êşek lê ketiye. Goştê deveyê jê re derman e. Kî ji min re goştê deveyê bîne, dizê te ew e!!! Ev plan dikeve serê walî û kêfa wî tê, dibêje wele pîrê tu rast dibêji.

Pîrê radibe kofiya xwe dide serê xwe, kolan bi kolan digere. Tu kesî nabîne. Rojekê dema digere çima li mala Eloyê Pîrê rast nayê? Tê mala Eloyê Pîrê. Dikeve hundir, ji diya Elo re dibêje; wele kurekî min heye, pir nexweş e, ji bo êşa wî, goştê deveyê derman e. Ez li goştê deveyê digerim. Diya Eloyê Pîrê:

- Were were kurê min wan rojan deveyek ser jê kir, kir qelî. Diya Elo goşt amade dike ku bide pîrê, di vê kêliyê de çima Eloyê me ji nêçîrê venagere. Di nav derî de Pîrasér diqefilîne û dibêje:

- Pîrê ew çi ye? Pîrê:

- Na na tişteke nîn e. Elo:

- Way heye ez dibinim, tu tişteki di bin çengê xwe de vedişêrî.

Diya Eloyê Pîrê dibêje, wele kurê min, ev jinik ji bo kurê xwe yê nexweş hatiye. Goştê deveyê xwest, min jî hinek dayê. Eloyê Pîrê dibêje; hela binêrim diya min çiqas goşt daye te? Wîîî, diya min çiqas tima ye, pir hindik daye te. Were hundir ez sihanek baş bidim te. Ji bo kurê te têr bixwe û êşa wî baş bibe. Çawa ku Pîrasér gav diavêje hundir, Elo şûrê xwe derdixe, li serê pîrê dixê. Serê wê ji gewdê wê dike. Destê wê yê rastê ji enîşkê ve jê dike, diavêje ser kewarê û dibêje roj heye ew ê destê te ji min re lazim bibe.

Laşê Pîrasér jî li ber estiyê devê dike binê erdê. Xeber ji walî re diçe, diz her kî bû li serê walî jî wuha kir. Pîrasér çû û çû...

Wezîr, walî û xulamên wî tev li hev top dibin, dici-vin ka çawa bikin? Li çareyekê digerin. Yek radibe ji walî re dibêje:

- Tu yê qîza xwe bidî me. Em ê bibin li binê çadîran bikutin. Heke diz kî be ew ê were qîzikê jî bibe ji xwe re.

Em ê jî nobedaran li ber çadîrê veşêrin û bi vî awayî dizê xwe biqefilînin.

Vana diçin çadîrê xwe dikutin. Gundî meraq dikin

û dipirsin:

- Ev çadîr ji bo çi ne?

- Waliyê Diyarbekir li dizekî digere, bi vî awayî dix-waze dizê xwe biqefilîne, meseleyê ji serî heya binî ji gundiyan re qal dikin.

Elo mehek naçe, du meh naçe, sê meh naçe, meha çaran êdî nobedar giş westiyane, ji hal de ketine. Elo radibe diçe ber çadîran. Meşka xwe tije av dike, destê Pîrasér ê ku jê kiribû dike meşkê. Dikeve binê çadîra qîzikê. Qîzik destê xwe diavêje firfirokê ku lê bixe ji bo nobedar werin Eloyê Pîrê bigirin. Eloyê Pîrê dibêje; qîzê li firfirokê nexê, ez ji bo şerefa bavê te hatime. Ji bo ku tu min biqefilîni û şerefa bavê te were çiyê xwe. Qîzik:

- Temam!

Elo diçe tevê qîzikê pê re radizê, xiravî pê dike. Elo ji qîzikê re dibêje mîza min hat. Qîzik destûrê nadê. Dibêje na tu yê birevî! Mêze ez ê li firfirokê xim ha! Elo dibêje wele ez narevim, ku bawer nakî ji min, bila destê min din av destê te de be û ez xwe bi-qelivim aliyê din û mîza xwe bikim. Qîzik dibêje temam.

Elo destê Pîrasér ji meşkê derdixe, dike nav destê qîzikê. Xwe diqelivîne aliyê din, şûjinekê li meşkê dixê, çirrina avê ye. Elo bi dizî derdikeve ji binê çadîrê û baz dide ber bi mala xwe ve...

Çiraçira meşkê ye, qîzik dibîne ku mîz naqede, êdî aciz dibe. Çawa destê Elo bi aliyê xwe ve kaş dike, çima çermê pîrê li ser çavê qîzikê nakeve?

Qîzik li firfirokê dixê. Hemû nobedar li ser serê qîzikê kom dibin. Ji qîzikê re dibêjin, te diz qefalt? Qîzik dibêje wele min qefalt, çû ji destê min, namusa min jî xera kir. Meselê ji serî heya binî ji wan re raste rast dibêje.

Nobedar hemû çadîran kom dikin, dibêjin îcar em ê çawa herin ba walî û jê re çawa bibêjin vî tiştî? Namûsa qîzikê jî çû çûûû.. Neyse, diçin ba walî, bi awayekî qal dikin.

Walî, wezîr û mirovên aqilmend kom dibin, li çareyekê digerin û vê biryarê didin:

- Em ê li benda hemla qîzikê bin!

Xwedê kurekî dide qîzikê, kurik mezin dibe li piya digere. Êdî kurik xelkê nas dike. Wezîrên walî dibêjin; em ê mewlûdekê bidin. Ji heftan heta heftê saliyan em ê gazî her kesî bikin. Dema di mewlûdê de her kes kom bû, em ê vî kurikî berdin. Kurik xwe

biavêje pêşa kê, bavê wî ew e.

Rojekê Elo ji Hêlê tê, diçe ser mewlûda walî. Kî-roşkek kiriye binê qapûtê xwe. Mala walî jî pir mezin e. Odeyek nîn e, dido nîn e, sisê nîn e! Li hemû odeyan nan datînin. Hemû mêvan têr nanê xwe dixwin. Fermana walî ye, kî nanê xwe bixwe divê ji hundir dernekeve. Walî radibe, wî sebiyî ode bi ode digerin. Sebî xwe naavêje ser çoka yekî. Têr odeya ku Elo lê rûniştiye. Elo fam dike ku ew ê sebî xwe biavêje ser wî, hema bi dizî serê kîroşkê derdixe. Çavên sebî çawa bi kîroşkê dikeve ditirse, xwe paş ve dibe. Walî sê, çar tûrên dinê jî diavêje. Elo bala xwe didê ew ê sebî xwe biavêje ser û leşkerên walî wî bigirin, wî zindan bikin û ew ê çermê wî jê bikin, jiyanê lê tarî bikin... hema kîroşkê jî binê çengê xwe derdixe, diavêje li orta eywanê dixê, sebî jî dike binê qapûtê xwe û direve...

Civat bala xwe didê ku sebî li ortê xuya nake. Xeber ji walî re diçe, dibêjin wele diz her kî bû, sebî jî bir û çû...

Walî defa hewarê lê dixê, bi qewl û resûlê xwedê kî vî sebiyî ji min re bîne, ez ê qîza xwe bidimê.

Elo dinêre walî ew ê qîza xwe bidê, radibe kurê xwe dide ser milê xwe diçe ber walî. Walî qîza xwe dide Elo, qîza xwe lê mahr dike. Def û zirne lê dik-evin.

Çima waliyê Rihayê pê nahise ku waliyê Diyarbekir qîza xwe daye Elo!! Radibe nameyekê ji waliyê Diyarbekir re dişîne. Jê re wiha dibêje:

- Tu waliyekî bî nav û deng bû, te çawa qîza xwe daye vî beredayî? Dema walî vê nameyê dixwîne, rûyê wî dikeve. Elo fam dike ku di nameyê de xeberek nebaş heye. Nameyê ji destê xezûrê xwe distîne û dixwîne. Elo rewşê fam dike. Ji xezûrê xwe re dibêje; qet meraq meke! Ez ê sibê van çaxan wî weynim ba te. Elo diçe ber qesab. Çermê nêriyan distîne. Her çermek wî zingilek pê ve datîne. Berê xwe dide Rihayê. Ji zarok marokan dipirse dibêje; mala waliyê Rihayê li ku ye? Zarokan mala walî nîşanî wî didin. Dibe êvar diçe ser xaniyê walî. Wî çermî li xwe dike, devê xwe dike kulekê dibêje; ez Azraîl im, Cebraîl im!! Hatime canê waliyê Rihayê distînim. Walî dibêje:

- Yaw ji bo Xwedê, min hê xizmek xwe nediye û helalî ji kesî nexwestiye. Elo dibêje:

- Naa! Dema min canê te sitend ku tu mirovek baş bî, tu yê herî bihuştê, heke tu mirovek zalimkar bî, tu yê herî dojhê. Walî dibêje:

- Lê ez ê çi bikim? Elo:

- Here bikeve hundirê sandoqê. Miftê di pacê de biavêje min. Heke emelê te baş be tu yê herî bihuştê, na heke nebaş be tu yê herî dojhê.

Elo diçe miftê ji jêr tîne, dike sandoqê, walî tîne Diyarbekir. Di rê de Elo ji waliyê Rihayê re dibêje:

- Heke em bigihîjin ciyê xwe, tu çavên xwe venekî, heke tu vebikî tu yê herî dojhê. Ji jêr de dest pê bike bi destên melean bigire heta jor, dema qediya were jêr dîsa dest pê bike...

Elo waliyê Rihayê dibe odeya waliyê Diyarbekirê. Bi destê miletê digire, dîsa tê jêr di nav civatê de di nava zarokan de rûdine. Waliyê Diyarbekirê jê re dibêje:

- Dibêjin waliyê Rihayê miriye. Em sibê herin ser saxiya malbata wî.

Waliyê Rihayê dengê waliyê Diyarbekir nas dike û bixwe bixwe dibêje, way ez nemirime, dangan dibihîzim. Waliyê Diyarbekir jê re dibêje hela çavên xwe veke, çavên xwe. Ew kesên ku min qîza xwe dayê (zavê min) te aniye vir, ber min. Waliyê Rihayê çavên xwe vedike ku way dinava zarokan de ye. Dibêje helal be ji te re, helal be ji dizê te re. Bila were ez jî qîza xwe bidimê.

Çîroka me li diyaran, rehmet li dê û bavê guhdaran.





Çavkani: Zekî Aydın  
Temen: 54  
Herem: Pasûr,  
Dem: 2012  
Perwerdehi: Nexwenda

# ELIYO KOR



Arêkerdox:  
Mehmet TOPAL

Elîyo kor û  
Şîyo ma ra cor o  
Tifing seqênawo  
Verê lojin dawo  
Lojin nêginawo  
Bowronî ginawo  
Destê mi hilake  
Destê to şibake  
Şibakey hakon a  
Elbey qenteron a.  
Dorey direbon a  
Qijiq şîya dari  
Vede da embari  
Embar pir zincar o  
Xalê xalê ez zaza wo  
Hakî to binde pelezîyay  
Şarî Şemi berdi  
Pey sîyondê Serdi  
Sîyo cayo raşt o  
Mezgeftî xaloyî viraşt o  
Curê hargoşon o  
Mesîney kafiron o  
Bizî kendal kewtî  
Bizikî lewtî

Ca: Dewa Piranî ya Xiraba  
(Qortenîta corên)



## ÇÎROKÊN ÇÊBÛNA SEWALAN

### KOSÎ/KWÎSELE

Tê gotin kosî jî însan bûye. Tucar (bazirgan) bûye. Malê wî pir bûye.

Xela çêbûye. Genimê wî pir bûye. Yek dihere balê genim distîne, dibêje :

- Çar olçeg (kod) genim têxe çuwalê min.

Eviya jî diçe di şûna çar olçeg genim da sê olçeg genim dixê nav çuwal, tîne dide mêrik. Mêrik ji ber ku çuwalê wî piçekî sivik e dikeve şubhê. Dibêje:

- Birako ! Ez dibêjim qey genimê min ne çar olçeg e. Tucar dibêje:

- Here lo, ez çar olçeg genim didim te, tu hê qebûl jî nakî. Genimê te tamam e.

Mêrik diçe, li rê duayekê ji Xwedê teala dixwaze, dibêje:

- Ya rebî! Tu heqê min ji wî tucarî ra nehêl!

Xwedayê teala ewî koda wî dike qalik, dixê ser wucûdê wî û dest û lingê wî dixê hundirê wî.

Tucar dibe kosî û bi dunyayê dikeve. Komek genim li wir bûye, ew koma genim jî dibe girek. Di-bêjin hemû kosî ji wî tucarî peyda bûne.

Herêm: Bedlîs

Berhevkar:  
Mustafa GAZÎ



## HIRÇ ÇAWA ÇÊBÛ YE?

Pîrekeke hamîle hebûye. Rojekê dide rê, taştiya mêrê xwe dibe, dûrî gund dikeve. Temaşe dike berateyeke hespê li erdê ye. Eviya wer mehda wê diherê, wer nefsa wê diherê, dibê :

- Ya Rebil alemîn! Ez ê çawa bikim, dibê, welle ez ê bixwim.

Hema dikeve ser wê beratê û goştê wê bi xavîtî dixwe. Mêze dike xezûrê wê ji wê da tê, evêya dibê:

- Ya Rebil alemîn! Ez ê çawa bikim, xezûrê min ji wê da tê, vê şerma hanê!..

Wê wextê dua qebûl bûne. Ev pîreka hanê dibê:

- Ya Rebî! Tu min bikî heywankî û têxî çiya.

Xwedê Teala dua wê qebûl dike û wê dike hirç. Tê gotin hemû hirç ji wê pîrekê peyda bûne.

**Herêm:** Bedlîs



## JÎJO (JÛJÎ)

Tê gotin ku jîjo berê terzî bûye. Çekê (kinc, cil) xelkê giş jê hildianî (yanê perçê xelkê jê vedişart, kincan dibirrî û jê didizî.) Ji ber vê sebebê Xwedê ew kiriye jîjo.

**Herêm:** Qerejdax/Siwêrek

## PEPÛK

Dibêjin; di zemanekî de xwişkek û birayek bi hev re diçin kerengan. Tûr li piştê lawik e, keçik jî kerengan berhev dike û dixê nav tûr. Binê tûr qul e, her ku keçik kerengan dixê nav tûr, kereng ji tûr dikevin û di tûr de tiştêk namîne. Gava keçik li nav tûr dinêre, ku tûr vala ye, pir hêrs dibe, diqehire û ji birayê xwe re dibêje:

- Van kerengan tev te xwarine!

Birayê wê her çi qas dibêje na jî, keçik ji birayê xwe bawer nake û bi wê rewşa xwe ya hêrsbûyî kêrê li zikê birayê xwe dixê, diqelişîne, ku kerengan di zikê wî de bibîne. Gava ku dinêre kereng di zikê wî de tune ne, îca dîn dibe, bi çolan dikeve. Keçik ji ber mirina birayê xwe pir dikeribe, li ber Xwedê digere û dibêje:

- Xwedêyo! Tu min bikî teyrek û ez her dem li ser birayê xwe bibêjim û bigirîm.

Tê gotin pepûk ew keçik e û her dem li ser birayê xwe dibêje "pepûk!" û digere.

**Herêm:** Amed

## LEGLEG

Dibêjin; legleg begê gundekî bûye. Pîrr zulimkar bûye. Pîrekan tazî dikir derdixist ser daran û pê dikeniya. Wê çaxê nifir lê kirine bûye legleg.

**Herêm:** Amed





Berhevkar:  
Şexmûs ASLAN



**NAVÊ PEZ Û DEWARÊN KEDÎ Û HIN ALAV Û AMÛRÊ WAN**

**BELENDÎR:** Berxa mê ya sêsalî ye. (Ger bi pîncikî za be, dibe mî.)  
**BERGÎR:** Hespera bara dikişîne.  
**BERX:** Çêleya miyê ya heta yeksalî.  
**BIZAME:** Karê nêr ê çarsalî ye. (nêrî)  
**BIZARTIŞTÎR:** Kara mê ya çarsalî ye. (Bûye bizin, bi berê xwe zayî.)  
**BOŞÊ DEVEYAN:** Naxira deveyan.  
**CAHNÎ:** Çêleya hespê.  
**CISNÊ KIHÊLAN:** seklawî, hemdanî, meydanî, bedewî, qurîşî, zamanî, berkî, qemerî, xazelî  
**COLA PÊZ:** Ji 30-40 pezî re tê gotin.  
**CONGE:** Golikê nêr ê sêsalî ye.  
**ÇÊKDÎK:** Çîvik nêr a 4-5 mehî be.  
**ÇÊLDÎK:** Dîkê sala xwe tamam nekirî ye.  
**ÇÊLE:** bnr. Çîvik.  
**ÇÎVÎK:** Çêleyên mirîşk û qaz û ordeg û teyran.  
**DEVE:** Sewala kedî ya herî mezin.  
**DEWAR:** Ga û mangê tevlihev.  
**DEWAR:** Sewalên wek ga û mangeyan, ji vana re dewarên reş jî tê gotin.  
**DÎK:** Çîvikê nêr a yek salî.  
**ÊXLIYÊ HESPAN:** Naxira hespan.  
**GA:** Golikê nêr ê çarsalî.  
**GÎSK:** Kara du salî.  
**GOLIK:** Çêleyên mangeyê ya heta yeksalî.  
**HESP:** Sewala bo siwarbûnê.  
**HEVORÎ:** Karê nêr ê sêsalî.  
**HIZARE:** Jimara pêz hizarî derbas ke, xwedî li şîxê dixê, ya hizar û yekê bo risqê cinawûran bi çolê ve berdide.  
**HOGÊÇ:** Berxê nêr ê sêsalî.  
**KAR:** Çêleyên bizinê ya yeksalî.  
**KAVIR:** Berxên dusalî.  
**KER:** Sewala bo bar kişandinê.  
**KERİYÊ PÊZ:** Pêncî pez, nîv semare.  
**KERXA PÊZ:** Hevşokek pez.  
**KIHÊL:** Hespera bi cisin/ bi cins.  
**KUDIK:** Çêleya devê ya 2-3 salî.  
**KURÎ:** Çêleya kerê ya heta yeksalî.  
**LOK:** Deveyê nêr.  
**LOKÊ HÊÇ:** Lokê telebiya dike.<sup>1</sup>  
**MANGE:** Golika çarsalî ya zayê.  
**MANGEYA YEKBERÎ:** Mengeyê (nû) bi berê xwe zayê.  
**MANKER:** Kera mê.  
**MAZ:** Beranê pêncsalî.  
**MAZÊ MEZAN:** beranê şeşsalî.  
**MENCÎ:** Deveya mê.  
**MEXEL:** 1-Ciyê pez lê mexel dibe. 2- pezê hemsalê hev.  
**MIRÎŞK:** Heywana pûnê, bo hêka xwedî dikin.  
**MIRÎŞIK:** Çîvik mê ya yek salî.  
**NAXIRA (XARÊ) DEWARAN:** Qefleya dewaran.

<sup>1</sup>Daxwaza hestên zayendî, heywanî.

**NOGIN:** Golika mê ya sêsalî.  
**ORDEGÊN KEDÎ:** Babetek heywanê pûnê ne.  
**ORDEGÊN KOVÎ:** Babetek teyrê avî ne.  
**PARONE:** Golikê nêr ê dusalî.  
**PARONE:** Golikên mê û nêr ên dusalî.  
**PEZ:** Sewalên wek mî û bizinan.  
**QATIR (dure):** Cisnêkî, bav ker û dê hesp e.  
**QAZÊN KEDÎ:** Babetek heywanê pûnê ne.  
**QAZÊN KOVÎ:** Teyrê herî mezin in.  
**QEDENE:** Hespera gir ya erebeyan dikişîne.  
**QERT:** Berxê nêr ê çarsalî (Beran).  
**QULÎ:** Eloşk, şamlî, heywanên pûnê yê mezin.  
**REHWAN:** Cisneka hespan rêveçûna bi çargavî nare.  
**RÊVEÇÛNA HESPAN:** Kêfî, meş, loqê, çarnal, çargavî, tiji.  
**SEMARA:** Sed pez, keriyê pez  
**SÎPE:** Çêleya kerê ya ji yeksalî mezintir.  
**TERŞ:** Pez û dewar.  
**TEYR:** Heywanên bi per û baskan difirin.  
**TIŞTÎR:** Kara mê ya sêsalî. (Ger bi pîncikî za be, dibe bizin)  
**TORIM:** Çêlikên devê ya heta yeksalî.  
**VARIK:** mirîşka sala xwe tamam nekirî.  
**XAROŞE:** Gelek pez.  
**YEXTE:** Hespera bar.

## SALÊ SEWALAN

Salê sewalan bi diranê wan re fahm dibe. Di çengeya jêrîn de şeş diranê wan hene.

Minak,

**Yeksalî:** (berx-kar-golik) Şeş diranê wan hene, ji wan re dibên diranê şîr.

**Dusalî:** (kavir-gîsk-tane) Ji wan şeş diranên şîr, du diranê navê dikeve, şûna wan de yê nû derdikeve. Ji wan re dibê şîre avêtî. Ji dewaran re dibê qapax rakirî.

**Sêsalî:** berendîr-hogêç-tiştîr-hevrû-nogin-parone) Ji diranên şîr, du diranê din jî diguhe-rîne. Çar diran nû kirine.

**Çarsalî:** (mî-bizin-ga- mange) Diranê şîr di devê wan de namîne. Şûna du diranê şîr de xwarik şîr tê.

**Pêncsalî:** Dirana dikurîşîne.

## BERÊ SEWALAN

Salên mî û bizin û mangeyan bi zayîna wan re xwanê dibe. Ji her zayinekê re berek tê gotin.

**Yekberî:** çarsalî.

**Duberî:** pêncsalî.

**Sêberî:** şeşsalî.

**Çarberî:** heftsalî.



## BABETÊN BIZINAN

- BIZINA HÎTIK:** Bizina nava wê gewr e.  
**BIZINA BEL:** Bizina qorçê wê piçûk û tîk e.  
**BIZINA BELEK:** Bizina mûyê wê reş û sipî ne.  
**BIZINA BEŞ:** Bizina eniya wê sipî ye.  
**BIZINA BI GULIK:** Bizin a di sitûyê wê de gulik hene.  
**BIZINA GOBEL:** Bizina gohê wê piçûk û tîk e.  
**BIZINA GOBERDAYÎ:** Bizina gohgir.  
**BIZINA GOŞELTE:** Bizina gohgir.  
**BIZINA KIR:** Bizina goh û qorçê wê piçûk e.  
**BIZINA KOL:** Bizina qorçê wê tunene.  
**BIZINA TAQ:** Gohgir.  
**BIZINA XEZALÎ:** Wek xezala



## RENGÊ HESPAN

- HESPÊ BOR:** Hespê gewr.  
**HESPÊ BOZ:** Hespê gewraxî.  
**HESPÊ KUMÊT:** Hespê qahweyî.  
**HESPÊ QER:** Hespê reş.  
**HESPÊ ŞÊ:** Hespê zerî.  
**HESPÊ ŞINBOZ:** Hespê hişîn.  
**HESPA KAPREŞ:** Heta çogan reş.

## RÊVEÇÛNA HESPAN

- TIRIZ:** Beza bi loqandinê dere.  
**ÇARGAVÎ:** Beza herî zû. Her du nigê pêşîn bi hev re pêş de avêtin û her du nigê paşîn şûna wan girtin.  
**TIJE:** Beza pir zû.  
**REHWANKO:** Rêveçûna hespa ya naloqe û zû dere.



## REGÊ MENGEYAN

- MANGEYA BELEK:** Mangeya reş û sipî.  
**MANGEYA BEŞ:** Mangeya eniya wê gewr.  
**MANGEYA BOR:** Mangeya qahweyî.  
**MANGEYA ÇAL:** Mangeya çenga wê gewr.  
**MANGEYA ÇAVREŞ:** Mangeya dora çavê wê reş.  
**MANGEYA REŞ:** Mangeya qer.  
**MANGEYA SOR:** Mangeya çerm sor.



## RENGÊ MIYAN

- MIYA BI GULIK:** Miya di situyanda gulik hene.  
**MIYA ÇAL:** Miya çengeya wê sipî.  
**MIYA ÇAVREŞ:** Miya dora çavê wê reş.  
**MIYA DÊLKUR:** Miya dawa wê zirav û kurt.  
**MÎYA DÊLROVÎ:** Miya dawa wê zirav û dirê.  
**MIYA DÊLŞELTE:** Miya dawa wê fereh.  
**MIYA KEW:** Miya serçavê wê gewr.  
**MIYA QERQAŞ:** Miya sor.  
**MIYA QER:** Miya reş.  
**MIYA SEREŞ:** Miya serê wê reş.  
**MIYA ZOM:** Miya dawa wê qut.



## CIL Û BERGÊN LI SEWALAN DIBIN

**BÊLEME:** Kirasî şandine davên ser hespan.

**BÊZBEND:** Bendê şivana pê pez girê didan.

**BIZMAR:** Mixê nalan.

**BIZMIK:** Darê bo kar an berx nemijin dikin devê wan.

**CIL:** Palanê ji qamîş çêdibe.

**ÇODANK:** Di kulav de çiyê ço dikinê.

**DARIK:** Dara tahwiyê ya ketkirî.

**GEM:** Bo zeftkirinê, hesinê dikin devê hespan.

**HAWÛD:** Cila deveyan.

**HEQÎB:** Bo barê sivik çewalê du alî yê piçûk.

**KIRAS:** Cilika davên ser hespan.

**KULAV:** Alavên ji sûyina livayê çêbûye.

**KULAVÊ RAXÎSTINÊ:** Kulavê bo runişkandinê li odeya tê raxistinê.

**KULAVÊ ŞIVANAN:** Kulavê şivan li xwe dikin.

**NAL:** Hesinê li bin sima dikeve.

**NAVTEG:** Qancuxeyê pê palanê kerê an hespê bin nava wan dişidîne.

**PALAN:** Cila keran.

**PALDÛM:** Qayîşa pê palan tê girêdanê. Di bin boça ker, hesp, devê re derbas dibe û palan girêdide

**QENTIRME:** Deve an qantirê bi rişmeyan li dû hev girê didin, di rêzkê de derin.

**QETAB:** Darê ser hawûd.

**QEYD:** Hesinê du nigê pêşîn bi hev ve girê dide

**RIŞME:** Hevsarê hespan.

**SIMTRAŞ:** Kêra pê simê ker, an hespan ser re jêdike.

**SING:** Darê bo girêdena sewalan di erdê de dikute.

**SÎDANİK:** Çendikê ji kulav, şivanan xwê dikirinê û li piştta xwe girê didan.

**SÎRKE:** Singê hesinî.

**SÎRONG:** Boyaxa herênî li mî û berx û beranan dixistin.

**XWÊDANİK:** Salên li ser sewal xwê didin.

**ZENGO:** Xelekên bi zîn ve girêdidin ku pê hêsa siwarbin.

**ZENGIL:** Hesinê wek mastêkê bi leqandinê deng derdixe. Dikirin hustiyê nêrî û bizinan.

**ZÎN:** Cila piçûk hespan. Ji sî çêdibe.

**PAYIZA 2015**

**BEREVKAR:** ŞÊXMÛS ASLAN

**HERÊM:** ERXENÎ



# HOZAT RA ŞUWARA ÎSMAÎLÊ XIDÎ

Arêkerdox:  
Ugur SERMİYAN



Çime: Zeynelê Qurqafi (Hasan Kurukafa), 92 serrî  
Mintiqe: Xozat

## 1. HÎKAYEYA ŞUWARE

Seyfî Beg dewa Qerecî ya ke girêdayîya qezaya Xozatî ya Dêrsimî ra beno. Hem Keyeyê Seyîd Qasimî ra yew pîr hem zî artêşa tirkî de zabît beno. No keye xanedan o yanî ê ucaxzade yê. Seyfî Beg hîna ke artêşa tirkî de zabîtiye keno, Terteleyê Dêrsimî dest pêkeno. Temmuza 1938î de o bi merdimanê keyeyê xo ya pîya yenê tepîştene. Eskerî, înan benê binê dewa înan de bi nameyê "Çayîra Seyîd Qasimî" yew ca de pêro pîya kişenê. Zabîtbîyayîşê Seyfî Begî, ey û keyeyê ey kişîyayene ra nêxelisneno. Ê yê ke a roje yenê qirkerdene doman û cinîyî zî tede, pêro pîya 32 kesî benê.

Şarî mîyan de behsê hîrê kênekanê Seyfî Begî zaf yeno kerdene. Çike fermandarê eskeran wazeno ke bi şertê qestê înan kerdişî, canê înan bibexşo. Ê hîrê kênekê ke bi rindîya xo şarî mîyan de namdar ê, qirkerdene ra ver tû bi rîyê qumandarî kenê, coka pê sungîyan (qasaturayan) yenê kîştene. Mîyanê ê şehîdan de domanî zî, cinîyî zî benê. Na hedîsa ra pey, meyîti da-des rojî uca de binê tîja hamnanî de manenê. Kes nêewreno (nêewtaneno) ke şêro meyîtan wedaro. Pey de şarê dewe yê ke terteleiyê ra xeleşiyê şonê, yew çale kinenê û meyîtê înan pêro pîya kenê a çale. Nika serê a hewşa (mezela) înan de yew komete virazîyaya. Seba ke ê şehîdî pêro ucaxzadeyî bîy, şarê Dêrsimî zaf hurmetê a komete kenê. Şar gora înan sey yew zîyare hesibnenê, şonê serê ucaiyê û qirbanan sare birnenê, nîyazan vila kenê.

Gule zî texmînan ser yew cinîyêda Dewrêş Cemalij a ke o taw birayê xo Îsmailî ya fetelîna (gêrena). O wext zaf merdimî benê vîndî û dima yeno pêhesnayîş ke ê kişîyayê. Semedo ke Îsmailî vîndî bîyo, Gule tersena, ca bi ca birayê xo ya gêrena û her kesî ra ey persena. Ci ra vanê ke birayê aye zî hetê eskeran ra bi qefleyêk ameyo berdene û kişîyayo. Pey de eşkera beno ke raşta zî Îsmailê Xidî zî kişîyayo.

Ma verê xatiraya înan de dare de vîndenê.

## 2. XOZAT RA ŞUWARA ÎSMAÎLÊ XIDÎ

Vana: Ax bi mi ro bo! Vanê Îsmayîlê Xidî tey vênîyo.

Mezira Dewrêş Camalan ra sona –dayê, kilê!-, palax o pus o –wey!

Gule vana: Kes qulê Heqê Talayî çînî yo, ez birusnê Xozatê vêsayîye, Îsmayîlê Xidê Uşî – wê dayê!

Vana: Îsanê na Xozatî –kilê!- kulî do arê hêganê pê qisleyî

Seyfî Dedi vano: Ez o caro nikuno merdena xo ver, ewro hîrê kênekê mi azebî yê.

Vano: Hêne nêno serê beçikanê di wê xo ra.

Juye wertê hentê milletî de silawata xo ano raya Seyfî Dedi, mursidê ena wo - lemin!

- Dayê, kilê - juye wertê hentê millet de na caba xo dano, Îsmayîlê Xidê Uşî yo.

## 3. FERHENGOK

Mezira Dewrêş Camalan: dewêka Xozatî ya ke tede ocaxzadeyê Dewrêş Cemalijî meskûn ê

**kile (m):** daye, maye

**Heqo Tala (n):** varyantê nameyê Homayî yo ke elewîyan mîyan de yeno vatiş

**birusnê:** bierşawa, bierşawê

**vêsayîye:** aya ke ganî bivêşo, vêsaye

**kulî:** pêro, heme

**caro:** qet, caran

**merdene (m):** merg, merdiş

**azeb:** nêzewejîyaye, oyo/ayê ke nêzewejîyayo/ya

**werte:** zere, mîyan

**hentê:** hende, honde

**silawate (m):** elewîyan mîyan de nameyê Kelîmeyê Şehadetî yo de

**raye (m):** rayîr


**mursid (n):** pîlê elewîyano ke hîyerarşiyê elewîtiye de cayê tewr berzî de yo

**ena:** înan

**cab (n):** cewab

# ÇEND XWARINÊN MÛŞÊ

Institut kurde de Paris



# Destpêk

Di çanda kurdan de wek gelek nîrx û dewlemendiyên kurdan, xwarin û vexwarinên kurdan jî cihekî taybet digirin. Gelek xwarinên kurdan ên xweş û bitehm hene. Xwarinên cûr bi cûr û tehmxweş di mutbexên kurdan de tîn çêkîrin. Çanda xwarinê li gor herêman, bajar û gundan diguhere; ango mirov nikare bêje ku li hemû deran xwarinên eynî hev tîn çêkîrin. Hinek xwarin hene, ku li gor nav an jî kereseiyên xwe diguherin. Ango hin xwarin hene malzemeyên ku dikevin nav wan û tehma wan weke hev in, lê navên wan jî hev cûda ne. Carna jî navên hin xwarinan eynî hev in lê tehma û malzemeyên wan jî hev cûda ne. Ev jî li gor herêman diguhere. Ev cûdahiyên ku dertêne holê jî dewlemendiya çandê û ziman dide nîşan. Ev xwarinên ewqas xweş û şîrîn jî sedî nod bi destên jinan tîn çêkîrin. Ango meriv dikare bêje ku aşpêjên kurdan bigelemerî jin in. Xwarin û vexwarin jî bo hemû giyandaran pêwîst e. Ji bo ku jiyan bidome hewceye ku mirov bixwe û vexwe. Xwarinpêjî karekî pirr kevnar e. Karê xwarin û vexwarinê jî mirovên yekem dest pê kiriye û heya niha dom kiriye û dê heya dawiyê jî bidome.

Hin kes jî bo kurdan dibêjin; xwarina wan ê sereke goşt e. Birastî jî goşt jî bo kurdan xwarineke jê neger û xwediyê cihekî girîng e. Jixwe gelek xwarinên kurdan jî goşt tîn çêkîrin. Ji ber ko gelê kurd, gelekî çiyayî, ango qewmê çiyê ne. Xwarinên wan jî li gor vê pêk hatine. Ew kesên ku li çiyê dijîn, debara xwe bi nêçîrê dikin. Jixwe gelê kurd jî berê di çiyayan de dijîyan, lewma xwarina wan ê sereke bûye goşt. Lê di çanda xwarina kurdan de ne tenê goşt heye, gelek xwarinên bi zerezawat û hêşînayîyan ve tîn pijandin jî hene. Niha jî em ê ji wan xwarinan çend mînakên bidin. Ev xwarinên ku niha qala wan bikim jî, li bajarê min, li Milazgira Mûşa Serhedê tîn çêkîrin. Kerese: malzeme,

**Nêçîr:** Seyd, bi tirkî, av-Nêçîra kewan

**Zerezawat:** şînkayî, sebze

**Xwarinên Herêma Mûşê**

**Pêdiviyên Keledoşê:**

## 1) Keledoş

Keledoş xwarineke gelek xweş û navdar e, li gelek herêman tîn zanîn û çêkîrin. Lê piranî li bajarên Serhedê yên mîna Mûş û Wanê tîn çêkîrin. Taybetmendiya herî mezin a Keledoşê jî herhal malzemeya wê ya herî girîng spîtang<sup>1</sup> e. Malzemeyêke wê ya sereke jî keşk<sup>2</sup> in. Dema wextê şînbûna spîtangê tîn, jin û qizên gundan diçin spîtangê diçinin û tînin. Dû re ew spîtanga ku tînin, bi rêk û pêk dihûnin. Piştî hûnandinê jî radixin didin tavê û hişk dikin. Herî dawî wê spîtanga ku hişk bûyî hûr dikin û dikin tûran. Êdî jî bo bikaranînê ew spîtang amade dibe.

Keledoş bigiştî di qûşxaneyê bipîpik de tîn pijandin.

<sup>1</sup>Spîtang: Navê giyayekî ye û di demê biharê de, li ser çiyayan û di nav zeviyan de şîn dibe. Di gelek xwarinên xweş de tîn bikaranîn.

<sup>2</sup>Keşk jî wek cûreyêke sos e. Ji bo gellek xwarinan wek sosek e. Keşk jî toraqê çêdibe. Toraq jî ji dewê kilandî ve çêdibe. Keşk wek kuftikan gilover tîn çêkîrin û di bin tavê de tîn ziwa kirin.



### ***Pêdiviyên Keledoşê:***

1. Spîtang
2. Keşk
3. Goşt
4. Nîsk an jî nok
5. Pîvaz
6. Rûn û xwê

### ***Amadekirina Keledoşê***

Cara serî spîtang tê şûştin. Dûre jî spîtang, goşt, nîsk, nok, pîvaz, rûn û xwê tev bi hev re dixin qûşxaneyê bipîpik û devê qûşxanê tê girtin. Di vê navberê de keşk jî di nav ava kelandî de tên bişaftin. Dû re ew keşkên ku hatine bişaftin tev keledoşê dîkin û bi kevçiyê dar ve li hev dixin. Piştî dido an jî sê saetan xwarina keledoşê amade dibe. Dawiyê de jî çend pîvaz di nav rûn de tên qelandin û li ser keledoşê tê reşandin.

## **2) Helîse**

Helîse jî wek keledoşê xwarineke pîrr xweş û bi nav û deng e. Xwarina helîsê jî xwarineke pîrr kevnar e, li Mûşê gelek tê zanîn û çêkirin. Her çiqas weke berê nebe jî hîn li Mûşê tê çêkirin. Lê mixabin niha pîrr kêmtê çêkirin, jixwe ciwanên niha xwarinên wiha kevnar pîrr naxwin û bi rastî jî pîrr jê hez nakin. Bi vê awayî here, çend sal şûn de xwarina helîsê wê were ji bîr kirin. Jixwe ku ji bo êxtiyaran jî nebe, helîse belkî qet neyê çêkirin. Lê înzallah ev xwarina xweş neyê jibîrkirin.

Helîse bi gelemperî di dîzikên de û di nav agirê tenûrê de tê çêkirin. Lewra xwarineke hinek dereng dipije.



### ***Pêdiviyên Helîse***

1. Dan<sup>3</sup>
2. Goştê sor
3. Xwê, rûnê malê û hiçhar (filfil).

### ***Amadekirina Helîsê***

Dan dixin dîzikê û avê tevlê dîkin. Piştî ku av hinek keliya, rûn, xwê û goştê sor jî tevlê dîkin û li hev dixin. Heta ku baş bipije, bîst an jî jî nîv saetan carekê li hev dixin. Ji bo ku hemû bi hev re baş bipije lihev xistinê wê hewce ye. Piştî çar-pênc saetan helîse êdî dipije. Dema ku helîse amade bû, gerek mirov nehêle ku sar bibe, lewra helîse kel be xweştir dibe. Dema ku ji bo xwarinê amade bû, meriv dîsa hinek rûnê malê tevî hinek hiçhar dihelîne û li ser helîsê dike. Wê çaxê helîse ji bo xwarinê amade dibe.

### **Hiçhar: îsot**

<sup>3</sup>Dan: Wek cûreyeke savar e, lê mîna savar nayê hêradin. Dan di gelek xwarinan de tê bikaranîn.

### 3. Keşke

Ji wan xwarinên ku li herêma Serhedê, li Mûşê tîn çêkirin, yek jî "keşke" ye. Keşke jî wek helîse û Keledoşê xwarineke xweş, kevna û navdar e. Bi rastî keşke jî tehmeke wê xweş û cûda ye. Keşke li gorî malzemeyên xwe dişibe helîsê. Lê cûdahiya keşkê jî ew e, ku di keşkê de fasûlî jî tîn bikaranîn. Jê pê ve tehm û dema pijandina wan jî ji hev cûda ne. Keşke jî bi giştî di dîzikan de tê pijandin, lê hin caran jî di qûşxaneyên bipîpik de jî tê çêkirin.

#### *Pêdiviyên Keşkê*

1. Dan
2. Nok
3. Goşt
4. Fasûlî
5. Rûn û xwê

#### *Amadekirina Keşkê*

Cara pêşî dan, nok, fasûlî, xwê û rûn berdidin dîzikê û hinek av lê zêde dikin. Dû re jî bi kevçiyekî dar keşkê li hev dixin. Piştî bîst deqeyan goşt jî îlawe dikin û dîsa hemûyan li hev dixin. Piştî du saet û nîvan "keşke" ji bo xwarinê amade dibe. Herî dawî rûn li ser keşkê tê reşandin û bi xweşî tê xwarin.

Îlawe dikin: lê zêde dikin. Davên ser.

### 4. Dolmê Keleman

Dolme jî xwarineke gelek navdar û xweş e. Mirov dikare bêje ku dolme li hemû herêm û bajaran, ango li hemû derên cihanê tê çêkirin. Xwarineke gelek bi tehm û bi nav û deng e. Gelek cûreyên dolman hene, wek mînak: Dolmê belgên tiriyan, dolmê kundiran, dolmê balîcanan, dolmê firîngiyan û hwd. Ji wan cûreyan yek jî dolmê keleman e. Dolmê keleman dibe ku li gelek cihan nayê zanîn, an jî bi navekî din tê zanîn. Lê li Mûşa me xwarineke gelekî navdar e. Dolmê keleman bi giştî zivistan û biharan tê çêkirin. Lewra malzemeya wê ya sereke belgê keleman di hemû deman de nayê peyda kirin. Kelem sebze yeke demsalî ye. Serê havînan tê çandin û di dawiya havîne de jî tê çînîn. Payîz jî gundî û bajarî, lê pirranî gundî, keleman distînin û wan di beroşên mezin de dikelînin û dixin kûpan. Piştî dido an jî sê mehan, ew kelem zer dibin û ji bo ku bibin dolme amade dibin. Li Mûşê ji vî karî re dibêjin zerkirina keleman. Dema ev kelem zer dibin, jixwe wext jî dibe payîza dereng ango dibe zivistan. Ji bo vê sedemê ye ku dolme pirranî zivistan û biharan tê çêkirin.

#### *Pêdiviyên Dolmê Keleman*

1. Belgên keleman ên zerkirî
2. Dan, rûn, xwê, pîvaz, çênc (sos/avbacan)
3. Keşk

**Nîşe:** Dolmê keleman, carinan di dewsa dan da bi birincê jî tê çêkirin û carinan jî ji bo ku tehma wê xweştir be, goştê sor dixin nava danê keleman.

#### *Amadekirina Dolmê Keleman*

Pêşîya pêçandina keleman, cara ewilî danê wê tê amade kirin. Dan, rûn, xwê, pîvaz, çênc, hemûyan tevlihev dikin û hinek av jî lê zêde dikin. Piştî ku danê wê keliya, êdî wan belgên keleman tînin nava wan tijî dan dikin û dipêçin. Ew belgên ku dipêçin, yeko yeko dixin qûşxanê. Piştî sê-çar saetan dolme ji bo xwarinê amade dibin. Dawiyê de jî keşk tîn bişaftin û bi rûn ve li ser dolmeyan tîn reşandin.

Belgên tiriyan: pelé méwan

Zerkirina keleman: zerkirina lehanan.

## 5. Girar

Girar jî xwarineke kurdewarî û pirr xweş e. Wekî gelek xwarinên din, "girar" jî di gelek deran de tê zanîn û çêkirin. Girar tehma xwe ya xweş ji malzemeyên xwe ya sereke pûngê digire.

### *Pêdiviyên Girarê*

1. Pûng<sup>4</sup>
2. Dan
3. Dew û xwê

### *Amadekerina Girarê*

Dan, xwê û pûng bi hev re nêzikî 2-3 saetan dikelînin û dû re jî dew lê zêde dikin. Piştî hinek kelandinê êdî girar amade dibe.

**Nîşe:** Li Mûşê di demên berê de jinan pirranî xwarina girarê serê sibehê, ango şeveqê de çêdikin û jê re digotin "girarsibe". Hîn jî carinan jê re dibêjin "girarsibe".

## 6. Xaşîla Dew

Xwarineke kurdan a bi navekî ecêb jî "xaşîla dew" e. Jixwe ji navê wê jî tê fam kirin ku xwarineke bi dew tê çêkirin û ji xaşîlê jî tê fam kirin ku xwarineke pirr zêde tê pijandin. Li Mûşê tiştên ku pirr bipijîn an jî bikelin, ji wan re dibêjin xaşîlandin. Xaşîla dew, ji ber ku bi keşkan tê çêkirin, jê re dibêjin xaşîla dew, ango dew navê xwe ji keşkan digire.

### *Pêdiviyên Xaşîla Dew*

1. Spîtang
2. Savar
3. Keşk
4. Rûn û xwê

### *Amadekerina Xaşîla Dew*

Xaşîl, pirranî di dîzikên de tê çêkirin. Cara yekem spîtang, savar, rûn û xwê dixin dîzikê û têra wê avê lê zêde dikin. Piştî ku êpê keliya, keşkan jî berdidin nava wê û dîsa hinekî dikelînin. Piştî ku baş keliya êdî ji bo xwarinê amade ye.

**Êpê:** gellekî keliya- pir keliya

## 7. Savara Pincarê

Jixwe savar ji bo kurdan xwarineke jêneger e. Savar li hemû deran de tê zanîn û çêkirin. Gelek cûreyên savarê jî hene. Yek ji wan jî "savara pincarê" ye. Pincar jî spîtang e, savar bixwe ji spîtangê çêdibe. Lê jê re dibêjin "savara pincarê". Cûreyeke din jî "savara hêlizê"<sup>5</sup> ye. Li Milazgirê dema dibe bihar, em diçin ser Çiyayê Qertewînê û hêlizê diçin. Ji hêlizê gelek xwarinên xweş û cuda tên çêkirin.

### *Pêdiviyên Savara Hêlizê*

1. Spîtang an jî hêliz
2. Savar
3. Rûn, xwê

### *Amadekerina Xwarinê*

Di serî de savar, rûn û xwê di nava hev de sor dikin, dû re jî spîtang an jî hêlizê lê zêde dikin. Di navbera saet û nîvek- du saetan de savar êdî ji bo xwarinê amade dibe. "Savara pincarê" pirranî bi pîvazên şîr re tê xwarin.

<sup>4</sup>Pûng: Giyayêke xwezayî ye. Di demên biharê de û li cihên avî de şîr dibe. (Cûreyek naneyê ye.)





## 8. Masiyên Tenûrê, an jî Masiyên Şoravê

Masî jî her çiqas di nav kurdan de pirr neyê çêkirin jî, dîsa xwarineke xweş û nasdar e. Gelek cûreyên xwarinên masiyan hene. Yek ji wan jî masiyên tenûrê ne. Masiyê tenûrê jixwe ji navê wê jî tê fam kirin ku di tenûran de tê çêkirin. Ev masî di serî de tîn xwêkirin û di kûpan de tîn veşartin. Piştî mehekê êdî ew masî ji bo pijandinê amade dibin.

### *Pêdiviyên Masiyên Tenûrê*

1. Masiyên şor

### *Amadekirina Masiyên Tenûrê*

Dema ku nan li tenûrê dixin û agirê wê hinekî ditemire. Ew masiyên ku şor kirine wekî nan li dîwarên tenûre dixin û nêzî bîst deqeyan di tenûrê de dimînin. Dû re jî ji bo xwarinê amade dibe.

Di çanda me kurdan de wek her dewlemendiyan me, mutbexa me jî xwedî dewlemendiyeke mezin e. Xwarinên me yên cûr bi cûr, xweş û tehm-xweş hene; tenê bila em qîmeta wan bizanibin. Hûn jî kerem bikin para xwe ji vê dewlemendiya xwarinan bigirin. Haydê ji we re noşîcan be xwarinhezno...

**Nasdare:** Navdar e

**Çavkanî:** Helîme Aktekîn, Cahîr Atli

**Berhevkar:** Ozan Aktekîn

**Herem:** Pasûr/ Amed

**Dema berhvkarîyê:** 2016



<sup>5</sup>Hêliz jî wek pûngê giyayeke xwezayî ye û dema biharê li ser çiyayan de şîn dibe.

Berhevkar:  
Cihan Roj



## ÇEND DÛRIKÊN KURDÎ JI DERDORA GIMGIMÊ

Kurd qedrek mezin li dengbêjiyê digirin; lewre dengbêjî him wek huner ji hukmê delaliyê, him wek metn û qeydên bûyerên dîrokî muhîm in. Lê ku meriv li berên din yên çanda Kurdî dinêre di wan beran de jî metn pirhêl in. Wisa ku mijar dûrik bin jî meriv bi qasî dengbêjiyê li dûrikan metel dimîne, ku naverok, pirhêlbûn û aliyê wan ê hunerî ewqas xurt in.

Di vê dûrikê de rewşa kolonyal bi hukmek wisa tê derbirin, ku meriv diheyire:

*"Merûyê bêxwedî*

*Axpîna nav gund e,*

*Her kes lê diçêre..."*

Mesela çêrandinê, çi wek rastiyeke kolonyal, çi jî wek arîşeyek tebaqên civakî di jiyana Kurdan de têgeheke muhîm e! Çêrîn, him ji bo

rewşa zordarî û heqxwarinê tê bikaranîn, him jî îtiraz û qehrekê jî vedihewîne. Çêrîn, ew têgeh e ku di jiyana ajalan de tê bikaranîn! Li vir xisûsiyeteke vegotîna Kurdî der tê. Ku çiqas nerm û masûm xuya bike jî, ji alî maneyê ve kûr û bi derb e! Belkî ji alî sosyolojîk ve di heman demê de meriv li ser têgeha "sernermbûna" Kurdan bifikire, lê bikole û şîrove bike!

*Keko qurban*

*Ez qulîng bûm*

*Narim çolê*

*Ez bûm ordega kor*

*Ketim binê golê*

*Min dî ez ketim*

*Derê sawcî û qereqolê.*



Heman masûmiyet, zelalî û bedewbûn di vê dûrikê de jî heye. Lê ku însan li jiyana Kurdan, li têkiliyên Kurdan û hiqûqa serdestan ya di meriyetê de dinêre, wê wextê însan lê hay dibe bê ew dûrik çi qehreke bêeman e jî! Dûrik, têkiliya Kurdan û hiqûqê jî teşhîr dike. Meseleya "zêr" dizane çerçoveya di meseleyên kurdan û gelên din de bi bandor bûye. Her wiha di meselên hiqûqî de jî "zêr" gelek arîşeyan hal kiriye! Lewre her kurdek dikare vê dûrikê xweş fahm bike, bi dehan mînan kan bide û kesên bêhay û masûmî di dozan de çawa hatine sûcdarkirin û yên bi "zêr" û bi "zor" çawa xwe jê xilas kirine.

*Ez çi gul im*

*Ne gul ten im*

*Ta ji rihana boyaxsîz im*

Normal e ku kesên jiyana bejahiyê dijîn, xwedî li surîştê der tînin. "Ta ji rihana boyaxsîz" hunera modern îfade dike. A ku bala meriv dikişîne ev hewayê derbirîna bitaqet e. Di edebîyata modern de yek ji taybetiyên sereke jî razberkirina zimên e. Li ser vî esasî jî Kurdî hewcedarê lêkolînan e.

*Xwezîla dilê meta te*

*Qey deng nekira*

*Vê sibê min ê*

*Ji te ra defterek vekira.*

Her kurd di halekî wisa de ye, naxwaze deng bike, naxwaze dest pê bike, naxwaze deriyê dilê xwe vebike...

Ev rastî û halê diltije yê ku kurd êdî wek baweriyekê lê dinêrin, mixabin di edebîyatê de carna dibe sebebê gavên nebaş; gelek kes wisa bawer dikin ku jiyana wan, şahidiyên wan, dîtin û nêrînên wan ên derbarê kurd û Kurdistanê de besî edebîyateke heta hetayê ne! Li ser wî hiş û baweriyê dest pê dikin bibin şaîr, çîroknûs û romanûs. Lê dikin. Dî-nêrin ku hê di çalakiya pêşî ya berhemên edebî de, ew "dunyaya berfireh a edebî" qediya! Halê biêş dest pê dike. Heta hin ji wan vedigerin gilî û

gazinan, li civak û xwendevanan digirin, bê çima qedr ji berhema wan re nehatiye girtin! Lêbelê hemî êşên kurd û Kurdistanê di berhemê de li gorî wan hene! Belê deftera her kesî heye, li vir şik û guman nîn e, lê ku em wek defter li meselê binihêrin, ew defter bi rastî berên mihteşem in. Eger em wan defteran wek referans û çavkanî têtîr edebîyata modern bibînin ev xeletî ye. Çarçoveya ku gelek kesan bi ajîteyan û bi bîrxistinên klasîkên kurdî re hewa û atmosferê afirandin. Pey re, her ketin nava halê dubareyê, wisa ihtimal e ku nêzikahiyên şaş ên li çanda devkî, me di çanda modern de têk bibin!

Ji têkiliyên nostalgîk bêtir nêzikahiyên modern, ên ilmî şert in. Heke hûn hin dûrikan bixwînin weke helbestê jî mihteşem in. Ev taqeta zimên û hêza xeyalê nebe sebeb; ku destê me li berên hunerî yên modern wê sar bibe. Bi awayekî, çanda me ya devkî wek ava di golan de mayî ye, genî bûye. Destpêka me gerek ev rastî be. Mesele ziman be, divê em ji wan golan ve dest pê bikin. Taqet bi zimên bikeve da ku barê rastiyên modern hilbigire û ew ziman di heman demê de îmkânên xwe, aliyê xwe yê hunerî gelek bi pêş ve bibe, ev rengekî xurt ê Kurdî ye. Ji vê hêlê ve çi veşêrim, ev ziman meriv serbilind dike! Ne wisa be, kes ne li bendê ye ku ciwanek bi teknolojiyê re mezin bûbe û rabe ji halê dilşewat û jiyana teng ya demên kevnare hez bike! Em ne bi navê pisporî û profesyonelî, wek xwendevan ji bo zimanê xwe, xweş û baş nas bikin, gerek karibin bibin xwendevanek baş ê tarîxa zimanê xwe. Pê re jî karibin bibin xwendevanek delal ê edebîyata dunyayê, êdî ji wê pê de gavên me yên piçûk wê serbestir bin ber bi edebîyata dunyayê ve.

*Dara nebîrin*

*Dar dibin devî*

*Xwedê deviyên nahêlê bê hêvî"*

Wek gotina dawî, her ku mirov li heyatê bûye, tu car xwe ji hêviyê qut nekiriye. Dibe ku di çanda devkî û ya nivîskî de, her a muhîm hêvî bûye.

## ÇEND DÛRIK

1.

Min sond xwariye  
Naçim çiya  
Bala xwe ber nadim çavkaniya  
Emir ji wekaleta tirko hatiye  
Dibêjin kurmanc herin çiya  
Destê min şikestiye  
Ji satilê  
Koma bêriya.

2.

Çûm Bîngolê belekiya  
Min berav rast kiriye  
Bi gwîniya  
Ez ê vê sibê dişomê  
Dilê rihet nabe  
Çekê xal û xwarziya.

3.

Qulîlek<sup>1</sup> derbas bûye, çûye  
Çi silava li ser serî ye  
Min şandî oda mezin  
Çar derî ye  
Heta min xwe gihandî  
Mektûva min çû  
Destê xortê tûncik û temerî ye.

4.

Çûm welatê hanê  
Xerîbiyê  
Berf barî ye  
Li qama miyê  
Ba'kî hatî ji alyê Wanê  
Şewq û şemal daye Diyarbekir  
Etegê Tetwanê  
Ji xêra Xwedê ra  
Mizgînek bihata  
Bigota  
Qerara Kurda xweş danê.

5.

Keko qurban  
Ez quling bûm  
Narim çolê  
Ez bûm ordega kor  
Ketim binê golê  
Min dî ez ketim  
Derê sawcî û qereqolê.

6.

Wey bilbilo wey bilbilo  
Tu nexwîne vê sivengê  
Li baxçekê bê gulo  
Xwedê rebî  
Tu car tu miradê can û canika nekî bédilo.

7.

Kekê min sekinî  
Li ser sergo ye  
Qayîşa li piştê  
Zo bi zo ye  
Keko qurban  
Min go hîv e  
Te go ro ye  
Bexê m çûye eskeriyê  
Min qurbana bejna zirav  
Bi tûncik û temerî ye

8.

Gul im gula li awakî  
Gularn hêşîn bûye li ser takî  
Xwengê tu xwenga birakî.

9.

Min dil nedî bi dilciya  
Bizîn nedî ye  
Bi rengê miya  
Ez ê kesê negirim  
Xên ji lawikê Hemîdiye

<sup>1</sup>Qulîlek: Dibe ku ev pey qulingek bi; lewra qulîlik di wateya tiştên vala de ye. Lê di folklorê kurdan de "quling" cihêki girîng digire. Bi qulingan re silava dişînin ji kewşên li xerîbiyê re, xort û qîz hal û xatir dipirsîn.

10.

Çi qulinga pelaza ye  
Binê mala erd veda ye  
Xwelî li serê xwenga bê bira ye.

11.

Ez çi gul im  
Ne gulten im  
Ta ji rihana boyaxsiz im

Tirsam ji wê tirsê

Bikevim ber kotî

Mêrê heram

Ber da birizim

12.

Dilê hêlîna ser xencerê

Berxêm tezbîyê dikşîne fena berê

Keko qurban dilê te nizam, dilêm dîsa dilê berê.

13.

Çi pismamo tilfîrî

Ji Helebê ka bikirî

Heta hato

Domam dayê

Qelîn birî

Çi pismamo mixaneto

Rêya bajêr li berketo

Emniya qutya ne li rûyê

Çiyo te li domamê

Kir mineto.

14.

Dar im dara di gelî da

Bişkov daye di serî da

Mirad xweş e di heftsalî da

15.

Çi paleko hal e hal e

Hem diçine hem dînale

Ji eybê xelkê neba

Minê tirpana kekê xwe bida ser piya

Heya mal e.

16.

Înaq şewtê

Bi şan û şîn e

Vê sibê rakirine

Xwêdanî ne

17.

Qolî Baba sûr e sûr e

Toram qetya morî hûr e

Keko qurban

Bi destê bigre

Biavêje Vartoya jorîn

Xalî te bibe xezûr e.

18.

Çi zinaro şaq e şaq e

Min gul çinî

Te kir baq e

Qîzka kurmanc

Lawkê reaya re pir lîyaq e.

19.

Xwezila dilê meta te

Qey deng nekira

Vê sibê min ê

Ji te ra defterek vekira.

20.

Hawar delal

Hawar delal

Min da destê kekê xwe

Tasa sipî ava zelal.

21.

Mêrekî bi sed mêra ye

Ne ku ta û tolazê ser xaniya ye

22.

Dara nebirin

Dar dibin devî

Xwedê deviyên nahêle bê hêvî.

Gotindar: Besê

Cih: Gundê Înaq û Hecîbega Jêr-Gimgim

Dem: 2014 Havîn



Arêkerdoxe:  
Zehra GULTEKÎN

## DIRÛKÊ MAYA EHMEDÎ

Ehmed lacê Mistefa yo. Mistefa zî axayê dew o. Mistefa merdo. Ehmed şenikek o. Destê Ehmedî ra yew olay qewimyeno, şer beno, camerdêk kişeno, dekûweno heps. Malê Ehmedî zaf o, Ehmed hema gedeyo naşî yo. Îdamê cê wazenê, vanê Ehmedî bikşênê. Maya Ehmedî vana ez se bika. Vana tewrê altûnan fînê serê estorê Mistê axayî, berê vera Ahmedî bidînî kolordîyo, qomûtono, hakim û milîvanî. Vana Ehmedê mi hema gede yo, şinik o, nezan o. Vana "Wa enê altûnî vera bisencê, Ehmedê mi veradê, qatêk cilê efendîyan berê Ehmedî radê." Îdamê Ehmedî vazenê. Ehmed heps ra remeno, dano piro şono. Ay çax tira vanî eskerê qapqapî. Eskerê qapqapî dormarey cê genê. Ehmed yanî remeno, tewişênê, sungîyan kuwenê, goştê Ehmedî letew letew kenê finenê.



## Maye Ehmedî ser o vana:

Lorî lorî Ehmedê mi Ehmedê mi şenik nezan o  
 Ehmedê mi şenik hîçek o lorî lawo Ehmedê mi  
 Ax binê Pîrejmanî bixetî serê Pîrejmanî bixetî  
 Lorî lorî Ehmedê mi lorî lorî şinikê mi  
 Qûrban Ehmedê mi mi rê bîyarê  
 Ehmedê mi wayîrê hîris û hîrê dewn o  
 Lorî lorî Ehmedê mi ax  
 Ehmedê mi wayîrê hîris û hîrê dewn o  
 Lorî lorî Ehmedê mi wax  
 Ehmedê mi sermîyanê kêyan o lorî lorî Ehmedê mi  
 wax  
 Qûrban berê vûstora Mistê axan o lorî lorî Ehmedê mi  
 wax  
 Qûrban berê vûstora Mistê axan o lorî lorî Ehmedê mi  
 wax

Qûrban bîyarê torbê heqîban o lorî lorî Ehmedê mi  
 wax  
 Qûrban bîyarê tewrê altûnan o lorî lorî Ehmedê mi  
 wax  
 Qûrban birawo Ehmedê mi  
 Bidê kolordîyo qomûtano milîvano lorî Ehmedê mi  
 wax  
 Wa Ehmedê mi bisencê wena altûnan o lorî lorî  
 Ehmedê mi wax  
 Qûrban serê Pîrejmanî bixetî lorî lorî Ehmedê mi wax  
 Qûrban binê Pîrejmanî bixetî lorî lorî Ehmedê mi wax  
 Qûrban eskerê qapqapî sungîy vetî lorî lorî Ehmedê mi  
 wax  
 Qûrban eskerê qapqapî sungîy vetî lorî lorî Ehmedê mi  
 wax  
 Qûrban goştê Ehmedê min kerdû letew letî lorî lorî  
 Ehmedê mi wax  
 Qûrban goştê Ehmedê min kerdû letew letî lorî lorî  
 Ehmedê mi wax  
 Qûrban day to kor bo berxikê mi lorî lorî Ehmedê mi

wax  
 Qûrban day to kor bo şinikê mi lorî lorî Ehmedê mi  
 wax  
 Lorî lorî lorî lorî lorî lorî wî  
 Ehmedê mi lorî lawo Ehmedê mi lorî lawo Ehmedê  
 mi  
 Qûrban Ehmedê mi şenik nezan o Ehmedê mi şenik  
 nezan o  
 Qûrban lorî lorî lorî lorî Ehmedê mi lorî lorî şinikê mi  
 Qûrban Ehmedê mi wayîrê hîris û hîrê dewan o  
 Qûrban Ehmedê min wayîrê hîris û hîrê dewan o  
 Ehmedê mi sermîni xu kêyan o Ehmedê mi sermîni  
 xu keyan o  
 Ehmedê mi bîyarê estorê Mistê axan o Ehmedê mi  
 bîyarê estorê Mistê axan o  
 Ehmedê mi rê bîyarê qatê cilê efendîyan o Ehmedê  
 mi rê bîyarê qatê cilê efendan o  
 Ehmedê mi rê bîyarê tewrê altûnan o Ehmedê mi rê  
 bîyarê tewrê altûnan o  
 Birawo Ehmedê mi bidê kolordîyo qomûtano milîvano  
 ax bira Ehmedê mi  
 Bidê kolordîyo qomûtano milîvano lorî lorî lorî lorî  
 lorîw lorî Ehmedê mi wax  
 Qûrban birawo Ehmedê mi bidê kolordîyo qomûtano  
 milîvano  
 Qûrban serê Pîrejmanî serê Pîrejmanî xu rê xet î binê  
 Pîrejmanî xu rê xet î  
 Qûrban eskerê qapqapî sungîy vetî qûrban eskerê  
 qapqapî tifingî vetî  
 Xu rê goştê Ehmedê min kerdû letew letîw  
 Ay lorî lorî lorî lorî day to kor bo Ehmedê mi  
 Qûrban Ehmedê min xu şenik o xu nezan o  
 Qûrban Ehmedê min xu şenik o xu nezan o wax

Çime: Hava KELEKÇÎER (72)  
 Mintîqa: Pîran/AMED



Nivîskar:  
Zeyneb Yaş

## Elî Tico (Mihemed 'Elî Tico)

Hunermend Mihemed 'Elî Tico, ku bi navê Bavê 'Elî tê naskirin, ji gundê Hesên Dêra ku girêdayî navçeya Bilbilê, herêma Afirîna Rojavayê Kurdistanê ye. Di sala 1930'an de di nav malbatek hunerdost de çavên xwe li jiyana vekirine.

Elî Tico, yek ji hunermendê devera Afirînê yê navdar e, ku gelek hezkiriyên wî li nav tevayî kurdên Sûriyê û Bakurê Kurdistanê hene. Ew bi hunera xwe ya tenbûrjeniyê, danîna peyv û awazên stranên resen ên kurdî, stranên evîndarî, şoreşgerî û folklorî derketiye pêş.



Hunermend 'Elî Tico, di jiyê 8 saliyê de ji ber xwe ve fêrî stran gotinê dibe. Lorin û stranên dayîka wî Meyrem ên xembar, bi kul û keder di-hêle ku meyla wî yekcartir here ser gotina stranan. Wî dayîka xwe ji xwe re weke dibistanek hunerî dîtiye, ku ew jê fêrî gelek dûrik, lorik û lawjeyan dibe. Di dîdarek xwe de 'Elî Tico dibêje, dema Şerê Cîhanê yê duyem de 2 birayên wî tevî artêşa Ingilîz diçin şer û wan dibin Bakurê Efrîka û Filîstînê. Ew winda ne û xeber ji wan tune. Gelek caran dayîka wî stranên davêje ser wan. Dengê dayîka wî ya bi kul, jan kartêkirinek mezin li ser 'Elî Tico jî dike ku berê wî yekcartir dide ber bi stranbêjiyê ve. Her weha dengbêjên navdar ên Herêma Afirînê yên weke; "Evdê Şera" û "Hesen Nazi" jî bandorek mezin li ser hunera wî dikin û berê wî didin ber bi stranê ve.

'Elî Tico, xudan kesayeti û karîzmayek taybet bûye. Li herêmê ku ew bi rastgo û hêz hatiye naskirin. Di dewra xortaniya xwe de dil dikeve keçekê, lê evîna wî bi ser nakeve û nagihên hev. Loma vê dilketina wî bandorek mezin li ser hestên wî kir, ku di 18 saliya jiyê xwe de dahê-naniya wî ya stranbêjiyê steward, wî qehr û kîna dilê xwe bi awayek hunerî honand, gelek stranên xweş afirandin.

Ew, ji bav û birayê xwe ferî tembûrjeniyê dibe. Belam hunermendên Bakurê Kurdistanê û taybet huner û hunermendên devera Entabê bandoreke mezin li ser hunera wî dikin.

Naverok û mijarên stranên 'Elî Tico bêtir li ser evîn, xweza, sirûştta Herêma Afirînê û xaka welat in. Wî gelek stranên xwe jî ji stran û klamên bav û kalan, çîrok û destanên Kurdan hilbijartine.

Di sala 1976an de rêxistina "Ûnesco" ya bi ser Neteweyên Yekbûyî ve, wî vedixwînin Firensayê ji bo dîdareke hunermendan, ku gelek hunermend ji gelek cihên cîhanê tê de beşdar in. Ew di vê serdana xwe de diçe welatê Firensa û Holenda, 5 salan li ser hev li van welatan strana Kurdî weke hunermendekî kurd pêşkêş dike. Deng û stranên wî ji bo Parastina Samanên<sup>1</sup> Netewî tîn tomarkirin û ragirtin.

Ji zaroyên 'Elî Tico çend kesan daye ser şopa bavê xwe, ku keça wî ya bi navê Araz xwedî şiyaneke<sup>2</sup> bi hêz e û di warê stranê de wê ligel bavê xwe gelek stranên duqolî<sup>3</sup> gotine.

Di roja pêncşema 16.2.2012'an de hunermend

'Elî Tico, di 82 saliya xwe de li Afirînê ji ber nexweşiya dil, ji nav gelê xwe bar kir.

Mihemed 'Elî Tico, xudanê hunera resen a kurdî bû, ku heta dema nexweşiya xwe jî her dem bi folklorê kurdî ve girêdayî bû û stranên xwe li ser doşeka nexweşiyê jî digotin. Cenazeyê 'Elî Tico bi beşdariya deh hezaran kesî ve pêk hat. Bi alaya Kurdî hate pêçan û li nava Afirînê hate gerandin û piştê berê wî dan cihê ji dayîkbûna wî û li goristana gundê Hesen Dêra sipartin axê.

### Berhemên Wî:

'Elî Tico, yek ji wan hunermenda ye ku strana folklorî ya xweserî Herêma Afirînê bi hemû reng û rismên wê li xwe girtiye û reseniya wê ragirtiye. Di raboriya jiyana xwe ya hunerî, tev de di aheng, şahî, dawetan de xizmeta muzîka kurdî kiriye. Bi şîroveya xwe ya xas û taybet hiştiye ku nivşê nû ji strana kurdî ya resen û folklorê hez bikin. Lewma ew berketiyê hunermendan bû, bi taybet li Herêma Afirînê.

Wî gelek klam û stranên xwe li ser mîrxas û lehengên Kurdan çêkirine. Ji ber wê çendê jî, her berê rejîm û dewletê lê bû. Di sala 05.02.2008'an de ji ber ku hindêk mêvanên wî ji Başûrê Kurdistanê weke hunermendekî Kurd seredana wî dikin û di 78 saliya xwe de ji aliyê hêzên dewletê ve tê girtin û heta demekê agahî jê nayê standin, lê paşê tê berdan.

Wî bi zimanê kurdî, erebî û tirkî zanibûye. Zanîna wî ya bi zimanê tirkî hiştiye ku ew zêdetir hunermend û stranên Bakurê Kurdistanê, bi taybet stran û meqamên devera Entabê baştir nas bike.

Hejmara stranên ku wî bi xwe çêkirine ji 100<sup>1</sup> zêdetir e. Ligel bi sedan stran û klamên folklorîk ên xasî şêwezarê kultura Afirînê. Stranên wî yên; Lo Dilo, Şêx Se'îd, Leyla Qasim, Merzemê, Yara Milêse, Siyad Ehmed(Siyamend), Êmo, Sewdaliyê, Saliho, Hesen Pismam, Xarzê Mihemed, Delal, Zeynebê, Bavo Min Pêdin û hîna gelekê din stran û klamên wî yên naskirîne ku li ser zarê gel tene gotin.

<sup>1</sup> Serwet, dewlet.

<sup>2</sup> Karîbûn, hêz, qewet.

<sup>3</sup> Duqolî: duet, du kes ku stranên davan ber hev.

### Dayê Min Pêde

Anê mi pêde, dayê mi pêde

Anê mi pêde, dayê mi pêde

Bistîn hezarî pensesdî zêde

Bistîn hezarî pensesdî zêde

Wî pensesdî jî

Tu'b hene bide lê anê li biskê xwe bide lê dayê  
li gulyê xwe bide

Keç dibê anê min pêde, e diya xwe me, e jî  
dibê me nadim

Anêy şivan e

Bixwidê şivan e

Keça'm şivan e

Keça'm mi bixwidê şivan e

Çol û yaban e

Deşt û çiya ne

Bi şev pê dakim êvarê berf û barane keça min  
berf û baran e

E te nadim wan e

Te nadim wan e

Ti pir bihayê keça mi xu meke erzan e,

Xu meke erzan e xu meke erzan e keça min te  
nadim wan e

Zanim şivan e

Têr xwiyane

Zanim şivan e lo bavo

Têr xwiyane

Ê derê hane

Têr xwiyane

Ê derê hane lo bavo

Têr xwiyane

E şivên nadim

Beg û axa ne

E şivên nadim lo bavo

Beg û axa ne

Li cem te şivan e

Li ba min siltan e

Li ba te şivan e lo bavo

Li ba min siltan e

Berxêt mala bavê min kirne beran e lo bavo

Kirne beran e

E zanim şivan e

Wille şivan e

E zanim şivan e

Wille şivan e

Çow û weywane

Çiyay û deştane

Çow û weywane

Çiyay û deştane

Bi ser wî dakim hevalê berf û baran e lo bavo

Berf û baran e qurbano berf û baran e

Leylê Leylê Leylê o Leylê Leylê

Qîza'm şivan e

Ela şivan e

Qîmîş te nabim nadime wan e keça min nadime  
wan e

Qelenê te didin keçê komê zêra ne

Cotê hespa ne

Keriyê mîha ne

Te nadim wan e

Te nadim wan e

Tu'b xwe horiye keça min

Ti xwe nizane

Ti xwe nizane

Ti pir bihayê keça min

Ti horî û xeybaye

Deredekê hanê başê min her yane yane, qîza  
min her yane yane

Zanim şivan e

Ti lê xuyane

Zanim şivan e lo bavo

Ti lê xuyane

Carkê dilketiye bavo

Tine îmkan e

Carkê dilketiye bavo

Tine îmkan e

Li ba te şivan e

Li ba min siltan e  
 Li ba te şivan e lo bavo  
 Li ba min siltan e  
 Simbêl badane  
 Wekî qeytan e  
 Simbêl badane lo bavo  
 Wekî qeytan e  
 Lingêt sipî ne  
 Lingêt sola ne  
 Lingêt sipî ne lo bavo  
 Lingêt sola ne  
 Lêviya gora ne lo bavo  
 Lêvya gora ne  
 Wille xizêm e  
 Bi xwidê xizêm e  
 Wille xizêm e  
 Bi xwidê xizêm e  
 Xwandin çekandî  
 Hundirûnê li hêne  
 Beden keman e  
 Beden keman e  
 Çavêt xwe ya şil  
 Beden dilin de  
 Gulî beden e  
 Çiqa bi tertîbe hoy xwidê, çiqa bi tertîb e  
 Lakîn çibkim çi feydehîka zeytê ye  
 Aqilî kêm e  
 Aqilî kêm e.

### Lê Şawiyê

De wêda wêda, lê rindê wê da  
 Wêda wêda lê 'erebê wê da  
 Lê ji vira wê da  
 Lê tekrar wê da  
 Lê dîse wê da  
 Ji min dûr bireve  
 E jî dişewitim darê xwe da  
 Ez ê ji ber babelo şerê te birevim lê herme ku  
 da hevalê herme ku da  
 Ne ji ku de herim qedera min bûye qedera Eyşe  
 Şan ê  
 Xanim va şehre Kadîkoyê


Qedera min bûye dijînkî xedrikî bi yeman rûyê  
 xwe yî zer bûye sîleha mirinê bi desta  
 Hevalê bi ku ve derê  
 Dibre di pêşya mi da  
 Xîstet pêşya mi da  
 Ez ê çewa bikim law bavê xemîn  
 Qedera reş yaqa min berneda lo çikya mida,  
 çikya mida  
 Ez ku va derim şaşiya tirvîzona dilê mi jî mî ra  
 Ez çiqasî berî xwe digewirim ça dinêrim xelkê  
 kîvarê di şaşê de

Êy ne hevalê qey ne ti nizanî barê min î giran e  
 Ti jî bera germekê lê li ser bera da  
 Qey ma ti nizanî salê mi zêde ne  
 Hestiyê mi kevnar e  
 E nikarim rabin binda  
 Goştê qam û kilê mi şikiyane  
 Di bin barê te da  
 Erê hevalê kî ve derim xelkê min î delal dibînim  
 xeyala mi da  
 Şevê zivistanê tenikin dirêj in wek insan in wek  
 insan in  
 Ne pazde saatûnê di nav nivîn û ciya da  
 Ji xewa tîrê xelkê ra dixewe ne diqûlibim  
 Lê virda wê da  
 Hevalê virda wê da  
 Şîrînê virda wê da  
 De îşkarê da vir da wê da

### Jêder:

- More about Kurds in Syria - (Kurdistan-Syria) From Wikipedia, the free encyclopedia. (Suriye'de Kürtleri - (Kurdistan-Suriye) Vikipediya, özgür ansiklopedi.)
- <http://semakurd.net/node/210>
- Ji berhevkirina min ya di derbarê hunermendên Çiyayê Kurmênc de, ji ser zarê Hunermend Babê Selah 2013.
- Berhevkarîya arşîva stranan, nivîskar, Evîn Şikakî.

Berhevkar: Asmîn ÜYANIK





## NIFIRÊN BI TÎPA “D” YÊ

- 1- Dê û bavê te bimirin!
- 2- Dengê te bibire!
- 3- Dengê dergûşa kurîn nekeve guhên te!
- 4- Dengê vejîna zarokan nekeve guhên te!
- 5- Dêran bibî!
- 6- Dêrd û êş û dozdeh mirin para te bin!
- 7- Dêrdê bê derman bikeve canê te!
- 8- Dêrdê Eyubê kurmexwarî li te bikeve!
- 9- Deriyê te û bavê te bê girtin!
- 10- Deriyê te kilit bibe!
- 11- Destên te bişikên!
- 12- Destên te pûç bibin!
- 13- Di bin çenga de kul hato!
- 14- Di çavan de hato!
- 15- Di gewriyê de mayo!
- 16- Di her(şes) zarokên xwe di şoyekê de veşêrî!
- 17- Diran di devên te de nemînin!
- 18- Dil û hinavên te di devê te de were!
- 19- Dil û hinavên te bêne xwarê!
- 20- Diya te bimire!
- 21- Dukel ji mala bavê te bilind nebe!
- 22- Dundana te kor bibê!
- 23- Dunde bi dû te nekeve!
- 24- Dewletê tu li ser dewletan bigerî!
- 25- Di bin erebeyan de bimîni!
- 26- Dê û bavê te bi te şa nebin!
- 27- Diya te bê sersaxiya te!
- 28- Dev li te xwar bibe!
- 29- Devê te venegere!
- 30- Dara te şîn nebe!
- 31- Dawiya dawî nifirên te li te biqelivin!
- 32- Dêrd pêketiyo!
- 33- Di ser min re ji yekî hez bikî, darê dergûşê nedî ber xwe!
- 34- Dest û lingên te şeht bibin!
- 35- Deriyê te bi heft darên givîjê girtî be!
- 36- Dêya te şîna te bike!
- 37- Dev li te xwar bibe!
- 38- Dû bi rojîna te nekeve!
- 39- Dewsa avê de xwîn bimîzî!
- 40- Deriyê te mir biyo!
- 41- Diz bikevin mala te!
- 42- Doşeka te erd balgiyê tek kevir be!
- 43- Di bin dîwar de bimîni hey!
- 44- Dîwar bi ser te de bê!
- 45- Di gewriya te de bimîne!
- 46- Di wîtelê (qam) de bimîni!
- 47- Dûman aqilê te bigire!
- 48- Dengê zarokan neçe guhên te!
- 49- Dêrdê te hebe, dermanê wî tune be!
- 50- Dê û bavê te xêrê ji te nebînin!
- 51- Di çavên te de hato!
- 52- Dermanê te goştê canê te be!



Arêkerdax:  
Veysi ŞİMŞEK

## GÛEVENDÊ CINDÛN

Cêk ben cêk nîben , yo mîyerik ben. Mîyerik zaf feqîr, la-îlaj nûn a mehtaj o. Yo bize yî ,yo zî mûngeya yî est a. Rûejêk ben şûnd, mûngeya yî kûe ra anigêrena. Mîyerik kuwen reyar şin bigêr mûngeya xwu. Şin vêr yo derî ûnîyen ci, vêr derî d' bîn yo hafî d' yo adir vêşen. Mîyerik şin vêr adir, eg yo qeflê cindûn; kêna, laj, cûmîyerd, cinî, pîyor pîya bi de, hê gûevend ken û vûn:

- Çarşembi wo çarşembi, çarşembi wo çarşembi...

Mîyerik gûevend vînen, daymîş nîben, yo zî şin kuwen mîyon qeflê cindûn û yo zî pa yîn a vûn "Çarşembi wo çarşembi, çarşembi wo çarşembi". Înha hetûn sêr sibay gûevend ken û vûn,"Çarşembi wo çarşembi, çarşembi wo , çarşembi...". Hîn nizda g' tij vej, o yo cind vûn:

- În merdim emşo ma d' zaf weş gûevend kerd, zaf kêf mi pê ûmo, aye ra ez vûn, bîyerîn ma yo xela bid ci.

Cind bîn vûn:

- Vatê ti wo, yî hin yo rey zî xwu şaş nêkerd, ma yo xela bid ci.

Cindûn yo perjûnê pûir pîyûnz û sîr dûn ci û wuertî ra ben vîn. Cind wuertî ra ben vîn, mîyerik pîyor pîyûnz û pîyor sîr ken ard, o pîyor pîyûnz ben zerd û pîyor sîrî z' ben sîm kuwen erd. Mîyerik zaf ben şa, Ca d' zerdûn xwu û sîm xwu ben ken wuerdî, qijûn xwu r' kincûn mincûn gen, temel yo bûn newî z' nanû rû.

Yo cîrûn mîyerik est wû z' zaf feqîr o. Cîrûn yî vûn:

- Cîrûn ti îh hend pere ça ra erd, ti hê temel bûn nanû rû, ti warçî guret, xêyrî ya?

Mîyerik vûn:

- Cîrûn, vîzyer mûngeya mi bib vîn, ez şîya vêr derî d' bigêr mûngeya xwu. Vêr derî d' bîn yo hafî d' yo qeflê cindûn bib, gûevend kerdî û vatîn, " Çarşembi wo çarşembi, çarşembi wo çarşembi..." Ez şîya bîya, mi pa yîn a gûevend kerd û mi hetûn sêr sibay va "Çarşembi wo, çarşembi wo, çarşembi wo, çarşembi." Bi sêr sibay, cindûn yo perjûne pûir sîr û pîyûnz da mi, pîyor gina erd ro, aye pîyûnz bi zerd, aye sîrî z' bi sîm. Cîrûn yî ben şûnd şin vêr derî, bîn hafî d' adir ho wuekerdi, cind hê gûevend ken û vûn: "Paşembi wo paşembi, paşembi wo paşembi..." Cîrûn şin ben mîyon cindûn û bi yîn d' gûevend ken.

Cind vûn:

- Paşembi wo paşembi, paşembi wo paşembi...

Cîrûn mîyerik vûn:

- Çarşembi wo çarşembi, çarşembi wo çarşembi...

Înha hetûn sêr sibay cind vûn, "paşembi wo paşembi" mîyeriki z' vûn "çarşembi wo çarşembi." Ben sêr sibay hîn şefeq ho erzen , yo cind vûn:

- Lîya îh merdim emş ma gûeşûn ra berd , wila yî hetûn sêr sibay vat; çarşembi wo, çarşem bi. Bîyerîn ma yo ceza bid ci.

Cind bînî z' vûn:

- Ti raşta vûn, yî ma hîş ra kerd, ma ceza bid ci.

Cind vûn:

- Bîyerin ma zûn yî tira kêr!

Ey bînî z' qebûl kê, zûn mîyerik tira kê.

**Çime:** Şefîqa ŞÎMŞEK

**Herem:** Dara Hênî

# Kincên Kurdên Xorasanê

## Lêkolînan: Şoreş REŞÎ

Ji qûmaşê ku mirov li xwe dikin re piraniya Kurdên Kurmanc peyvên mîna: "cil", "çek", "kinc"; ên li Xorasanê dijîn jî peyva "kon" bikar tînin. Bi van re girêdayî, di nava civakê de peyvên mîna: `cil û cor`, 'cil û berg', 'çek û çol' û 'kinc û kol' jî bikar tên...

Navlêkirina Xorasanîyan û peyva kon balkeş e û li tu aliyekî din ê Kurdistanê ew nayê bikaranîn. Îhtîmaleke mezin e ku peyva `kon` jî hûnandina serdema berê ya kinc û konan tê. Di serdema berê de Kurdan hem kon/çadir û hem jî kincên xwe bi rîs di dezgehên tevnan de dadigirtin. Parçê qu-maşên jî tevnê derketî bi hev ve kêl dikirin û wek kinc li xwe dikirin. Va yeka hem jî alî kurdên niha li navênda Anadolê û hem jî alî yên niha li Xorasanê dijîn ve dihat kirin; ku herdû alî jî heman êla ne... Dibe ku serdema berê de herdûyan jî peyva kon a ku ji "kirinê" têyî bikar tanîn. Lê di roja îro de yên li Anadolê wek kinc bi lev dikin. Xorasanî peyva kinc di wateya kincên zava de dizanin. Yanî yên nû û yên bi fors. Va zanîna li herêma Botanê dibe cilên kevin.

Dîsa li gelêk herêmên Kurdistanê peyva `cil` tê bikar anîn. Kurdên li Anadolê dema mirov bêje cil hinekî jê şerm jî dikin û vê peyvê piranî jî bo cilên hespan bikar tînin. Lewra jî bo hespan gelt/telis/cer bi destan çêdikirin û davitin ser wan. Wek mînak, dibêjin: "Te hesp cil kirin?" Va yeka li alî Botanê dibe `cilik` û wek cilika bin kurtan tê bikar anîn. Peyva `cor` jî cilên ji bo hespan têne çêkirin, hatiye. Lê dibê ku ji `cer` jî hatiye. Cer, ji torbeyê bi ber an jî bi ser hespan re dixin re tê gotin. Heta dibê ku ji `cur` jî hatiye. Di vir de dixwazin ya cureyên cilan, ya jî cilên ji bo ajalên dest nîşan bikin. Peyva `berg` jî gerez jî liberxwe kirinê an jî ji bo kincên wek aksesûar bikar tên, hatibe.

Kincên Kurdên-li Xorasanê dijîn, hem di nava Kurdan de, hem jî di nava xorasanîyan de bi xwe cihê niqaşan e. Sedema niqaşan jî cudabûn, otantîkbûn an jî ji resentiya wan e. Cudabûn an jî balkêşiya wan didû-sê niqtan de derdikeve pêş:

1. **Xemlan (Alavên xemilandinê):** Di esas de ew şeweya xemilandina bi zêr, zîv, tas-kofi û hwd li her cihê Kurdistanê heye; lê bi demê re piranî wenda bûne. Ên Xorasanîyan hîna jî mane û ji ber wê bala xelkê zêde dikşîne û dibe cihê niqaşan. Bi vê yekê Kurdan girîngî dane jinê, xwestine zerefata wê derxin pêş û tiştê herî baş layiqî jinê dîtine.

2. **Fîstan:** Li Xorasanê du cure ne; yên kin û dirêj. Ên kin heta ser dîzan (qapoqan) tên, gor êlan reng tê guhertin û piraniya êlan vana li xwe dikin. Em vî awayî li bakûr (Serhedê) jî dibînin, ku ew êlana ji hevdu qetiyane. Navê wan ê giştî wek Celalî tê zanîn. Lê kincên dirêj bi rengê sor tenê li herêma Laîn/Layînê hene. Ew taybetmendiyek e...

3. **Rengê kincan:** Li Xorasanê piranî rengê sor bala mirov dikşîne, ku rabirdûyeke vî rengî ya dîrokî, olî û civakî heye.

Xorasanî du beş kincan bikar tînin:

**A. Kincên Laîn/Layîniyan:** Kincên laîniyan taybet in. Rengê wan bi piranî sor in. Bi mor, reş, rengên giran temam dikin û ew heta gwîzokê dirêj dibin. Bi temamî bi destan û jî îbrîşim tên hûnandin. Karekî pir zehmet û xerçekî giran e. Dema mirov li wan kincan, li çîn, pişkov û alavên xemilandinê ew bikar tînin mezê dike, asaletekê tê de dibîne. Dema min cara yekem ew dîtî, min ji xwe re got: `Gerez ew êl an jî kom ji malbatên mîr- mîrêmîran an jî rahîbên olî hatibin. Ew taybetmendî û fors dibe ku di qesrên mîran an jî di mabedên olî de hatibe afirandin û bi awayekî hişk heta roja îro hatiye parastin.



Kincên mêran jî, di jor re bi tamamî sor in. Xemlê zewaca mêr û jinan bi tamamî sor in (li wênê 5 an mêze kin), regekî din tê de naye dîtin. Girîngiya ku mirov bêje kincên sor ji parzînga dîrokî ya bawerî û şer hatine afirandin. Li ser kincên mêran mirov şîroveyeke wiha bike bawerim ne şaş e:

a. Ji bo bîr û hûmeta ji baweriya wan re ew reng girîng e. Di şer de ew hêsaniyekê diafrîne; mirov hevalê xwe ji dijmin zûtir cuda dike, ya pê re alîkariya wî ya jî di şer de hîn stratejîk tev digere... Va yeka di serdemên berê de pêk hatiye: Kalê van kurdan, an şervanên Şadiyan dema diçûne şer, rûyê xwe bi rengê sor boyax dikirin, ku rûyê wan di rengê cilan de be, dema birîndar dibûn moralê hevalên wan xirab, ên dijminan jî baş nebe. Bi vî awayî kincên gelek rihet û sade ne. Kirasekî fireh û sor; pişteke navê digire, şalekî fireh û stûbendeke pê xwîn an jî xwêdanê ziwa bike. Ji ser gwîzikan de heta bin textîkî jinû jî qûmaşekî panî bi çîn dipêçin û bi wî re jî "Pîtaw" tê gotin. Ew jî meşê rihet dike û derdavên mirov rastî astêngiyên mîna strî/dirî an tiştên din neyên. Kincên sûwariyekî an şervanekî ji wê baştir nabin.

b. Girîngiya rengê sor ê din jî, ew Kurdana, bi vî riyê naxwazîna dîroka (sersortî) xwe di bin êrîşên olî de ji bîr bibe. Bi vî awayî mirov dibîne ku rengê sor parçeyek ji jiyana Kurdên li Xorasanê ye. Di esas de ew hemî ê Kurdên sersor bûn lê Kurdên li Xorasanê baştir parastin e.

Li ser rengê sor ku pir balê dikşîne, hinek dîtinên cûda hene. Dibêjin: "Kurdên Xorasanê ew ji qazak an turkmenan girtine..." Lê rastiya wê dîtinê pir hindik e. Dema mirov li erdnîgariya wan êlên Kurd lê belav bûne dinêre, di cil û xalîçên wan de rengê sor serdest e. Parçê êlên li Xorasanê herî zêde li Dêrsim, navênda Anadol, Dîlok, Kobanî û Efrînê hene. Li vî xetê mêze bikin, herçî hinek guhartin pêk hatibin jî rengê sor pir derdikeve pêş. Li kum, kiras û xalîçên li Efrînê, li kincên elewiyên li Dêrsim-Sewasê mêze bikin, hemî rengê sor in. Tenê li navênda Anadolê guhertin çêbûne ku sedemên wê hene... Kurdên li ser wê erdnîgariya me dest nîşan kirî, ên dijîn ji kaniya baweriya Zerdûştî tîn û ew ê serdema herî dawî de jî bûne "Sersor". Ew sersortî piştê bi zimanê Tirkî bûyê "qizilbaş" û "elewî". Yanî dîrokeke cuda, baweriyeke cuda, jiyaneke civakiya cuda li pişt vî rengê sor heye. Herçiqes niha yên li Xorasanê bûne şîa jî, koka wê yekê heta Mazdekî, Hûremîtî, Safewiyan diçe ku babeta nivîseke dine... Bi vî dîroka dûr û dirêj re giredayî mirov dikare bibêje, ku heger "girtinek" hebe Qazak û Tirkmenan ji Kurdan girtiye.

**B. Kincên Êlên Din:** Mirovên girêdayê êlên din ên Kurdên li Xorasanê dijîn jî rengê sor pir bikar tînin, lê ne bi qasî Laîniyan. Mirov rengên cûda, di nava kincên wan de pir dibîne. Bi piranî ji kirasên sor û fîstanên rengîn (zer, spî, sor, şîrko û hwd), heta mirov bêje her êlek regekî xwe heye jî ne şaş e. Yek din jî, fîstanên wan wekî yên laîniyan ne dirêjin û dikarin ji qûmaşekî normal jî bîn dirûn. Ew ji çûxekî 30-35 metroyan dirêj tîn dirûn û pir giranin.



Wêne-1: K. Tewahuddî û kincên mêran.

Wêne-2: Kincên Laîniyan

Wêne-3: Kincên êlên din (Qeremanî)



Wêne-4: Kincên êlên din.



Wêne-5: Kincên Laîniyan ê dawetan û Pençek/palêrîn

Wekî min li jor jî got, Kurdên li navenda Anadolê, Efrîn, Dîlok, Dêrsim, Serhed û yên li Xorasanê jî heman êlên parçe bûyî ne... Lê di nava 433 salên ku ew ji hev qetiyane de guhartin di kinc, reng û folklorê de pêk hatine. Îro kinc û rengê sor li Anadolê bi temamî ji holê rabûne (wêne-6). Mînak: Êla Şêxîka ya li Efrînê kême, ya li Xorasanê û Sêwasê hîna jî rengê sor pir bikar tînin, lê yên li Anadolê qet bikar naynin. Sedema herî mezin ên li Anadolê misilmanbûn ya sunîbûn e. Dijîtiya wê baweriyê ya rengê sor û çewisandinên der dorê bandorê li kincan dike. Dora te heger bi tirkên sunî hatibe pêçan û ji bo baweriyê Sersortiyê bi sedan derew, reşkirin û xirabî hatibin belav kirin, zahmet e ku mirov wî rengî biparêze. Sunî rengê kesk tercîh dikin, lê ew jî di nava van Kurdan de bi pêş neket. Li ser wê babetê Mehrad R. Îzady wiha dinivîsî: "8000 salan berê jî ew rengî û bandora rengên xwezayê li ser cilên Kurdan hebû. Kurdên li Xorasanê dijîn, kincên ji berê de di nava Kurdan de wenda bûyî, hîna jî diparêz in (Kurtler, rpl: 443). Heger ew guhartinên (ol) li bakûr nebûyana, îro cilên rengî me yê li bakûr jî bidîtana (Kurtler, rpl: 39)." Ew dîtin bi temamî rast e.

Ew guhartina di forma cilan de pêkhatî jî pir balkêş e. Hema êlên ji hev qetiyane de di nava 433 salan de cilên xwe jî guhartine. Ên li Anadolê berî 50 salan bikar dihatin, dişibin ên laîniyan, lê cihewazî di navbera wan de jî hene. Ên li Anadolê jî heta gwîzikê dirêj dibin, lê derpêkiras di bin de tê lixwekirin. Ew li Xorasanê gore ne. Hebe jî xuya nake. Xorasanî jî fîstanê dirêj re dibêjin; "Paçakiras" Kurdên Anadolê zebûn/xeftanê sêşeqî li xwe dikirin û bervang/peşmal didan ber xwe.

Li Xorasanê niha û di serdemên berê de li Kurdistanê de jin û kincên wan bi zêr û zîvan hatine xemilandin. Bi wê yekê girîngî dane jin, zerafet û nazîkbûna wê. Hema hema di hemî kincên jinê de mirov pûlên zêr, zîv an jî yên bi madenî dibîne. Xorasanî jî serkiras re dibêjin "Cîlisqê" (wênê 8 an) û ew bi pûlan hatiye xemilandin.



Wêne-6: Kincên li Anadolê  
Wêne-7: Kincê Dirav (jor)  
Silsilê-Kûmê bi dirav û kiras



8- Cilisqê

9-a: Qaquran-Qapquran

9-b: Qaquran-Qapquran

Dîsa jin bazbandekê didin ser baskên xwe. Navê yê ji madên hatî çêkirin "Qaquran-Qapquran" e (Wênê 9-a û b) lê yên ji rîs hatî hûnandin me nav peyda nekir. Dibe ku hema nav be. Ew jî dide xûyakirin ku Kurdan çi girîngî dane jin, zerafet û fodilbûna

10- Kiras

11- Kevne û kemerbend

12- Midaxilên ser şilwar

13- Kevna keşmîrî

14- Kevna Tawusî

15- ?

16- Çengê

# DE WAYÊ ( WEY DIL)

**Deşîfrasyona Gotinen Kilamê:**

Mezher AKTAŞ, Remezan TEKÎN

**Deşîfrasyona Notayên Kilamê:**

Necdet ERDAĞ

**Herêm:**

Mûş/Serhed

**Çavkanî:**

Şakiro(Qeyda Qasetê)

**Dem:**

04.04.2014

Mîro mîro mîro mîro mîro mîro mîro mîro  
Wey dil Wey dil Wey dil Wey dil Wey dil Wey dil Wey dil  
Lo Rebiyo xwedê xirab bike dilê bê dil, fenanî gakî bê werisî bê cil  
Fenanî kirasî qolî bê mil, fena dara bê şalûl û bê bilbil, fenanî xasbaxçekî rûtî bê gul  
Bila dilê rezîl bi dil be, tûrê parsê li mil be, parsa meriv li vir ne be,  
Nava dozdeh duwalê ecnebî, Ûrisan li mala Emerîkanê gêwir be  
Parsa meriv birije, tûrê meriva ê qul be, meriv li ber dîwarê evdala,  
Xwedê meriv kerî nanê garis û cê di gilgil be  
Ber seriya meriv kevir be, malxirabo ser axa meriv gwînî be, bin axa meriv postê jûjî be,  
Ber seriyê meriv kevir be...  
Tek bila dêrisê gundan da, dilê rezîl bi dil be, ax dilo hey dil

Mîro sibe ye Dêrsim e xweş Dêrsim e  
Wanê çeman û kaniya bi ser me da kalekal e, zarezar e jê di gimegim e.  
Vê terezê, terezbavê bi awirê çava, bi çinyatê dila bi îşaretê desta  
Ez kuştîme.  
Ez ê ji Dêrsima jêrîn, çûme Dêrsima jorîn.  
Min dî sê zerî bi serê rêka min runiştine.  
Yeke kurmanc e, yeke ecem e, yeke  
Ez a bi sira sibê ra çûme li cem yandajê di tirk e  
Mi dî yek e bejin zirav e, çav bi kil e, bisk bi têt e.  
Çepil dirêj e, por kej e, nav qendîl e.  
Gerden zer e, cotek qonderê Entabê çar tiliya bilind e  
Ser îşk e bayê sibê ber min ra tere têt derbaz dibe difirike  
Min ê destê xwe avêtî nava reşguliya  
Di ser xwe da dewandî  
Dikim ramîsanekê li dev û lêvê şekirîn, yanaxê li ehmedî li terzê di hakimî,  
Şemlê di erebî xal û xetê di gerdenê,  
Xepxepkê ber guharan lê kerem kim.  
Gelî hevalno hogirno çî gawir in.  
Min çî ji vê terez û terezbavê ra gotiye  
Bi ser min da xeyal û xem e, kîn û rik e wey dil.  
Wey dil wey dil wey dil wey dil wey dil dilo hey dil  
Ax lê lê erebê bi sira sibê ra bîna bayê kur û bayê şerq, bayê xerb,  
Çep û rast me têt gimî ne.

► Berhevkar:  
Fadil BOTAN

Ez ê diçûme li cem yandajê di ecem e,  
 Min dî yek e bejin zirav e, çepil dirêj e, por kej e,  
 Nav qendîl e, gerden zer e.  
 Fenanî doxtorekî dewletê ji wê da tê.  
 Çentekî dêst dane,  
 Qutiya xeyal û xeman, keder û mereqan derd û kulan tev li cem e.  
 Bê zalimê tu nizanî gelo vê sibengê Ferîdê radibû  
 Ser min da kal e kal e û jê di lim e lim e.  
 Heft salê min tamam e,  
 Ez ê hêsîr û ewdalê li derê mala bavê te me.  
 Gelo vê sibengê min ê destê xwe avêtî nava reşguliya,  
 Bi ser xwe da dewandî,  
 Dikim ramîsanekî li dêmê gulî yanaxê ehmedî, li terzê di hakimî  
 Şemlê di erebî lê kerem kim.  
 Lê erebê nizamim, min çî ji vê terez û terezbavê ra gotiye  
 Bi ser min da xeyal vê sibengê,  
 Bi derd û kul, bi xeyal jê di xem e wey dil ax wey dil dilo hey dil.  
 Xwedê xirab bike dilî bê dil, fenanî gakî bê werisî bê cil  
 Fenanî dara bê şalûl û bê bilbil, fenanî xasbaxçekî rûtî bê gul  
 Bila dilê rezîl bi dil be, turê parsê li mil be, parsa meriv li vir nebe  
 Nava dozdeh duwalê ecnebî, Ūrisan li mala Emerîkanê gêwir be.  
 Parsa meriv birije, tûrê meriva ê qûl be, meriv li ber dîwarê evda be  
 Seraxa meriv gwînî be, binaxa me meriv postê jûjî be.  
 Berseriya meriv kevir be, dêrisê gunda da  
 Tek bila dilê rezîl bi dil be ax dilo hey dil.

De lê lê erebê sibe ye bi sira sibê ra bîna bayê kur û bayê şerq, bayê xerb,  
 Çep û rast tê gimî ne.  
 Ez ê çûme li cem yandamê kurmanç e,  
 Min dî yek e bejin zirav e, çav bi kil e, bisk bi têt e.  
 Çepil dirêj e, por kej e, nav qendîl e,  
 Gerden zer e, gelo vê sibengê, kotî kêl e.  
 Erebe qorî zêranî li sêrî gopalekî zîvînî dêst da ba  
 Lê şevkonî erebî sekinî, kerîpezê qerqaş bi ser komê xanima  
 Li zeviya da dida bêrî.  
 Min ê mala xwe xirab kiriye, ocaxê xwe kor kiriye  
 Kilîteke li derê xwe xistiye, derê xwe bi heft kilîta mor kiriye  
 Min ê jê nepirsî, mi go erebê gelo tu ezeb î yan bi mêt î?  
 Go kuro bêbexto, bêbextiya meke.  
 Tu nizanî min di go qey tu mêtî, tu camêtî, min di go kotiyê mêtan ne li mal e,  
 Tu yê şeva îşev bişkênî cam û camekana şûşe û penceran, zirza dêrî  
 şeva xwe nava taxima sîng û berê min esmerê da bibihêrî  
 Min nizanîbû tu ne mêtî, ne camêtî, tu ji miskînî heramî mêtî min newêtî  
 Tu nizanî ez ê ne ezeb im, ne bi mêt im  
 Ka melê gunda da ez ê bi kaxit û bi nivîşt im, bi sêhr im  
 Tu deynê xwe bidî vê sibengê ez dikim herime  
 Lawikê min bû girtiyê taşxana Diyarbekir  
 Ez ê vê sibengê dikim herim dîtina xelkê xwe yê têtî delalî, şebabî, potê  
 Gelo vê sibengê, malxirabo ji tirsê heramê miskînê mêtî xwe newêrim  
 Ez ê vê sibengê, malxirabo berdilka erebî reşî lêtî deqandî,  
 Xîmê binê beriya tewr a jêr im  
 Hey dil hey dil hey dil ax hey dil hey dil dilo hey dil

Xwedê xirab bike dilî bê dil, fenanî gakî bê werisî bê cil  
Fenanî kirasî qolî bê mil, fena dara bê şalûl û bê bilbil, fenanî xasbexçekî rûtî bê gul  
Bila dilê rezîl-bi dil be, tûrê parsê li mil be, parsî meriv li vir ne be,  
Nava dozdeh duwalê ecnebî, Êrisan li mala Emerîkanê gêwir be  
Parsî meriv birije, tûrê meriva ê qûl be, meriv li ber dîwarê evda be,  
Seraxa meriv gunî be binaxa me meriv postê jûjî be.  
Berseriya meriv kevir be, dêrisê gunda da  
Tek bila dilê rezîl bi dil be ax dilo hey dil.

De lê lê erebê sibe ye bi sira sibê ra bîna bayê kur û bayê şerq, bayê xerb,  
Çep û rast tê gimî ne.  
Ez ê çûme li cem yandamê kurmanc e,  
Min dî yek e bejin zirav e, çav bi kil e, bisk bi têt e.  
Çepil dirêj e, por kej e, nav qendîl e,  
Gerden zer e, gelo vê sibengê, kotî kêl e.  
Erebê qorî zêranî li sêrî gopalekî zîvînê dêst da ba  
Lê şevkonî erebî sekinî, kerîpezê qerqaş bi ser komê xanima  
Li zeviya da dida bêrî.  
Min ê mala xwe xirab kiriye, ocaxê xwe kor kiriye  
Kilîteke li derê xwe xistiye, derê xwe bi heft kilîta mor kiriye  
Min ê jê nepirsî, mi go erebê gelo tu ezeb î yan bi mêt î?  
Go kuro bêbexto, bêbextiya meke.  
Tu nizanî min di go qey tu mêtî, tu camêtî, min di go kotiyê mêtan ne li mal e,  
Tu yê şeva îşev bişkênî cam û camekana şûşe û penceran, zirza dêrî  
şeva xwe nava taxîma sîng û berê min esmerê da bibihêrî  
Min nizanîbû tu ne mêtî, ne camêtî, tu ji miskînî heramî mêtê min newêrî  
Tu nizanî ez ê ne ezeb im, ne bi mêt im  
Ka melê gunda da ez ê bi kaxit û bi nivîşt im, bi sêhr im  
Tu deynê xwe bidî vê sibengê ez dikim herime  
Lawikê min bû girtiyê taşxana Diyarbekir  
Ez ê vê sibengê dikim herim dîtina xelkê xwe yê têtî delalî, şebabî, potê  
Gelo vê sibengê, malxirabo ji tirsî heramê miskînê mêtê xwe newêrim  
Ez ê vê sibengê, malxirabo berdika erebî reşî lêt deqandî,  
Ximê binê beriya tewr a jêr im  
Hey dil hey dil hey dil ax hey dil hey dil dilo hey dil  
Xwedê xirab bike dilî bê dil, fenanî gakî bê werisî bê cil  
Fenanî kirasî qolî bê mil, fena dara bê şalûl û bê bilbil, fenanî xasbexçekî rûtî bê gul  
Bila dilê rezîl bi dil be, tûrê parsê li mil be, parsî meriv li vir ne be,  
Nava dozdeh duwalê ecnebî, Êrisan li mala Emerîkanê gêwir be  
Parsî meriv birije, tûrê meriva ê qûl be, meriv li ber dîwarê evda be,  
Seraxa meriv gunî be binaxa me meriv postê jûjî be.  
Berseriya meriv kevir be, dêrisê gunda da  
Tek bila dilê rezîl bi dil be ax dilo hey dil.  
Wey dil wey dil wey dil dilo hey dil...

# DE WAYÊ (WEY DIL)

mi ro mi ro mi ro mi ro mi ro mi ro mi ro mi ro

way di | way dil way di | way dil way dil way dil way dil

lo re bi yo xwe de xi rab bi ke di lé bé dil fe na ni ga ki bé we ri si bé cil

fe na ni ki ra si qo li bé mil fe nan da ra bé sa lûl û bé

bil bil fe na ni xa s hex çe ki rû ri bé gul


bi la di lé re zil bi dil be tû ré par sé li mil be par sa me riv

li vir ne be na va daz deh de va lé ec ne bi u ri san li mala eue ri kavé ge wir be pa sa

me riv bi ri je tû ré me ri vaé gulbe me riv li ber di va ré ev da be xwe di me riv

ke ri ua né ga ris û cé di gil gil be bor ser yé me riv ke virbe mal xira bo ser re xa

me riv gu ni be bin re xame riv pos ré jû di be ber serî ya me riv haks vir be



Arêkerdoxe:  
Surya HÛMAN

# ŞAMÎ (WERD)

## KEŞKERÛN

Ma payîzî masto tirş denê harê û ma awe ey tera gurtêni kêni qalind.

Ma her roj soli kêne mastî ro semedo ke awe biko serê mastî û ma awe mastî ra bigrê û mast bibo qalind.

Ma her roj awe mastî ra gêne mast beno qalind awe ey qedêna; ma enhew mastoke ma awe ey tera gurte ma ey mastî bêni kêni lêyon û ma gîrnêni û ma genim zî beni pê hewen qûyenê û ma kêni kerqût.

**Kerkût:** Hewo ke hewen de pê dingî yeno kuyayîş te ra vanê kerkût. Kurmacî dingî ra vanê mîrqût. Hewo ke ameyo kuyayîş ma ey hewê xo lêyêko pîl de pojenê hew pêşeno, en hew ma hewê xo serê adir ra nanê ro beno serdîn û beno qalind.

Ma bacî hewê xo yo pêşaye kêni ser seynîyan û ma kenê êmare, pê kardî kêni dîlim dîlimî, dîlimî îna tenikî, meşrefê sipêyan ser bonona kenê ra û a keşkerûnê xo pêro kenê serê ay meşrefanê sipêyan û ma ver tîje de çend rojan visnenê ra û kêni wişk. Qasê heftêke di heftê ser banî ya manenê, ma ina şîl şîl xo zê rêzê rêze nanê têver ma kêni ser boxçanê sipêyan, ay boxçe sipê zi vercî tera vatenê homerî, ma eka tera vanê meşrefe ay çax tera vatêni homerî ay meşrefê sipê pirç nêgurtêni. Hew ser nê meşrefan de bîne wişk bîne zê kerra, ba'd pê no hewoke ma kebi dîlim dîlimî û kebi wişk ma ey dîlimî xo yê wişkî kêni zere torî, torê inan zî potînî bî. Ma torê xo kêni pirre û ma binê banî şa gîredêni. Wexta bîni zimistan hewê xo ko ma kerdibi wişk ma no hewê xo gorey nifûsê xo kêni moni awe û ma gîrnêni wexta hew bîni nerm û masto ke ma awe ey tera gurtibi ma hewê xo mast têdir gîrnêni bîni zê mehîre û ma zimistanî werdêni.



## ESÎDE

Gorey waştîşî ya. Kam biwazo eş-keno esîdê xo difsî ra ya zî şeker ra virazo. Ma difsî ra viraştêni. Ewîlî ma difsê xo gîrnêni. Ma ardanê xo danê êleke ro û vênê.

Ma difsê xo nanê ser adir ya û ma difsê biney kenê şîrgerm.


Ma hîdî hîdî ardanê xo kenê miyanê difsî û ma hîdî hîdî têdanê têdanê, ma îna nêkeri ardan miyanê difsî de beno çîlê.

Wexta ardan û difs timyan de şepiyayîş benê qalindî pêşeni û ma hênda neni ro.

Ma zere esîde kenê sey çale ma rûnî xo yê keyî kenê tawa ma hel-nenê û ma kêne zerê çalike esîde rûnê ma çale de beno gole, verçî kûçikê asnîni çînbê, ma pê kûçikanê darinan heme şamê xo werdêni, kûçikanê darinan yan zî pê kûçikanê asnînan ma esîdê xo wenê.

Çîme: Fîkrîye HÛMAN (43)  
Herem: Qurmik/ LICÊ

# ÇİROKÊN NAVLÊKAN (6)



Mem Mukriyani

## Qoço

Li gor gotinê, dema Qoço ji dîya xwe dibe li gor zarokên nû xwedê dayî gellekî xurt û qelew e. Bil-hassa serê wî li gor gewdeyê wî pirr mezin bûye. Roja ku xwedê ew daye di kêlîya welidandinê de ca(dê) wî pirr jê dikşîne. Qîrînek li erd yek li ezman bûye. Pîştî welidandinê ca wî ji xwe dere û wê radikî bajêr ku bibin dixtor. Pîreka ku pîrîktîya wî kirîye jî rebenê di wê germê de gava wî dikşîne ku jinikê ji wî halî xelas bike ji ber giranî û qelewîya Qoço, pîyê(mil) wê ji cî derdikeve. Wê jî dibin bal hekîmê kurmançî ji bo ku pîyê wê têxin cî.

Qoçoyê me roj bi roj mezin dibe, li xwe zêde dike lê kê nake. Weke dermaleyekî qelew û dohgirtî dikeve çav. Li ser zar û zimanan e. Herkes lê heyîrî ma ye, her yek ji xwe tiştêkî dibêje derbarê wî de. Digihê 5- 6 salîya xwe êdî xwe bera nav zarok û hevalan dide. Ewîlî tev jê ditirsîn û xwe jê vedigrin. Jixwe gava çav li qelefetê wî dikin mûyên wan dibin mîna singan. Hêdî hêdî dielimin wî. Herwiha ew jî kedî dibe, bi wan dilîze, radibe û rûdinê. Rojek du roj sê roj mehek du meh ew zarok dinêrin ku qelefet he ye emel tune ye. Lawikekî jar e. Îcar ew lê dibin agir. Roj bi roj rû jê digrin û wî li ser tilîya xwe direqisînin. Hingî serî mezin e ewîlî tev jê re dibêjin:

- Tu beran î, mîna berana yî, quloçên te kê nake in. Welleh tu beran, heta cowange jî nikarin bi wî serîyî. Pesnê wî didin, didin bin çengê wî. Wî dinepîxînin, serî lê mezin dibe. Her roj bêtir bi xwe bawer dibe û gotinên hevalên wî dikevin serê wî. Her ku ew pesnê wî didin ew diguripe. Zarokan baş jê fê m kiribû edî. Berî wî bidîna çî nabûn tunebû.

Rojekê jê re dibêjin ka em bi qoçan bilîzîn. Dor bi dor em ê bi hev re bilîzîn kê çîz kir ew derdikeve. Lê hemî zarok çavên wan lê ye ku Qoço têxin lîstîkê û ji xwe pê bikenin. Dor tê Qoçê, hemî xwe ji ber didin alî. Qoço jî serî lê diwerime û dike qebeqeb. Dibêje:

- Kî mêr e û bi xwe bawer e bila derkeve meydanê!

Deng ji kesî nayê. Ji qesten, bi zanebûn wî dixin dahfikê ku lîstîk xweş bibe. Tev bi ser wî dilîzîn. Talîyê hevalekî wan î serhişk dibêje:

- Were ez û tu bilîzîn. Lê ji ber ku serê te mezin û gir e, ez ê fanûrîyê xwe têxim ber serê xwe, yan na tê serê min bişkî.

Wî şertî jî qebûl dike û enîya xwe didin hev. Weke berana bi qoçan derin hev. Ga deqa deqa li enîya hev dixin, ga jî li kêlekê dêtînin hev. Talîyê ye ku li ber Qoço rabûbû çîz dike. Ji qesen dere destê wî maç dike û dibêje:

- Ji te xurttir, mêrtir kes tune ye. Ez nema li ber te radibim. Min şûya xwe xwar. Kî mêr e aha bila kerem bike.

Bi van fen û fût û dek û dolaban hevalên wî nîgê wî ji ber dibin. Ew xwe bi xwe dibêje:

- Tayên min tune ne. Kes nikare bi min. De werin haaa... De werinnn...

Weke dikê qoço, Qoço serê xwe bilind, stuyê xwe dirêj dike û halana di xwe dide. Hevalên wî dinêrin ku hevsarê wî nema tê girtin, serî pê dernaxin. Yek ji wan jê re dibêje:

- Qoço!

- Dibê ha!

- Dibê me fê m kir ku însan kes bi qoçan nikare bi te. Lê ez dibêjim tu dikarî bi beranan jî bi qoçan bilîzî?

- .....

Destê xwe bilind dike û kefa destê xwe ber bi Qoço dibe û mîna ku berana li şer sor bike dibêje

- Dirrrr... dirrrrr... dirrrr.. Qoço dirrrr...

Bi wî hawî Qoço bi serîyan dere destê wî. Qoçan li kefa destê wî dixê û lê vedigerîne.

- Ez dikarim bi beranan jî. Ma serê beranan bi qasî serê min mezin jî nabe û saxlem jî nabe.

Çendek di navderê derbas dibe Qoço û hevalên xwe bi hev re derin nav colê pêz. Li wir dibeze beranan jî. Bi qoçan ew û beranên kol yê bê qiloç tê şerr dikin. Xisarê nabîne û jê diserife. Bêtir serî lê sor dibe. Êdî di çavên xwe de xwe weke hûtekî ditît. Berî wî bidana kû, bidan çî û bidana kê serserîkî diçû. Nabûn tune bû.

Rojekê mualimek tê gundê wan. Yekî tirk e. Çend mehan lê dimîne pê ve ew û gundîyan hev baş nas dikin. Lê nakeve serê gundîyan. Zarok mizawirîyan dikin û Qoço lê sor dikin. Jixwe ji ber ku Qoço nedîçû mektebê mualim ew nas nedikir. Yek ji qoço re dibêje:

- Lawo qoço welleh tu jî dizanî ku serê vî mualimî çiqas hişk e. Ne em û ne tu kes em jê hez nakin. Hema here Qoçekî li enîya wî jî bixe û serê me tevan jê rehet bike. Ma ku ne tu bî dê kî me ji vîya xelas bike?

Qoçê dibêje:

- Ma vîya çi ye? Peltê ye. Temam.

Rojekê dahnê êvarê keysa Qoço lê tê. Xwe mîna dîkê elokan diguripîne û ji nişkan ve weke beranekî ku xwîn ketibe çavan li der û dora mualim û yên derdorê lotikan dide. Hema di carekê de dibêje:

- Dirrrrrr....

Û bi ser mualim dere. Dere dere û dibê diringgggggg... Qoçekî li textika enîya mualim dixê, mualim li erdê dike tejanê. Ji xwe dere. Serî lê dike weke nepoxê. Wî radikin dibin dixtor.

Çend roj di pey re leşker tîn gund. Muxtar wan diezibîne. Wan bi xwarin û vexwarin dike û derdikevin li nava gund digerin. Dîsa zarokên hevalê wî pesnê wî didin, vê carê wî bi ser qomitan dişînin. Kêlîya ku li ber derî çayê vedixwin bi xezeb mîna cowangekî bitir, di deqqeya ku çayê di destê qomitan de ye qoçekî li textika enîya qomitan dixê, qomitan li ser piştê dikeve xwarê. Leşkerêkî ku qomitan dihefand hema bi çeplê Qoço digre û wî davêje. Qomitan piştî ku bi ser hişê xwe ve tê radibe û dikeve ser wî. Wî nihayî dike, ji halekî dixê halekî din. Piştî vê qewimînê hişê Qoço çelq dibe, serê wî didewibe, parxwanên wî dişkên û ji hişê xwe dibe. Fêm û bîra xwe wenda dike, tu tiştê nema tê bîra wî. Dibe mîna kevirekî li nav erdekî beyar. Bê zar û bê lebat, ne kar û ne xebat.

## Palebenco



Dewra berê gava yekî/ê erz û eyarê xwe diçand, hisabê çinîna çandinîyan û debrê jî dikir. Palehî û çinîna tene bes bi das û tarê û bi qeweta pîyan a paleyan bû. Yekî/ê ku paleyên wî/ê tune bûna halê wan yeman bû. Yên ku pale û tifaqa wan hebûna palûte radikir. Her ji malekê yek du kes paleyê palûtê bûn. Ew palûteya ku pî didan ber hevdu biavêta ser kîjan erdî rojekê di ber xwe de nedida. Giraniya palûtê li gor giraniya debrê bû. Heke erdên hatibin çandinîyê zêdebin palûte jî giran dibe. Wekî din jî kî biçûna cem kê pale bixwasta texsîr nedikirin. Jixwe pale bi pale bû. Yên ku debra wan tunebûna bi ribêkekê paletîya xwedîyê çandinîyan dikirin.

Qey ciwamêrek payizî çandinîyên xwe dike. Zivistan derbas dibe, bihar tê, bihar dibihure havîn tê. Ev ciwamêrê ku navê wî Elîko bûye, sal bi xweşî di ser re derbas nabe. Gellek bela û nisûbetî tên serê wî. Zar û zêçên wî yên gihîştî bêhemd hemî belawela dibin. Bes loqo û doqo ango Elîko û pîreka xwe Hesîna dimînîn li rastê. Nîr li nîr diqede. Di wî nîrê debrê, kelekela havînê de dest û nigî wî dikevin hev. Zarok kes li dorê nemaye. Ew û pîreka xwe jî ber ewqas kar nagihîjin. Heta payiza dawîn jî bi ser hev nikarin bînin. Difirkirin, diqilqilin, xwe vir de didin xwe wir de didin, dikin nakin tu rêyê tê de nabînin. Halê wan î di hîşê wan de bûye ku hesk û çöçik tê nagere. Ji ber ku nîr nîrê debrê û hîlanîne ye herkes bi kar û barê xwe daketîye. Ên ku paleyên vala dibînin kumê xwe diavêjin ezmên.

Elîko, derî namîne ku lê naxê, mal tune ye ku alîkarîyê ji wan nexwaze, lê bê fêde ye. Pale bûne efyon. Taliya taî li gundekî cîranê wan malbateke ku debara xwe bi kar û barê xelkê dikin top dike. Dere wan qanîh dike, li hev dikin û tîne wan bera nav berê palehîyê dide. Elîko hemî çandinîyên xwe bi qibaleyî dide malîkê. Malik dibêje:

- Apê Elîko tu jî zanî ku mala me dûr e. Bi çûyîn û hatinê em ê pîrr bibetilin û emel ji ber me nare. Bila haya te jê he be û bi destûra te be, heke tu aciz nebî em ê li ser erd bimînîn, heta ku em palehîyên xwe xelas dikin.

Apê Elîko dibêje:

- Apo qurban!!! Ser serê min û ser çavê min. Hûn çawa dixwazin bi ya dilê xwe bikin.

Di pey vê lihevkerinê, paleyên Apê Elîko yên ku sermîyanîya wan û serpaletîya wan bavê wan Etman dike, dikişên ber berê palehîyê. Dibe xurmîna wan. Etman û neh zarokên wî yên ku pê re ne, gurzên ceh û genim li hev ba didin, melû bi ser melûyan, rewake bi ser rewakeyan û gidîş bi ser gidîşan diqelbînin. Li ber wê tava kelekela havînê xwêdan ji enîya wan diherike, bêhn li wan diçike. Kêlîya ku av digihê ber destê wan şerbîkê cilikkirî bi ser gewrîya xwe dadikin, qurtinîyê ji avê tinîn. Carna jê, ji germa pilqînî bi xwînê dikeve, weke tu ga serjê bikî miskarê xwînê di pozê wan de derb dibe û ji qudûm dikevin. Lê bi xîretin. Sekin lî wan tune ye. Wextê kar e. Ku wan van du sê mehan ji xwe re tiştek dan ser hev dan ser hev, nedan ser hev kûçik bi halên wan namîze. Etman û zarokên xwe mîl dane hevdu, bi şev roj lêdixin dikin nakin emel ji ber nare. Sal bi şîlî bû û Apê Elîko çandinîyên xwe baş xizmet kiribûn. Tene bejekê bilind bûye, têra xwe himbiz e û erdekî mikepire. Roj li wan dere ava. Pîreka Etman li nava sapê genim, li ber gidîşa qerase ku bi qasî xanîyekî bilind kirine tifika xwe dadide û xwedê çî qismet kiribe dabû ser êgir. Şîva wan hazir dibe tîne şîva xwe dixwin, bîstîkê bêhva xwe vekin û pîştî behvekirinê dibêjin ka em ê berekî dinê biçînin. Radibin berekî berê wî fireh didin ber xwe. Bi klam û stran, çîrok û meselok teqlê li berê xwe dixin berê xwe dibin serî. Etman ji zarokên xwe re dibêje:

- Hûn herin bêhna xwe vekin, razên. Hûn bihemd betilîn. Zû rakevin ji bo ku hûn di hênkayîya sibêhê de zû rebin emelê xwe bavêjin.

Ji pîreka xwe re jî dibêje:

- Qe Hurmê bi xêra gora bavê xwe ji min re çayekê bi ser de û here ji xwe re rakeve. Ez ê demê bavêjimê. Ez zanim tu pîrr betilîyî, ji dest û pîyan ketîyî.

Pîreka wî ya ku dest û nigê wê nema tîne ber, bi dengêkî nizm dibê "temam' û bi halekî sisto misto xwe digihîne ber tifika êgir. Avê dide ser tîfikê, êgir xweş dike û hema di cî de serê xwe datîne. Ji xwe dereeeee.

Qederê du cixaran derbas dibe, Etman ji ber berê palehîyê dide rê tê ber tifikê ku çayê bavêje. Di wê taritîyê de li nava firaqan li demê digere. Rebeno hema bi destlepokê destê xwe dipalêne. Heta ku lê rast bê. Kîsikekî devgirêdayî dikeve destê wî. Dibê he ye tu ne ye dem ev e. Bi destan sax dike, he erê, çayê ye. Hema kulma xwe tê dadike û bera hindurê çaydank dide. Bîstikekê li ber tifikê rûdinê, cixareyekê dipêçe dikişîne û bêhna xwe vedike heta ku çaya wî dem digre.

Piştî cixara xwe qedand û vemirand, qedeha xwe ya bi qasî birkekê mezin bi çaya qaçax dadigre û berê xwe dide ber berê palehîyê. Him vedixwe him di ber xwe de dinêwirêne û him jî palehîya xwe dike. Etman, ji betlandina tahm di devê wî de nema ye bê çî vedixwe. Qedeha wî diqede yek din dadigre, ew diqede yek din dadigre heta ku binê çaydank derdikeve, zûya dike.

Di pey vexwarina wê çayê Etman dibe mîna perr. Sivik dibe, xew lê di herime û navê betlandinê çî ye pê re namîne. Ji ber berê palehîyê nema radibe. Berekî dibe serî dîsa lê vedigere. Û yekî din yekî din, yekî din..... Heta ku roj lê hiltê. Zarok û pîreka wî li xwe şîyar dibin ku bavê wan hîna palehîyê dike. Lê ew dibêjin qey razayê û berî me şîyar bûye. Lê bala xwe didinê ku erd ji hev tîş tîşî kirîye. Pişt li erd şikandîye û hîna jî palehîyê dike. Bê hemd bi fedakarîya bavê xwe kêfxweş dibin. Hema firik av li rûyê xwe dikin nakin berê xwe didin cem bavê xwe ber serê ber. Lê çavên wan çûye nav serê wan. Bifikarin. Jê dipirsin:

- Yabo ma qey tu qet raneketî? Ev hinekan hat alî te kirin û çûn? Yan jî te benc xwarîye?

- Na welleh lawê min ! Hema xewa min nehat û ez jî çûm û hatim. Min got ez çî bikim ji ber me derdikeve.

Bi rûyê ken kêfxweşîya xwe bi bavê xwe re par ve dikin û xwe didin kêleka bavê xwe heta ku dîya wan ji wan re taştê çêdike. Gava ku dîya wan radihêje çaydankê çayê ku vala bike û çayeke nû dem bike, li hindurê çaydank dinire ku a di hidurê çaydank de ne çayê ye. Baş bala xwe didê dinihêre ku pelên wê zirav mîna rêşîyên garis, avda porr e. Tahm dike ku ew ne çayê ye. Di nava diranê xwe de dicû fêhm dike ku ew tûtine ya ku di hindurê çaydank de ye. Di cî de sar dibe. Li kêlekê dirijîne ji bo ku rê Etman û zarokan bide. Bê bavê wan çî kirîye.

Tê ku taştê bixwin , pîreka Etman jê re dibêje:

- Ma malnexerabo! Ka tu zanî ku te îşev çî kirîye? Ji êvara Rebê Alemê de te di şûna çayê de tûnin vexwarîye. Way xwedê te stirandîye ku tu fillitîyî! Ma te çawa tûtin avêtîyê çaydank belengazo!

Etman û zarok tev şaş dibin. Fêhm dikin emelê ku bavê wan Etman evêtîye emelê tûtinê ye. her ku tûtin vexwarîye canê wî tevizîye, ew pûç kirîye. Betlandin û xew mew tu tiştekan lê nemaye. Weke benc ku xwarîbe êş mêş tu tiştekan hîs nekirîye.

Zarokên wî jê re dibêjin:

- Yabo welleh ev ne hunerên tûtin mûtinê ne. Ev huner hunerên bencê ne. Ku ne benc be, vî canê ku ji şefeqê de nesekinîye çawa nebetilîye û neêşîyaye?

Ev mesele bi vî hawê xwe li derdorê belav dibe. Herkes pê dihesê. Gava qal bê ser Etman, dibêjin:

- Vîya bi şev tûtinê dikê çayê û vedixwe ji bo ku xewa wî neyê.

Di pey re jî dibêjin:

- Na looo!!! Welleh vîya benc xwarîye. Ev pale ku ne bi bencê be vî emelî navêje.

Ji Etmanê ku piştî wî latekê pahn û sînga wî weke defekê bû, Palebenko tê gotin u lê dimîne.

### **Nîşe:**

**Benc:** Cûreyek giha ye. Dibêjin kî bixwe pê din dibe. Gava tê xwarin jî bi qasî êşbirekê êşê dibire. Li başûrê Kurdîstanê di şûna narqozê de benc tê gotin.

# BAWERIYÊN GEL<sup>1</sup>



Berhevkar:  
Bahoz Baran




1. Wextê ku darikê çayê bi ser îskana çayê bikeve, dibêjin mêvanê me he ye. Li gor qalindbûn û ziravbûna wê jî dişîbînin hin merivên xwe.
2. Kefa destê yekî bixure, heger destê rastê be, dibêje ji min ra pere tên, heger destê çepê be, dibêje pere diçin.
3. Dibêjin piştê stûyê zarokan maçî mekin hûn ê ji hevdu bixeyîdin.
4. Dema ku du kes şerr dikin û yek bixwaze şerrê wan gurr bibe şimika xwe bi singalê va bi dar da dike.
5. Dema ku yek sabûnê dide yekî din, ê din sabûnê bi piştê destê xwe jê distîne ku dilê wan ji hev nemîne.
6. Êvaran dema ku benîşt tê cûtin dibêjin, goştê miriyan e.
7. Dema ku hinek difikînin, dibêjin wisa nekin hûn gazî şeytên dikin.
8. Dema ku şimik biqelibe, guneh e, dibêjin rast bikin. şeytan li ser nimêj dike.
9. Sol dema ku dikevin ser hev, kîjan li ser be, li berê wê dinêrin û dibêjin, rêya te bi wir va ye.
10. Dema ku yek hevîr bike û ji bîr bike xwê bi-avêjê û nanê xwe sor bike dibêje, îro Xocê Xizir hatiye mala me, me xwêya xwe daye wî loma wisa bûye.
11. Dibêjin, êvaran niqira bitenî ne ji cîranan bistînin ne jî bidin wan.
12. Dibêjin, êvaran bêjîngê ji cîranan mestînin û medînan wan.
13. Hevîr ji teştê bipeke dibêjin mêvanên me he ne.
14. Ava germ li erdê nakin, dibêjin cin û zarokên wan he ne.
15. Av li agir nakin, dibêjin guneh e.
16. Dema di daweta yekî da baran bibare, dibêjin te binê beroşê baş alastiye. Hinek jî dibêjin, te binê beroşê nexwariye te beroş xwariye.
17. Dik hêkê bike dibêjin, bêyomî ye û ne baş e.
18. Di nava serê yekî da du gilolik hebin, dibêjin du jinan dike.
19. Dibêjin cilan beravajî li xwe mekin, merivekî we dimire.
20. Şîr biquse, dibêjin çavîni bûye.
21. Dibêjin, xwê li agir mekin guneh e.
22. Dibêjin, hûn beqan bikujin di destê we de balûk tên.
23. Sala ku zerqet pirr bin dibêjin, zivistan xedar e.
24. Kuştina hehecikan guneh e.
25. Dibêjin hûn neynûkên xwe jênekin, dibin sergoyê şeytên.
26. Dibêjin, neynûkan neavêjin erdê; guneh e, bibin bixin qulikên dîwaran.
27. Meriv nê navêje erdê, guneh e.
28. Nan li erdê bibînin, radikin, sê caran maçî dikin li eniya xwe didin û datînin çiyekî bilind.
29. Kund li nêzî mala kê bixwîne, dibêjin musîbet e û keysê lê bînin wî dikujin.
30. Yek ji malê wechê xwe daleqîne dibêjin musîbetî ye.
31. Pitikê heta çil rojî nîşanî tu kesî nadin, dibêjin ne baş e.
32. Merivek çil rojan sîr nexwe, dibêjin bêîman dibe.
33. Hîv bê girtin, li tenekeyan dixin û dibêjin, ejdiya ew xwariye nehêlin.
34. Binê lingê yekî bixure diçe çiyekî.
35. Nanê şewitî yê tenûrê bixwî, pere li erdê dibîni.
36. Dibêjin hûrikê nan bixwî, pere li erdê dibîni.
37. Piştê stûyê bebikan maçî mekin, dibin sût û sîpe.
38. Dibêjin, binê lingê bebikan maçî mekin, qama wan dernakêve.
39. Dibêjin, di ser bebikan ra xwe hol mekin, qama wan dernakeve.
40. Hîqîq li meriv bikeve yek qala meriv dike.
41. Dema Xwedê zarokan dide, zarok digirîn, dibêjin dizanin dinya çiyekî çawa ye loma digirîn.
42. Mehkema yekî hebe, pisîka reş digirin dixin bin quşxaneyê tenîkirî heta mehkeme biqede. Bi vî awayî yan cezayekî hindik li meriv tê birrîn yan jî meriv tê berdan.<sup>2</sup>
43. Dema mêvan bê û neçe, xwê dixin nav solê û li rêya wî direşînin ku biçe.
44. Dibêjin stêrkan mejmêrin di destê meriv da balûk tên.
45. Nanê ewil ê tenûrê bixwî, mêr bî jina te jin bî mêrê te dimire.
46. Meriv nanê ewil bixwe bê bereket dibe.
47. Dibêjin, porê xwe biavêjî erdê yek pê lê bike serê te diêşe.
48. Êvara îniyan pîvazê bixwî milyaket nayên.
49. Dibêjin, neynûkên xwe bixwî di hundirê te da neynûk şîn tên.

<sup>1</sup>Ev baweriyên gel, ên derdora Amedê ne.

<sup>2</sup>Ev tiştê hanê, min bi tenê li Licê bihistiye.





## SIÛD

Mêrdekêk beno vono siûdê min çin o, şono siûdê xo dima geyreno. Warden yeno siûdê xo dima geyreno ewnîyeno ke yew cinawir ha weyra de visteyo.

Cinawir vono :

- Ti sera şonî ?

Mêrdek vono:

- Willay siûdê min çin o , ez siûdê xo dima geyreno.

Cinawir ey von :

- Ti şonî min rê zî pers, ez veyşon o ez nêweş o yew çî çin o ez boro(biwero). Mi rê zî pers hele ez se beno?

Mêrdek şono şono vono :

- Tamom.

Mêrdek yeno ke yew mêrdeko pale ha weyra de citî keno.

Pale vono :

- Ti sera şonî ?

Mêrdek vono:

- Willay siûdê xo dima geyreno.

Pale ey vono :

- Se bena min rê zî pers, ez cite şarî kena nêkena, ma tim veyşon î eyelê mi bonklêz kena nêkena newe nêbenî, ma tim veyşon î, cite şarî kena nêkena ma mird nêbenî,Ey vono min rê zî biney pers.

Mêrdek vono :

- Tamom.

Şono şono ek yew qomondo ha weyra de yo, taburey eskerî zî ha weyra de ya. Vono rehet,hazir ol benî vono hazir ol rehet benî.

Qomondo vono:

- Ti sera şonî ?

Arêkerdox:  
Denîz MAYA



Qomondo:

- Ey de ti şonî min rê zî pers, taburey eskerê min a. Ez vono rehet ,hazir ol benî, ez vono hazir ol rehet benî, biney min rê zî pers.

Mêrdek vono :

Wîlîy siûdê to çîra geyrê ra, siûde min çîn o.

Qomondo:

- Ey de ti şonî min rê zî pers, taburey eskerê min a. Ez vono rehet ,hazir ol benî, ez vono hazir ol rehet benî, biney min rê zî pers.

Mêrdek vono :

- Tamom.

Şono ek siûdê ha binê dare de yo, yew zope geno ke bîdo siûdî rê.

Mêrdek vono :

- Qey ti nêni keye...

Siûd vono :

- De ti şo ez ha yeno.

Mêrdek vono :

- Bide vernîya min.

Siûd vono :

- Ney ney ez ha yeno.

Mêrdek:

- Ey vindire hîrê tenan mi çî vato. Vono ez ameyo weyra de yew qomondo est bîyo. Qomondo vato ke taburey eskerê min est a. Ez vono hazir ol rehet benî ez vono rehet hazir ol benî, goş min nênonî.

Siûd vono :

- Ey ra vacî ke ti cenî ya, ênê comêrdê , çîray comêrdê goş cenî nonî.

Mêrdek vono :

- Tamom.



Ke yew mêrdek zî weyra de cit kerdinî, vatinî ez cite şarî kena nêkena, nêqedîyeno eyelê min tim veyşon î, mird nêbenî ez se bikero min rê zî pers.

Siûd va :

- Ey ra zî vac. A cayo ke ti cite kenî yew qûç ha weyra de ya, a qûç aşon yew lê altinan ha binde yo .Ber eyelê to pê weye benî.

Mêrdek vono :

- La yew cinawir zî weyra de vistebi va min rê zî pers ez nêweş o, ez nêşkeno şêro yabon, ez veyşon o çî zî nêyeno min ver ez se beno?

Siûd vono :

- Ey ra zî vac yew merdim her ehmeq raştê to ame, ti wenî ti weş benî.

Mêrdek vono :

- Tamom.

Yeno yeno eskerî het.

Qomondo vono :

- To se kerd?

Mêrdek vono :

- Willay mi tira vato. Vato aye ra vac ti cenî ya, ê comerdî. Comerd goş cenî nonî

Qomondo vono :

- La ez se bikero? De ti bê min bigerî. Ez beno cenî ya to, ti zî bibi merdeyê min. Taburey eskerî ti biewnî meeş bigerî ma xo rê ronîşî.

Mêrdek vono :

- Eee ez ha şono siûdê min ha yeno...

Ena ray yeno pale het.

Pale vono :

- To se kerd?

Mêrdek vono :

- Willay min ti ra vato. Vato a ca ke ti cite kenî aşoni binde lê altinan est o. A lê altinan vec bigerî şo keye ti weye benî.

Pale vono :

- De meşo, ez û ti, ma pîya aşonî ma xo rê altinan bar bikerî.

Mêrdek vono :

- Eee ez ha şono siûdê min ha yeno...

Şono şono cinawir het.

Cinawir vono :

- To se kerd?

Mêrdek vono :

- Willay mi tira vato. Vato yew merdim her-ehmeq raştê to bêro ti borî ti weş benî

Cinawir vono :

- De to rê ehmeqêr çew çin o. Dekeweno mêrdek serî mêrdek weno...

Çime: Feqrîya AKSEL

Mintiqa: Pîran-2016





## KULÎ Û ÇÎVÊ

Berhevkar:  
Mehpûs SERHEDÎ

Dibê wextkê yekî feqîr hebû, belengaz bû, perîşan bû. Dibê, çû gundkî gavanîyê. Gavanê gund bû. Îja navê mêrik Kulî bû, navê jina wî jî Çîvê bû. Dibê, li gund gavanî kir, rok, dudu; çar meh, salek... Dibê, melê gund jî hebû. Îja dibê, kaniya gund yek tenê bû, ew jî li orta gund bû. Milet tev li wê kanyê diketin dorêêêê, sira kê bihata ava xwu tije dikir, diçû mala xwu. Milet diketin sirê, dibê çawa jina mele bihata, millet ji hev ra digo:

- Keçê jina mele hat, sirê bidin jina mele, bira jina mele ava xwu bigre here.

Dibê çaxa pîreka Kulî dihat, a gavan, di sira xwu da dimaaa hettta dawiyê. Dibê, rokê Çîvê aciz bibû, êvarê gavan ji ber dewara hat, jinkê jê ra go:

- Xwudê, yan tu yê mi berdi go yan jî tu yê herî bixwîni bibi mele.

Kulî go:

- Keçê emrê min sî sal, çil sal... Ez ê ji anha şûn da çawa bibim mele?

Jinkê go:

- Bi navê Xwudê tu yê bibî mele. Go jina mele her tişt jê ra serbest i,<sup>1</sup> tê kî derê xel tev dorê xwu didinê, dibên temam bira pîreka mele bigre here û ez jî hetta dawiyê li dorê disekinim. Go ez qebûl nakim tu yê bibi mele başqe çare tuni.

Kulî diki naki çarekê li jinikê nabîni, dibê radibe hinik defter mefterê xwu nû, kitabê xwu nê Latîni?<sup>2</sup> dixi çentakî, davê piştta xwu dibê:

- Ez ê herim bixwînim. Meletiyê bixwînim.

Dibê nanê xwu digri derê, dibê dûrî gundiya di çiyakî da awa ciki kestune darik mezin hebûye. Ê ka gavanê feqîr here li ku bixwîne.

Gavan wan defter mefterê xwu diki çeptê xwu li binê darê rûdini du ro, çar ro, deh ro... Dar jî, agir berdanê hêlik darê şewitiye wer rreeeş bûyiii, bûyi qefa. Kulî derê di qefa darê da ji xwe ra bi şevê radikevi, wê qefa reş da. Heta çendekî wî diqedî dibê şevkî tê mala xwu. Çîvê dibê:

- Mele Kulî tu bi xêr hat.

Li hev dipirsin. Çîvê dibê:

- Kuro te xwend?

Kulî dibê erê Wele mi xwend.

Dibê:

- Tu bû mele?

Dibê:

- Belê ez bûm mele.

Dibê:

- Te heta kî derê xwend?

Dibê:

- Mi hetta qirnê reş xwend.

Qirnê reş ji koka darê ji wî çiyê reş ra dibê.

Çîvê dibê yanî te son dayê<sup>3</sup>?

Dibê erê mi son dayê.

Çîvê dibê:

- De em îja ji xwu ra meletiyê bigrin, bikin.

Mele Kulî dibê:

- Em bigrin, dibê ka li vira xel gi me nas diki em herin ku wê bên gavanê gund e, viya melê çiyi halê çiyi, kî li vira meletiyê didi me? Dibê em ê ji vira mala hildin herin welatkî dûr em ê bên em li meletiyê digerin.

- Dibê ew û Çîvê radibin mala xwu digrin deri Wekî anha mala te li Qereyazî'yê<sup>4</sup> yi tu hatî li cem mey î; ew jî mala xwu ji Qerejdaxê hildide dere cikî wek Qereyazî'yê meletiyê dike ji boy ku kes wan nas neki.

Dere çiyekî wek Qereyazî'yê dûr. Kes nas naki xel diçe dibê:

- Hûn bi xêr hatine, li hev dipirsin. Xêr e, tu li çi digeri?

Kulî dibê:

- Wele ez mela me, li melatiyê digirim.

Gundî dibêjin:

- Tu melakî xurt î însella?

Vaya dibê:

- Wele ez pîrr melakî xurt im.

Gundî dibêjin:

- Wele melê gundê me jî tuni, dibê camiya me jî tuni.

Mele Kulî dibê:

- Wele ez bê camî nikarim limê bikim<sup>5</sup>.

Gundî dibê:

- Em ê camiyê lê kin.

Mele Kulî dibê:

- Temam ez qaîl im.

Gundî radibin heqê wî dikin, heqê wî çiyi perê wî yi, zekatê wî yi eger çiyi wî bi... Dibên:

- Em ê salê avwas pere, heq bi te din.<sup>6</sup>

Radibin xanyakî jî didin Kulî. Kulî ji gundiya ra dibê:

- Ku we camî tamam kir em ê dûra dest bi mêja xwu bikin, dibê ez bê camî li mê nakim.

Gundî dibên:

- Temam.

Kulî tê malê ji jina xwu ra dibê:

- Keçê Wele me bi vî hawî xeberdana xwu kir, heqê xwu kir. Dibê heta salkî belkî camî tamam nebe, dibê salik me yê awa derbas be, em ê heqê xwu bistînin hela ka ji wî pê va jî xwedê mezin e.

Melê Kulî'yê me heqê xwu distîne, êvarê millet li dor mele to dibe: "Seyda awa bûyi seyda awa çûyi..."

Mele Kulî civata xwu êvar êvar çê diki. Wana jî des bi camiyê dikin çê dikin.

Camî tamam dibi gundî:

- Dibê seyda me camî tamam kir û em êvarê derin di camiyê da li mê dikin û tu yê ji me ra tê da weza bidî.

Seyda jî yek herfekî nizane, etehyatê jî nizane û nizan e azande jî. Seyda êvarê tê li ber derê camiyê dibê:

- Ez ê temyakî li we gişa bikim.

Gundî dibê:

- Seyda kerem ke, bêje.

Mele Kulî dibê:

- Mi di camiyê da çawa kir hûn ê jî wer bikin.

Gundî dibê:

- Temam seyda.

Ê va gundiya jî berê da melê wan qet tune bûyi, camiya wan tune bûyi mejbûr ew jî mele çawa biki wê mîna mele bikin.

Dibê mele deri li safa pêşyê disekini dibê:

- Ellah û ekber, ê desê xwu girê dide, ew ê bê çi?

Tîşkî nizane, heta qirnê reş xwendiyê. Mele duşunmîş dibi duşunmîş dib<sup>7</sup> bi xwe xwe dibê. "Lawo ka ez ê ji vana ra bêm çi, ez nizanîm bixwînim, ez nizanîm bêm çi. Dibê en îyîsî<sup>8</sup> ew e ez birevim ku ez xwe ji vana xilas kim." Dibê mele direvi, hema çawa derdikevi radihêli solê xwu na, pêlivê<sup>9</sup> xwu û Millet jî tev direvi.

Ê mele berê gotiyi mi çer kir hûn jî wer kin.  
Milet direvi her kes dest davê pêlivê xwu, emrê Xwudê vana xwu davên devre camiya wan tev jor da tê xwarê. Millet li halê xwu û li camiya xwu dinirin:

- Yawo dibê viya çi seyda kî felaket i, evya çawa zanîbû wê camiyê hilşê ev revya? Dibê bi navê Xwudê viya ewliya yi. Dibê ew çawa be em êdî viya bernadin. Ma lawo dibê eger ji mele nebûya em tev qir dibûn, gebar dibûn<sup>10</sup>.

Gundî dibên:

- Seyda te çawa zanîbû camî tê xarê?

Seyda dibê:

- Hûn li îşê xwu mêzekiîin!

Gundî êvarê li hev to dibin dibê:

- Heqê vî seydayî zêde kin bira ji gundê me neri.<sup>11</sup>

Ê camî çû, camî heta salkî dîsa çênabe. Heta wê enqazê to kin û bidin hev û car din camiyê çêkin salik dere. Vana ji seyda ra dibên:

- Seyda em camiyê dîsa çêkin?

Setda dibê:

- Bira anha bisekine. Dibê zemanê mi ji we ra go hûn des pêkin û çêkin.

Seyda jî pê salê xwu derbasa<sup>12</sup> diki.

Gundî dibên:

- Wê çaxê dibê seyda zane kînga gerekmişkirse<sup>13</sup> ew ê bêje em ê jî çêkin.

Dibê jinikek gulîska qîza axê didize. Wa digerin, wa digerin, wa digerin gulîskê nabînin. Axa dibê:

- Herin ba seyda kin bira were.

Seyda tê, axa dibê:

- Seyda!

Mele Kulî dibê:

- Çiyî?

Axa dibê:

- Gustîla qîza min wenda bûyi, kê biribi tu hemen derdixî. Çimkî dibê, camî dikir bikeve te em giş ji ber xelas kirin. Dibê miheqeq tu vêya jî zanî. Dibê ji te ra sê ro muhlet, here gulîska qîza min derxe.

Ê seyda bê e nizanim nebû. Seyda dibê:

- Temam ez ê gulîska qîza te derxim; lê dibê tu yê şevê qaz kî bidî mi ez bixwim.

Axa dibê:

- Temam.

Dibê Mele Kulî êvarê tê malê destê xwu dide ber serê xwu dikevi duşunecaxê,<sup>14</sup> duşunmiş dibi duşunmiş dibi duşunmiş dibi... Yawo ma ew ê ji axê

ra bê çî, çî zane gustîlê kê biriye? Ji jina xwu ra dibê:

- Yawo Çivê viya çî bû te anî serê min, te ez bizorê xistim mele? Dibê axê ji mi ra gotî heta sê roya tu derxi derxi tu dernaxê bi Xwedê ez mala te dişewitînim.

Dibê wê jinika ku gustîla keçkê birî ji tirsana dikevi kelecane roya ewil da tê xwu dide ber derê mele, tê wan gudaî diki mêze dike mele destê wî li ber serya yi duşunmiş dibi. Jinik bi xwe bi xwe dibê: "Navê Xwudê mele way kûr duşunmiş dibi mele zane mi gulîsk biriyî."

Dibê jinik xwe li derê wan diqelîbîne dibê:

- Seyda ez ketimi bextê te û Xwedê dibê tu mi dernaxi, qala mi nakî, dibê mi gulîska qîza axê biriyî.

Seyda dibê:

- Mi zanîbû. Dibê mi go gu ne yî, ez derxim eyb i, mi gotî bira gundî pê nehîsin. Dibê sonî<sup>15</sup> te nehata negota min ê bigota filankesê biriyî, min ê navê te bigota. Dibê êdî em ji kesî ra nabêjin em ê bi hawakî wer vê gustîlê bidin axê bira tew kes fem neke, nizanibi tu yi.

Jinik dibê:

- Seyda e destê te maç dikim, xwedê ji te razîbi, Xwedê zani tu zani, hema tu çawa dibêjî bira mîna tebe.

Mele Kulî dibê:

- Dibê sê qazê mala axê hene, yek jê kor e. Dibê tu here hinik hevîr çê biki, wê gulîskê tike nav hevîr, wê qaza kor wiha tek biki û bidê bira qaz wî hevîrî bixwu û here mala xwu, e nahêlim tu derkevî.

Jinik deri gulîskê dixî nav hevîr didi qazê qaz dixwu û jinik derê mala xwu.

Axa şevê qazka saxlem dişîne ji Mele Kulî ra, Mele Kulî şevê qazeka xwu dixwe. Roya sisya êvarê seyda dere mala axê. Axa dibê:

- Seyda te hel kir?

Seyda dibê:

- Mi hel kirî, înşallah dibê ez ê zanibim li ku yi.

Axa dibê:

- Lawo seyda kî felaket i viya, Xwedê çawa ev rastî me anî?

Mele Kulî dibê:

- Si heb qazê te hene.

Axa dibê:

- Erê Wele sê heb qazê mi hene.

Mele dibê:





Mele dibê:

- Qazika te bi çevki yi, noxsan i. Dibê wê qazê gulîska qîza te xwariyi. Dibê çevik wê kûr bû, gulîsk li erdê bû, qazê nedît û daqurtand, dibê kesî gulîska qîza te nebirî. Dibê tu here qaza xwu şerjê ki tu yê bibînî.

Jinikê jî setik du seet berî ku qazê şerjêkin gulîsk dayî qazê.

Axa dere qaza xwu şerjê diki, ji hev da dixi, mêze diki gulîsk way di zikê qazê dayi. Axa ban gundiya diki dibê:

- Hûn ê maaşê vî seydayî zêde kin. Dibê lawo kî çer biki zani. Dibê we nedî wê rûyê ruhê me sed meriyî ji camiyê xelas kir. Navê Mele Kulî li her derê bela dibi, her kes êdî wî nas diki.

Paşê heftak deh ro derbas dibi, dibê çil heramiye hebûne. Çil heramiye ew ê ku îşê wan, qaydê wan tenê dizî ye, diziyê dikan. Dibê va çil dizana teqîb dikan pê dihisin ku xezîna zêrê wî axayî heye, axê Mele Kulî. Va dizna ji hev ra dibêjin:

- Lawo herin bigerin zêrê axê derxin, bînin.

Vana diçin digerin zêra di çelê da dibînin, derdixin û tînin. Tînin dibê:

- Lawo em va zêrana li ciyakî da çel kin, veşêrin; dibê melê wan pîrr felaket i, dibe ku hema me derxi. Dibê hela em ê çendakî lê guhdarî kin eger

tiştik ji mele çêbû çêbû, çênebû em ê dawyê da herin derxin.

Dibê axa serê sibê dere ser zêrê wxu, zêr tunin. Axa ban gundiya diki, ban heyeta xwu diki topê hev dibin kê bir kê nebir? Çarê lê nakin axa dibê:

- Ba seyda kin, viya îşê seyda yi, seyda nizanibe kes êdî nizani.

Seyda tê, selam elêkim elêkim selam. Millet ji ber seyda radibi; axa, paşa cî didine seyda, seyda rûdini. Seyda dibê:

- Axa çi yi, çi mesele yi?

Axa dibê:

- Wele seyda hinka îşev li çela mi xistiye, zêrê mi birine. Dibê tu çawa derdixi derxi viya.

Mele Kulî dibê:

- Ka axa vaya ne tişkî biçûk e, ez ê çawa viya derxim?

Axa dibê:

- Kuro te çima qaza me gustîl xwarîbû zanîbû tu viya nizanî, viya daha açix i, viya hatiye kolan gere tu derxi.

Seyda duşunmiş dibi, dibê:

- Axa!

Dibê:

- Ha!

Dibê:



- Axa tu yê ji mi ra çel heb mirîşkî bişînî, çel royî jî tu yê li min misade bikî. Çimkî dibê defîneyi, mezin i, vaya ne tişkî biçûk i. Dibê ez ê pirr li ser viya bi-sekinim, ne tişkî hindik i, dibê zaten sonî ez ê der-xim ê de ka zamanê wî hat em ê ji te ra bibên. Dibê wexta ku ez dernexim ez seydayê çi mi?

Axa dibê:

- Qolayi yi wîya dibê ma çel mirîşk û çel ro tiş nini. Temam bazara xwu dikin, axa jê ra çel heb mirîşkê xwirt ê rind jê ra ayrî dike. Êvarê Mele Kulî dere malê jinik dibê:

- Kuro te çer kir?

Dibê:

- Ma ez ê çer bikim mi çel ro misade jê xwest û mi çel heb jî mirîşk jê stend. Dibê em ê şevê mirîşkik wxu bixwin şeva ku çelê me tamam bû em ê bi şev mala wxu bar kin û herin. Dibê ma e çi zanim kî zêrê wî birî.

Êvarê mirîşka wxu şerjê dikin, ew û Çivê didin orta wxu, kêf dikin. Dibê wa dizana dibêjin:

- Lawo hela yek heri ser rocina<sup>16</sup> mele wxu bide gudariya hela mele qe bes diki, dibê vana zêrê axê birî yan na. Dibê hela ka mele û jina wxu dibên çi? Ê de vana jî bihistiye mele her tiştî dizane. Hinik ji wan jî li cimeta axê bûne, kirinê mele dîtine.

Dibê ji wan çel diza yek tê ser rocina Mele Kulî di-sekini. Mele kulî mirîşka wxu têêêr dixwu ser piştê vedikeve dibê:

- Çivêêê!

Çivê dibê ha seyda!

Dibê:

- Çivê ji çelî çû yek, ma sî û neh. -Yanî me yek xwar, sî û neh man.

Evîya hema ji ser rojinê radibi û direvi. De ewana jî çel merî bûne. Deri hevalê wî dibê:

- Kuro te tiş bihist?

Dibê:

- Erê Wele mi bihist. Dibê bi Xwedê zani zêr me birî. Dibê ma ez bi tenê neçibûm ser kulekê?

Hevalê wî dibê:

- Erêêê.

Dibê:

- Lawo ji jina wxu ra go "Ji çelî çû yek." Yanî yek hatiyi ser kulekê.

Vana dibê:

- Lawo bi Quran ew ê fermana me rabi.

Şeva din Mele Kulî mirîşkik din jî dixwi. Va dizana ji hev ra dibên:

- Lawo hela du heb herin ser rocinê hela dizane du heb çûni yan nizani.

Du heb derin seyda dîsa têr mirîşka wxu dixwu-uuu, mifereh dibi, dibê:

- Wele Çivê ji çelî çû dudu.

Vana dibê:

- Lawo hadî dibê rabi mi herin, bi Quran dibê zani. Şevik dudu sisê, eva dizana tim yekî dikin heval, seyda tim dibê:

- Ji çelî avqa çû ma avqa.

Ê de serê va dizana jî yek hebûye. Ew çi bêje bi gotina wî ye. Vaya dibê:

- Ka ez ê herim. Dibê ez ê bi şev herim wxu bavê dest û nigê wî bira navê me dernexe ortê.

Şeva çara, pêncâ, deha, dibê va serê diza dere teq li derê Mele Kulî dixi. Mele dikenî dibê:

- Xêr i kuro vê nivê şevê?

Vaya dibê:

- Em dextê te ne seyda, em ketine ber bextê Xwudê û em ketine ber bextê te, dibê ji wxu tu dizanî va îşa me kirî.

Mele dibê:

- E zanim çawa.

Dibê:

- Seyda bextê te da me tu ji me ra çarakî çêki.

Seyda dibê:

- Lawo dibê me çel royî soz dayî axa, dibê herin li mala wxu rûnin we firseta wxu dî; îro sibe du sibe sê sibe... Dibê şevkî herin zêrê wî têxin şûnê, qapat bikin û herin. Dibê ez we dernaxim, herin.

Diz dibê:

- Ê mala te ava.

Dest û piyê wî di devê wxu ra dikin, maç dikin. Vana derin şevkî dudu sisê dibin zêrê wî dixin şûna wî. Mele Kulî çil royê wxu diqedîne her şev her şev mirîşkekî dixwi. Mele Kulî rûya çilî ji wan ra dibê:

- We zêr tamam kirî?

Vana dibê:

- Me tamam kirî, xistiya ciyê wî.

Rûya çelî melê me dere oda axa, li toplima<sup>17</sup> axa rûdini. Axa dibê:

- Te çer kir Mele Kulî?

Mele Kulî dibê:

- Axaaaa, îcab naki tu sewal biki û dirêj biki. Dibê axa heri xezîna wxu qontrol biki, kesî zêrê te nibirî qey tu yanîş i<sup>18</sup>.

Axa dibê:

- Kuro mi bi destê wxu jimartin, biriya.

Seyda dibê:

- Biribi jî hatî şûna wxu.

Axa dibê:

- Ka evê wer kir kiya?

Seyda dibê:

- Îcab naki em bibên.

Axa deri, e, zêrê wî tamam îstifkariya tamam saxleme tê dayî, rûya çilî yi. Axa dibê:

- Seyda vana kî bûn?

Dibê axa çaxa em bibên filankes bû, navê wan ji te ra bibê, dibê daha êdî vê tilsima<sup>19</sup> me xera dibe.

Axa dibê:

- Wereyî nebê. Dibê bavo çî dibe diqewime tu derxîne qe ji me ra nebê kî kirî. Axa maeşê mele hinkî din jî zêde diki.

Dibi êvar civata axê û gundiya tev li hev rûdinin yek dibê:

- Wele mele derewa diki, ne wereyî, mele di ku ra zani çî li ku yî?

Yê dina dibê:

- Kuro ma va bû sê çar heb îş diqewimi mele tevî dernaxî?

Vana dibê:

- Wele em ê sibe gazî mele kin, em ê şertkî çêkin a li vira, di nav toplimê da mele ku hema pê derxist derxist, dernexist derewa diki. Hinik dibê ew ê derxi, hinik dibê dernaxi nizani... Gundî dibê yaw em pera pirr didinê dibê bi vî pereyî mera<sup>20</sup> pê gundkî xwedî diki.

Ê gavan zengîn dibi, jinik jî bûyi jina mela, bûyi xanim, kêf diki.

Dibê civatê li ser mele şert girtin. Radibin çivîkîk mirîşka digrin û kulyakî tînin, kuliye çolê, digrin devê çivîkê ji hev vedikin, kuliye dikin devê çivîkê û çivîkê dixin sandoqkî tînin awa datînin orta oda axê, ortiyakî<sup>21</sup> dikişînin ser sandoqê û axa dibê:

- Gazî seyda kin.

Seyda tê rûdini. Axa dibê:

- Seyda Wele me şertik daniyi li ser a vî îşî. Dibê em hinik dibên were yî, hinik dibên were yî, hinik

baweriya wan bi te nayê, hinik jî dibê Wele seyda kî pirr xwirt i. Dibê gundî dibên melê xelkê sed panotî distînin, em mehê pênsid panotî didin viya. Dibê mi jî gotî bira melê mi were mi melê xwu tercûbe kiriyi. Dibê mele ana<sup>22</sup> a di binê vê ortiyê da, çî tê da yî? Dibê hela bêje em ê rast û derewê te di vira da derxin, me şert girtî.

Ê mele çî zane çî tê da heyî. Mele Kulî hebki duşunmîş dibi, destê xwu didi ber serê xwu disekini disekini disekini, ê ew ê bê çî? Gellekî duşunmîş dibê dibê:

- Aaaax ax Çivê dibê te çer di riya<sup>23</sup> bavê Kulî da rî. Yanî ji Çivê'ya jina xwu ra dibê te mala min şewitand, te ez kirim vê oynê, de navê wî jî Kulî yî.

Vana dibê:

- A bi Xwedê zani. Dibê vay çivîk tê da yî kulî jî di devê çivîk da yî.

Axa dibê:

- Mi ji we ra nego melê mi her tiştî zan î.

Artix navê Mele Kulî li gunda, li bajara bela dibi, mele di nav pera da dibi bankêr û dere.

Xelmîşoka min li dihara rihmet lê dê û bavê guhdara.

**Çavkanî:** Şewket KÖSE

**Xwendina wî:** Nexwendî ye

**Temen:** 58

**Herem:** Qerejdax-Gundê Alçîmenê/Amed

**Cî:** Mala Şewket KÖSE

**Dîroka berhevkarîyê:** 14 /01/ 2016

<sup>1</sup> Serbest i: Serbest e.

<sup>2</sup> Defter mefterê xwu nû kitabê xwe nê Latince: Defter mefterê xwe û kitabê xwe yê Latince

<sup>3</sup> Son dayê: Dawî lê anî

<sup>4</sup> Qereyazî: Navçeya Erziromê' ye

<sup>5</sup> Li mê bikim: Nîmêj bikim.

<sup>6</sup> Bi te din: Bidin te.

<sup>7</sup> Duşunmîş dibi: Dirame, difikire.

<sup>8</sup> Ên îyîsî: A herî baş

<sup>9</sup> Pêliv: Pêlav, sol

<sup>10</sup> Gebar dibûn: Dimir in.

<sup>11</sup> Neri: Neçe

<sup>12</sup> Derbasa: Derbaz

<sup>13</sup> Gerekmîşkirse: Hewcebe.

<sup>14</sup> Dikevi duşunecaxê: Dirame, difikire.

<sup>15</sup> Sonî: Di dawiyê da

<sup>16</sup> Rocin: Kulêka xanî

<sup>17</sup> Toplim: Civat

<sup>18</sup> Yanîş î: Şaş î.

<sup>19</sup> Tilism: Tilsim, sér, mucîze...


<sup>20</sup> Mera: Mirov

<sup>21</sup> Ortiyakî: Pînekî, paçekî

<sup>22</sup> Ana: Aniha

<sup>23</sup> Riya: Rûyê

Arêkerdox:  
M. Mamet QETEKONIJ



# MINTIQAYA ŞANKUŞÎ RA TAY FIQRAYÎ



### Fiqraya yewine: Arêsi

Wexto ki Polato arêyê ewki virazenê, arêsiyonê ho zewmbî ca donê viraştiş, pey resenon û darona çirêşenê dewi. Senî ki nê arêsiyo resnenê çoyê Mêmerî ser, qelifiyenê vonê: "Ma nê sîyo leyri çimi wa şêrê la ver, aja ra bemî eynî ser."

Dewijî siftenî sîya serî leyri çenê. Sî şuna la ver, vîni bena. Ceyrenê ceyrenê la sî nêvînenê. Sî ki ney-sena vonê: "Dew ri çum aqil o, wa o bêro ki na sî bivîno." Şunê dew, vonê: "Bêrê sî vîni bîya, ma sî bivînimi." Axirî jê mardûm vejîyeno çoyê Mêmerî ser cayo ki sî leyri çarda aja ro nadono. Dima vono: "Destê mi na sîya jûwer a bivestê, mi pa leyri çê. Na sî ça vîndo a jûweri kî ça bi aja bena. Mi ki dî, ez şima rê weyn doni, ma aja ra sîyo cemî, bemî arê." Dewijî vonê: "Temom."

Baro nê mardûmî bestenê sî ya, sî leyri çenê. Sî ki leyri bena dewijî kî sî dima şûnê. Dewijî resenê la ver, nadonê ki wîrdiney sî jê birikî bin di vindardê, la na deri mardûm çinî yo.

### Fiqraya dîyine: Deva

Rojê dewa Polato ri jû deva heyayê cilcilî mîyon di mêli bena. Dewijî ki na deva vînenê, vonê: "Eki na deva cayê ho ra weyzo heme cilcilî talon çena, weyn dê jê aqilî, wa bêro nay rê çareyê bivîno."

Dewijê eno, pîremondê deva ra ceyreno ceyreno, vono: "Tew rindê ci ma linconê na deva bivestimi, ho dima xij çimi. Nêvo eki na deva weyzo heme cilcilî çena têser û têbin."

Axirî dewijî linconê deva bestenê, pêro benê reseno ro, deva ho dima xij çenê, oncenê çinar. Dewijî ki ona çenê nîmey heyay linconê dewijon û deva bin di beno xirav. Aqilê dewi kî vejîyeno meydon vono: "Ella çar ma na deva xij çardi, nêvo heyay pêro bîyê xirav."

Ca: Şankuş

# LÎSTIKÊN ZAROKAN Ê HERÊMA FARQÎNÊ

## ÇEND RÊBAZÊN SEREKE YÊN KU DI LÎSTIKAN DE DOR(MAK) BI WAN TÊ DIYARKIRIN

### 1. Darikê kin

Di vê rêbazê de yên ku dilîzin çend kes bin, ewqas darikên zirav didin ber hev, ji van darikan yek jî kin e. Ên ku dilîzin her her kesek darikekî radike, darikê kin para kê bikeve maka lîstikê dibe ya wî/ê.

### 2. Şil û Ziwa

Di vê rêbazê de yên ku dilîzin kevir kî pehn tînin. Ew kevirê pehn, alîkî wî şil, alîkî wî jî ziwa ye. Yek dibê; aliyê ziwa, yek jî dibê aliyê şil û wî kevirî davêjin hewayê. Kevir ka bikeve erdê, kîjan alî were yê pê derxistiye ew dest bi lîstikê dike; ya jî yê ku pê derxistiye xelas dibe, maka lîstikê jî li ser ê ku pê dernexistiye dimîne.

### 3. Bizdim, badim

Di vê rebazê de kesên ku dilîzin li hemberî hev disekin, carê lingêkî/piyekî xwe li pêşiya lingê xwe yê din datîne û ber bi hev diçin. Û dibêjên "bizdim- badim". Dema bigihîjin hev, lingê kê were ser lingê yê din, dibêje; "bizdim badim jêrî li te radim" û dara pêşî ya wî/ê ye. Destpêkirina lîstikê dibe ya wî/ê.

### 4. Kevir dîtin

Ev rêbaz, bi piranî di lîstikên ku di navbera du kesan de tînin lîstin de tê bikaranîn. Yek ji erdê kevirêkî biçûk hildigire û li pişt xwe di nava destekî de vedişêre. Kesê din ku bizanibe kevir di kîjan destî de ye, dor dibe ya kesê din.

Yekê yekaneke \*\*\*\*\*  
Dû bizdanê Nîsk û noka  
Ezizzanê Tev kelî yê  
Gula çepo, çepil mijo Kete cokê  
Ara gîjo Cok miçiqî  
Heba tirî, tê şengilî Rûn biriqî  
Gul hine ye Lawikê paşê  
Şam û şeşe Gog qumaşe  
Bîst li te ye. Lawikê mîran  
\*\*\*\*\* Gog herîran.

Heblan deblan  
Çilo çeplan  
Misk û enber  
Xatûn gozel  
Perê çukê  
Wê'l gedukê  
Mam Emero  
Xwelî sero  
Here dero.

### 5. Xire xira gwîza tê

Ev rêbaz bi piranî bi şeklê hîlbijartinê tê bikaranîn . Bi tiliya xwe bi dorê her kesî nîşan dide û vê gotinê dibê; " Xire xira gwîza tê, dengê bilûra şivan tê, xewka min ser vî ya tê" dawîya vê gotinê " tê" li ser kê bê gotin, dibe ya wî lê.

### 6. Hevalgirtin

Ev rêbaz di lîstikên ku di navbera du koman de tê lîstin de tê bikaranîn . Rasthatî du kesên ji komên hember, kesên din yeko yeko digirin koma xwe. Heval, bi awayê " ew ji te re, ev ji min re" tînin hîlbijartin. Bi vî awayî kom temam dibin û dest bi lîstikê dikin.

### 7. Bi Zûgotinokan/Lihevanînokan

Bi zûgotinokan jî mak tê diyarkirin .Bi nîşandana tiliya xwe, bi dorê her kesî nîşan dide û zûgotinokê dibêje; ku peyva dawî ya zûgotinokê li ser kê bikeve dora maktiyê dibe ya wan . Gelek zûgotinok û lihevanînokên hîlbijartina maktiyê hene. Ev li hevanînokên li jêr weke mînak in.

Berhevkar:  
Leyla SANCAR

## LÎSTIKÊN ZAROKAN ÊN LI HERÊMA AMEDÊ LI NAVÇEYA FARQÎNÊ

### 1. Gogê

Ev lîstik herî hindik bi sê kesan tê lîstin, zêdetir jî dibe. Bi kevirekî gilover û bi tefşek pehn tê lîstin. Pêşî xêzikek giloverik çê dikin, ji vê giloverê du metre dûr jî xêzikek dirêj çêdikin. Ji ser vê xêzika dirêj bi dorê kevîrê xwe yê pehn dadikrên ber wê xêza gilover. Kevîrê kê nêzî xêzika gilover be, dora listikê a ewil a wî kesî ye. Lê, kevîrê dûrî xêza gilover be, di listikê de dibe maka wî/ê û diçe ber xêzika gilover disekine. Lîstikvanên din jî diçin ser wê xêza direj, dest bi listikê dikin. Tefşê destê xwe dadikin wî kevîrê gilover. Kevîrê gilover ku bipeke, yê ku maka wî/ê ye diçe pey kevîrê gilover tîne datinê şûna wî. Ew heta diçe kevîrê gilover tîne lîstikvanên din jî bi lez diçin ba xêzika gilover tefşê xwe tînin. Ger tefşê xwe bîne were ser xêza dirêj xelas dibe. Lê ku hê ne hatibe ser xêza direj, kesê ku maka wî/ê ye were destê xwe pê ke, dora maktiyê dibe ya wî/ê. Ên dilîzin hemû, tefşê xwe dakin û li kevîrê gilover nekeve, tev bi hev re ji bo kevîrê xwê rakin makê gêjo mêjo dikin û radikin kevîrê xwe direvin. Hu makê wextê tije dibe ye wî/ê. Ev lîstik bi wî/ê şeklê didome.

### 2. Vizvizok

Vizvizok, pêlîstokek gilover û serê wî hinek dirêje. Benîkek direj li serê vizvizok ê çiyê direj badidin hê nivê vizvizokê paşê wî benîkê kaş dike û vizvizokê dadike erdê benêk destê wî/ê de dimîne. Ew vizvizoka ku ketiyê erdê yê kê herî zêde lê dora xwe here were ew kes ser dikeve. Ev listik herî kêr di navbera du kesan da tîn lîstin. Di dawiya listikê de xelat an ceza tune ye. Ev jî yek lîstikên tenê ji bo xweşdemborandinê tê lîstin e.



### 3. Darkît

Ev lîstik herî kê m di navbera du kesan de tê lîstin. Hem di navbera du kesên bi serê xwe hem jî di navbera du komam jî dikare bê lîstin. Ji bo lîstikê divê du heb şiv hebîn û yek ji wan kin yek jî direj be. Berê dora dest-pêkirinê tê diyarkirin . Dora kê be şiva direj û şiva biçûk digire destê xwe û li ber vî kevirê dest be lîstikê dîke. Kesê/a din jî li hember disekîne . Kesê/a ku dora wî/ê ye şiv dike nava destê xwe, siva kin jî bi awaya nîsana zêdekê(+) dide ser ciyê ku destê wî û şiva direj bihev dikevîn siva kin ji ser destê xwe diavêje hewa, şiv dizivîre û bi bine şivê li şiva biçûk dixwe. Ka şiva wî/ê vala biçê û du-sê caran de nikaribe pê şiva biçûk bixe dor derbasê yê/a din dibe. Dema li şiva biçûk bixe kesê/a hember dikare sê tiştan bike.

a. Ku şiva biçûk hê li hewa be wî bi destê xwe bigere hezar puan kar dike û dor jî derbasê wî/e dibe.

b. Ka tenê destê xwe li şiva biçûk bixe û nikaribe wî bigire puan kar nake, tenê dor derbasê wî/ê dibe.

c. Ka ne karibe şivê biçûk bigere û ne jî destê xwe lê bixe şivê biçûk ji ciyê ku ketiye erdê digire û davêje wê kevirê ku peşî li ser erdê hatibû danikirin Yê/a ku dora wî/ê ye jî bi şivê xwe pêşiya kevir digire, şiva xwe di pêşiya wî de dibe û tîne jî bo ku nehêle şiva biçûk li wê kevirê bikeve. Yê/a ku davêje ;

I. Eger karibe şiva biçûk li kevir bixe dor derbasê wî/ê dibe.

II. Eger şiva biçûk li kevir nekeve lê bi qasê şiv nêzikê kevir bisekîne dîsa dor derbasê wî/ê dibe.

III. Lê eger şivê biçûk li kevir nekeve bi qasê şiv nêzikê nebe dor derbas wî/ê nabe û yê/a din lîstikê didomîne. Kesê/a ku dora wî/ê ye bi şivê xwe li goşeyê şiva biçûk dixwe û duvê wî bilind dike û wî dûr dixwe. Ku di sê caran de nikaribe wî bilind bike û lê bixe dîsa dor derbasê yê/a din dibe. Eger lêbixe li gorî awayê lîstikê puanan kar dike.

► Eger şiva biçûk bilind bike û du car li ser şivê bijimêre û lê bixe sed puan.

► Eger carekî bijimere û lêbixe pêncî puan kar dike.

► Eger qet nejimêre, tenê bilind bikê û lêbixê bi şivê xwe heta wê derê dipêve, şiva biçûka wî/ê bi qasê çend şiv dûr biçê ewqas puan kar dike.

Di vir de puanek berê tê diyarkirin, bi jimartina şiv ku puanê diyarkirî pêncî be dema bigihêje pênciyê, kus ed be dema bigihêje sedî, lîstik bê derbasbûna dorê tê serî, ji bo qedandina lîstikê jî bi giştî puanek tê diyarkirin, kî berê bigihêje wê puanê ew lîstikê kar dike

Di awaya ku navbera koman de tê lîstin jî lîstik bi giştî heman şekîlî tê lîstin. Di vir de di serî de dema ku şivê kin tê avêtin yek destê xwe lêbixe hevalêla wî/ê jî dikare şiva biçûk bigire. Ew heman kes tîne qebûlkirin û di dêvla hev de tîne hesabandin û herdu bi hev re di bin puanek. Lîstik bi van awayen didome û kengî yek bigihêje puanê diyarkirî wê demê bi dawî dibe xelat û ceza di lîstikê de tune ye.

### 4. Çivê Çivê

Ev lîstik herî kê m di navbera du kesan de tê lîstin. Lê hejmera kesan çiqas zêdetir be lîstik jî xweştir dibe. Yên ku dilfizin bi awayêkî giroverik rûdinin û her yekî destê xwe pêsta dike û çermikê piştê destê hev digirin. Dûvra bi hevra dibijên " çivê çive çiv rekîs nankî birun bide mîn". Vê gotinê sê çar caran dubare dikin û destê hev ber didin. Û qutgudîka hev tînin. Kî herî zêde qutgudîka hev hanî. Armanc ev e. Ev lîstik bi vê awayê didome. Heta ku kengî bê xwestin wê demê bi dawî dibe. Xelat û ceza tê de tune ye. Ev lîstik ji yek lîstikên tenê ji bo xweşdemorandinê tê lîstin e

### 5. Lorê Lorê

Ev lîstik herî kê m di navbera du kesan de tîne lîstin. Lê hejmara kesan çiqas zêdetir be lîstik jî xweştir dibe. Di vê lîstikê de yek ji destê xwe vedêke û ê din jî wî/ê destê digire. Bi tiliya xwe ya nîsanê di destê wî/ê de digerinê û divê " Lorê Lore mala meç û tabxa jorê kevçî tîne bixwon pilorê bi dorê". Di vê gotinê de destê xwe bi dorê ser tiliya tev digerinê û navên ajelan divên, "mişk, virda çû" û ê dawiyê jî ser tiliya mezin de diçe û navên ajelên divê " civik hat hat hat" heta binê sitiyê wî/e diçe û qutgudîka wî tîne. Ev lîstik bi vê awayê didome. Xelat û ceza vê lîstike tu ne ye. Ev jî yek ji lîstikên tenê ji bo xweşdemorandinê tê lîstin e.

### 6. Sor û sipî

Ev lîstik herî hindik di navbera sê kesan de tê lîstin, ji bo ku lîstik xweştir be hejmera kesan zêde be baştir e. Kesên ku dilfizin dicivin û berê dorê diyar dikin. Kesê ku dora wî/ê ye di hişê xwe de rengêkî difikire û bi dorê yê ku dora wî/ê ye dipêrse, ew jî bi dorê rengan dibejin, heta ku ew rengê ku di hişê wî/ê de ye pê derxin. Ku kê pê derxe ew tê navînê dora pîrsê dibe ya wî. Ku kes pê dernexe yê ku di navînê de ye navê wî rengî dibêje û dest bi rengêkî din dike. Ev lîstik bi vî awayê didome. Armanca vê lîstikê jî bo ku zarok hîni rengan bibin. Di vê lîstikê de xelat an jî ceza tune ye.

# ELIK Û FATIK

Go, hebû jinikek û zilamê xwe û du zarokên xwe bi navê Elik û Fatik. Go, rabû zilamê wê çû cot .Pîrekê jî rebenê taştê çêdike, jê re dibe. Sal zeman têde çûn. Pîrek nexweş ket û gote zilamê xwe:

- Filankeso! Mêrik go:

- Haa! Go:

- Welle, bi xwedê ez nexweş im û ez ê bimrim. Lê gava ez mirim, ez dixwazim tu destê min jêkî û tu bi destê min li zarokê min xî. Tu yê jinê bînî, tu ciwanî. Lê bira jinik bi destê min li zarokê min xe. Ez diêşim. Êşam pîs e, ez ê bimrim.

Jinik mir. Werhasilî çî serê xwe û te biêşînim. Mêrik wesişeta wê anî cî. Destê wê yî rastê jê kir û xiste nava çarîkekê, pêça. Çarîk xiste nava pembo û danî ser serê kewarê. Û sal zeman têde çûn.

Go mêrik ji xwe re jinek anî. Go navê qîza jinikê jî Eyşik e. Mêrik rabû gote jinikê:

- Hîrmet, qîza te heye û qîza min jî ji xwe heye. Û tu li qîza min nexî. Go:

- Wêêê! Ez ê çawa li qîza te xim. Ez ê we xweyî kim. Ew jî weke ya min, çawa ez xweyî kim ez ê wê jî wiha xweyî kim. Go rabû mêrik gote:

- Vêga hîrmet, ez ê rastiye ji te re bêjim. Destê diya wê di nava çarîkê de ye. Çarîk jî di nava pembo de ye û li ser serê kewarê ye. Malum e, tu jê biqeherî wê gavê tu bi wî destî lê xî.

Go weke hizrê salekê pa. Wê jinikê hemû derê keçîkê dipelixand. Hingî bi wî destî lê dida, lê dida heta keçîk bêhiş diket. Gava radibû, keçîk pê diqebilî xurt dibû bi wê lêdanê. Jinikê got:

- Mal ava! Ez hewqa li vê keçîkê dixim û ya min qels dibe û ew qels nabe. Bi Xwedê ez ê îro bi destê xwe lê xim.

Go, bavê wê çû cot. Go hate xewna qîza xwe, jinikê go:

- Qîzaam! Wê çêleka me bimre. Bavê te gava çêlek şerjê kir, tu û birakê xwe (navê birayê wê jî Elî ye) hes-tiyan teva bidin hev, bibin têxin şikêreka kevira. Ku we xiste şikêra kevira, wê ji we re bibe zêr, wê ji we re bibe zîv, wê bibe cil û pere û tişt û mişt.

Go rabû çêlek mir û vê keçîkê û vî kurikî ketine ba hes-tiyê vê çêlekê, temam anîn û xistine şikêrakê. Wextek derbas bû. Keçîkê go:

- Ka bisekine, em herin ser şikêra xwe. Diya min di xew de ha ji min re gotibû.

Go rabûn çûne şikêrê. Devê wê vekirin. Vaye hemû zêr, hemû zeger û tişt. Go welle rast e, xebera wê ye. Şikêra xwe dane hev, careka din hatin mal. Go jinik filitî wa neriheta canê wa kir. Go:

- Hûn çûne kur heta vêga?

Go welle hal û hewalê me ev e, em ji xwe re çûne bi çolê ve. Jinik bi destê xwe gavê li wa da. Û mêrik ji çolê hat. Go Vaye zarokê wî bi ser hev de melûl bûne, zelûl bûne. Zilam go:

- Hîrmet! Go:

- Ha! Go:

- Roja pêşî min tu anî, min ji te re got, bi destê diya wa li wa xe, bi destê xwe li wa nexe. Welle te bi destê xwe

li wa daye.

Jinikê go, naa filan û bêvan. Zilam go:

Welle te bi destê xwe li wa daye, ku te bi destê xwe li wan nedana, zarok wiha mest û melûl nedibûn.

Welhasil, go li ber hevûdin man. Paşî got erê. Welle min bi destê xwe li wa daye. Mêrik go:

- Hîrmet! Heta destê diya wa hebe, tê bi destê diya wa li wa xî.

Welhasil...Ku bû daweta kurê mîrê ereba, daweta wa ye. Dawetê dikin, rabûn keçîk û kurik çûne ber şikêrê go cil deranîn. Paşê ew cil hê li tu mexlûqa tu nîn in, hingî xweşikin. Go li xwe kirin, jinbava wê gote:

- Lê Fatê! Go:

- Ha! Go:

- Ez û qîza xwe em ê herine dawetê, tu û birayê xwe vê sîtila avê hûn ê tije hêsir bikin. Hun ê vê heskê jî têx-ine nav heta ez werim. Ez ê wa hêsira bixwim. Û paşê giriyan û giriyan. Ew şeveq bû, ev herdu zarok giriyan hetanî ku bû nêzîkî mexreb. Paşê çengikek hêsir jî neketin binê beroşê.

Go pîrekek dilbirehm hat go:

- Law ji şeveqa Xwedê ve we xwe kuşt, hûn çima digirîn? Fatik go:

- Welle haal û madenê jinbava me ev e, ha gotiye me. Go:

- Qîzam here, du cer av bîne, berde beroşê û ez ê vêga elbek xwê bînim têxime nav. Em ê bi vê heskê li hev xin, heta ew xwê bihele. Û wê bê bikeve ser belkî pê bibebece. Rabû go:

- Welle tu wisa bikî tê minetekê li me bikî. Jinik çû elbek xwê anî, du cer av berda ser, bi heskê li hev da heta ew xwê heliya. Heska xwe danîne ser û herdu çavikê wa bi hêsiran werimîne ji grî.

Îca jinik û qîza xwe hatin. Her yekê tepek li nav serê wa da. Kete wê ava şor û xwar û xwar.

- Û ooxweş! Kezeba min hênik bû, paşê nizane jê ne hêsir in.

Go welle jinika gewr lêda çû, heke gezek nan heke tişteq da wana, xwarin. Êvarê go:

- Keçam ka raba. Em careka din herine ba dawetê.

Jinbav gote:

- Fatik tê va ciya deynî, tê va firaqa bişoyî, tê wiha bikî ha bikî. Go, temam. Çûne ba dawetê, Fatik ha firaqê xwe şuştin ciyê xwe danîn, û go:

- Elî, birayê! Ka em herin ser şikêrê. Rabûn çûn. Ku va şimikek têde ye, eyn weke zêr dibiriqîn. Fatik go welle ev şimik ji min re, Elik go wele ez ê jî vî gomlekî li xwe bikim.

Go herduya bir û çûn li xwe kirin. Go welle em jî vê şeveqê herin ba dawetê.

Go serê şeveqê rabûn hima bilez Elik ew gomlek li xwe kir. Fatik jî ew şimik xiste piyê xwe û çûn.

Çemek di navbera mala wa û mala mîr de hebû. Go keçîkê xwe di ser çem re qevast kitek şimika wê kete nava wê avê. Go ji leza lê nebû xwe rahişte. Kita din heke berîk, heke paşî heke kûr be xistê û pêxwas çû ba dawetê.



Go rabû kurê mîr hespê xwe anî hate ber avê. Nihêrt kû va şimikê di nava avê de dibiriqe. Hema hespê wî dike fîre fîr. Avê naxwe. Go heke darê qamçî yê dirêj kirê. Ew şimik ji nav avê deranî. Go carekê:

- Heta ez xweyî vê şimikê nebînim, go ez kesî nayînim. Û daweta wî jî dibe.

- Daweta min bipeşkilînin ez kesî nayînim.

Go rabû ew şimik di wî gundî de kesek nema kû ew şimik li piyê wan da lê nehatin.

- Go kî ma, gotin:

- Welle qîza gavanok ma.

Go çûn Eşşik ka were li piyê xwe ke. Eşşik li piyê xwe da lê nehat. Fatik ka were tû li piyê xwe xe, Fatik hat li piyê xwe xist ji xwe şimika wê bû û tam bû li gora wê. Mîr go temam ez ê vê ji xwe re bînim.

Go îca ew birin, ew edilandin, danîne ser doşekê. Gotin:

- Welle, kurê mîr wê qîza gavan bîne, êê bêaqil!

- Welle, kurê mîr qîza gavan ji xwe re bîne. Xwe layiqî gavana dibîne, filan û bêvan.

Go werhasil, vê jînikê çî kir û çû. Fatik bir xiste tendurê. Û devê tendurê hişk asê kir bi heriyê. Qîza xwe jî ediland û çêkir û derman kir û danî ser wê derê. Berbûyî hatin. Rabû dîk çû ser piştê tendurê go:

- Qîqîlîm! Hiv û ro li tendurê kîr û gunik li mehfurê.

Rabûn gotin willaa li min rebenê ev dîk çî dibêje. Dîk dîsa go:

- Qîqîlîm! Hiv û ro li tendurê kîr û gunik li mehfurê...

Go yeka zimandirêj go:

Welle ez ê herim, devê vê tendurê vekim. Ev dîk tiştêkî dibêje.

Çû devê tendurê vekir paşê çî veke, vaye hema roj e li vir e, hingî delal e. Go rahiştin, deranîn go:

- Welle bûka me ev e ne ya ser mehfurê ye.

Deranîn, gazî kurê mîr kirin. Kurê mîr go erê welle ev e. Go îca keçika tendurê kirin bûk û birin. Ew man li wir.

Heke salek, heke didu qediya. Keçik bi hemil bû. Kurikê jê çêbû. Go rabû gava kurik jê çêbû jinbavê çû qevdek derzî dane hev gote qîza xwe go de haydê em herine dû wê, wê bînine zeytê. Îca kurikê wê çêbûye. Hêja wê tînine zeytê.

Go rabû wê anîne zeytê. Kurê mîr go:

- Heyra bira neyê, lê jînikê;

- Na welle ê bê. Ew paşê qey nayê mala bavê xwe? Û wê bir û çûn.

Jinbavê go:

Keçam ka were ez ê serê te bişom. Keçikê go:

- Min serê xwe şuştîye û ez vêga hatime.

Jinbavê go:

- Na na keçam were ez bişom. Go bir. Ew qevda derziya di nivê serê wê de qoçand û bi şonik lê da ew derzî tev ketine nava serê wê û tê de man. Fatik dua kir go:

- Ya îlahî tû min bikî çivîkek û ji lepê vê jînikê xelas bikî. Ez ketime bela wê. Va ez xelas nabim, tu min jê xelas bikî.

Go xwedê wisa kir diayê berê jî qebûl bûn. Ev keç bû çivîkek û ji nav lepê wê firiya. Çû ser serê darekê xwe danî. Go yekî cotarî rabû çû binê darê bîna xwe berde, carekê ve dît çivîkek hate raserî go:

- Haa cotariyo! Go:

- Haa! Go.

Kurê mîrê ereba li mal e? Go:

- Ee. Go:

- Ew dêlika lêv deqandî li bal e? Go:

- Ee. Go:

- Gelo halê hiseynkê min çî hal e? Mêrik go:

- Welle ne ti hal e...

Nizane çî ye jî û ma wisa dibêje. Çivîk giriya. Go hêsirê wê hemû bûne sedef ketin binê wê darê. Go wê rojê cotarî sedefê xwe dane hev û çû go roja din dîsa hat, dîsa eynî runişt û eynî dîsa wisa. Go rabû dîsa sedefê xwe dane hev careke din hat dîsa go:

- Ha cotariyo kurê mîrê ereba li mal e? Go:

- Ee. Go:

- Ew dêlika lêv deqandî li bal e? Go:

- Ee. Go:

Gelo halê hiseynkê min çî hal e? Mêrik go:

- Welle ne ti hal e...

Dîsa li ser darê giriya û giriya. Hêsrên wê bûne sedef û hatin xwarê. Cotarî sedefê xwe dane hev û xiste turik û lêda bir çû mala mîr. Cotarî go:

- Heyra civata we geriyaye, ez ê tiştêkî bêjim xeyd tede tuneye. Go:

- Na. Go:

- Hal û madenê min û çivîkekê ev e. Go:

- Ez hê du xeta li cotê xwe nadim. Te dî got:

- Cotariyo! Kurê mîrê ereba li mal e? Gelo halê hesenê min çî hal e? Kurê mîr got:

- Temam. Kesek jî ji te dey nake. Serê sibê ez ê bi te re werime cot.

Serê sibê qaputê xwe li xwe kir. Çû binê darê runişt, go mêrik xetek dido li cotê xwe da. Hat runişt. Carekê ve çivîk hate ser darê. Go:

- Ha cotariyoo! Go:

- Ha. Go:

- Kurê mîrê ereba li mal e? Go:

- Ee. Go:

- Ew dêlika lêv deqandî li bal e? Go:

- Ee. Go:

- Gelo halê hiseynkê min çî hal e? Mêrik go:

- Welle ne ti hal e...

Go dîsa giriya. Hema mêrik di bin qapût de destê xwe avête çivîkê û zeft kir. Go:

- Delaaa! Çî çivîkeke xweşik, destê xwe di ser serê wê re bir. Carekê nihêrt ku va hemû kulînê weke strîyana ne li nivê serê wê ne. Go rabû temamê wa derziya ji serê wê kişand. Go xwedê dîsa ew keçik kire însan. Kurê mîr go:


- Hirmet ev çî hewala te bû. keçikê go:

- Welle haal û madenê jinbava min ev e û qîza xwe anî da te. Min dia kir û diaya min qebilî. Ji nav lepê wê derketim. Ka ew ê hê çî bikirina ji min.

Çîroka min çû nav dar û deviya, rehme li dê û bavê me hemiya...

**Çavkanî:** Sebriya DERWÊŞO (75 salî Nexwendî)

**Herêm:** Batman/Bişêrî/Bleyder cotmeh 2015



Berhevkar:  
Feratê DENGİZĪ

# ZĪZANÊ

Go hebû Zîzanê û xwa xwe ya ji jinbavê. Go wê biçûna hûrika. Go jinbavê şahmar xist şerbikê wan û ji qîza xwe re got:

- Tu ji vî şerbikî avê venexwe, bila Zîzanê vexwe.

Li çolê tî bûn. Zîzanê ava şerbik vexwar. Şahmar çû nava wê û nepixî bû wek pîreka bi halkî.

Jinbavê ji bavê Zîzanê re got:

- Wê bikuje, ji xelkê bihemle bûye. Bav got:

- Destê min naçê.

Bir navsera çiyê û li wira berda. Zîzanê li wira ket xewê, bavê wê kundirek bi darekê ve daliqandibû. Her ku ba dihat deng ji kundir dihat. Zîzanê digot qey bavê min êzinga dike.

Zîzanê bi xwe hesiya ku li navsera çiyayekî ye, nivê şevê ye, ne ins û ne cins e. Da rê hat, hat, hat li kaniyekê rast hat. Çû ser kaniyê, masî di binê kaniyê de hebûn. Masiyekî bangî şahmar kir got:

- Maro, şahmaro, derê ma tu li nav hûr û kizûra çi dikî, derê.

Wexta Zîzanê devê xwe vekir ku avê vexwe, şahmar kişiya, derket. Nava wê zirav bû. Bi piştta wê ve zeliqî wek bastêqê. Da rê, hat ber şetekî, kelekvan li wir hebûn. Bang kir got:

- Ha kelekvano, were min derbasî wî yalî bike. Û Zîzanê got:

- Navê te bi xêr?

- Navê min Emer e. Got:

- Mala minê

Navê birê min jî Emer e.

Kelekê bîne ber e.

Ez ê bi te dim zêrê zer e.

Kelekvan jî got:

- Navê te çi ye?

- Navê min Zîzan e. Got:

- Zîzanê, bide min ramîsanê, ez ê te derbas bikim."

Wê jî got:

- Bi serê bav û keka,

Tu car nakim vê yeka,

Ez ê xwe bavêjim gol û girrîneka.

Çû ba yê din. Got:

- Kelekvano, navê te bi xêr.

- Navê min Miheme ye."

- Mala min şewitî, navê birê min jî Miheme ye." Got:

- Navê te çiyê?

- Zîzan e. Got:

- Zîzanê, bi de min ramîsanê, ez ê te derbas bikim."

Wê jî got:

- Bi serê bav û keka,

Tu carî nakim vê yeka,

Ez ê xwe bavêjim gol û girrîneka.

Zîzanê xwe avêt gol û girrîneka. Bi avê de çû û xeniqî.


Tu nebêjî herdu kelekvan birayê wê bûn. Wan jî avêt ser, ji bo wê gotin:

- Masiyo perrî şîno, canê Zîzana xwa min neê-şîno...

Çîroka min çû serê giyara. Rehme li dê û bavê guhdara...

**Çavkanî:** Pîra Asê

**Herêm:** Dengiza-Stewrê-Mêrdîn



Berhevkar:  
Ömer Tekin

## Sosê û Besê

(ji diya min a şîrîn re)

Rojek ji rojan, rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran.

He bûye, tune bûye, Sosê û Besê he bûye. Van herdu lehengên me bûk bûne û xwesiyeke wan hebûye. Pêwendiya di nava wan de ne wek ya dinya alemê bûye. Xwesiya wan hetanî tu bibêjî ji bûkên xwe re xirab bûye. Piştî zewaca wan tiştê ne tişt haniye serê wan, tadeya ku li gurê serê çiya nedihat kirin li wan dikir. Ji bûkên xwe qet hez nedikir û wan birçî û tî dihîşt. Ewan jî nediwêribûn xwesiya xwe re tişteke bigotina. Herdu kurên xesiya wan ku bi Sosê û Besê re zewicibûn, ew jî li ber zeviyên xwe, li deşt, mêrg, ax û warên xwe bûn û hayê wan ji bûyerê di nava malê de diqewimî tune bû.

Sindoqek xwesiyeke hebû. Xwarin û tiştên hêja dixist sindoqê û der dorê sindoqê jî çamûr dikir. Ji bo bûkên wê wexta bikevin sindoqê, şopa nigê wan diyar bibe. Dema bûk birçî dibûn, xwesiyeke xwarin nedida bûkên xwe. Hemû dem û dewrana rewşa mala wan bi vê halê, bi bêsiûdiya bûkan, bi zalimî û dilkevirîya xwesiyan diçû.

Rojekê xwesî bi bûkên xwe re ji bo kurên xwe yê li nava erd dixebitin xwarinê dişîne û ji bo bûkên wê ji vê xwarinê nexwin, xweliyê dixê devê wan û dibêje;

- Heta hûn nehatin malê bila van xweliya di devê we de be, nebê nebê hûn ji devê xwe derxin.

Sosê û Besê ji tirsaxwesîya xwe newêrin tiştêkî bêjin û dikevin rê û diçin şûna zewiyê. Xwarinê ji mêra re amade dikin û bang dikin. Mêrê wan tên nan dixwin, jinên xwe re jî dibêjin, werin nan bixwin. Lê Sosê û Besê gotinên xwesî hanîn bîra xwe û ji mêrên xwe re gotin. Mêrên wan jî dibêjin-diya min din bûye ka em çî bikin, ber xwe bidin heta Xwedê canê wê stend û dibêje:

- Devê xwe bişon û werin xwarinê bixwin. Wexta hûn çûn malê dîsa xweliyê bixin devên xwe.

Sosê û Besê bi gotina mêrên xwe dikin û piştî xwe têr dikin, vedigerin malê. Rê de fikrek tê hişê wan. Bi hev re dişewirin û dibêjin; em ê li kerekî siwar bibin û herin bikevin sindoqê. Wexta xwesîya me sûc-dar kir, em ê bêjin ev ne şopa nigên me ye, ev rêça lingê kerê ye.

Rojek ku xwesîya wan li mal nîn bû, Sosê û Besê ev firsenda dikeve destê wan û bikar tînin. Wek ku diyar kiribûn li kerê siwar bûn û di sindoqa xwesîya xwe de çî hebû çî tunebû tarûmar kirin. Ji vê hêlê de ketinê di hêla din de derketin. Tiştên xwarin xwarin, tiştên din belawela kirin. Wek ku heyfa salan bistînin. Wek kormişkê di nav zewiya beyar de ji xwe re rê dîtibe kolandin, vekolandin. Wexta ku xwesî bi baweriya tirsê, ku bi salan e li ser bûkên xwe daye rûniştandin tê malê, çî bibîne; sindoqa wê virtû-vala ye, wek malê mîratê li hev hatî belav kirin e. Diçe odeya bûkên xwe û ji wan re dibêje:

- Kîjan mirtiv, kîjan bê bav ketiye sindoqa min!

Sosê û Besê xwe li nezaniyê datînin dibêjin:

-Dayê em tiştêkî nizanin, hay me ji tu tiştî nîn e.

Xwesîya wan bawer nake û wan dibe cîhê sindoqê û nîşanî wan dide. Bûk jî dibêjin:

- Ev dewsa lingê kerê ye. Ku em bana dê cîhê lingê me xûya ba.

Lê xwesî bawer nake û bixwebaweriya ji salan girtî hewl dide ku tadeya li bûkên xwe dike berdeyam bike. Çepilek bûkên xwe digre û li wan dixê, bi şîva ter wan dikute. Sebr û deyaxa Sosê û Besê jî namîne û xwesiyê digirin li dîwaran dixin. Wek goka di nav piyên zarokan de be, derbekê Sosê xwesiyê li dîwar dixê, derba din jî Besê. Xwesî bi van derban ji ser xwe diçe. Wek tola salan bigrin, bûk hetanî dilê wan rehet bibe xwesiyê ji eyar de dixin. Xwesî aqilê heye jî wenda dike. Gunehê gurê serê çiya bi perîşaniya wê dihat. Dema kurên xwesiyê berêvarek gewrîboz de tên malê, diya xwe di halekî xirab de dibînin û dibêjin:

- Yadê çî bi te hatiye? Diya wan jî wek gotina dawî awirê xwe dikute kêranên li seraserê xanî hatî rêz-kirin weha dibêje:

- Laçika min ji Sosê re, xweliya min jî ji Besê re.

**Sala Berhevkirinê:** Gulan 2016

**Herem:** Gundê Domê / Mûş / Serhed



## NUMÛNEYÊ BAWERÎYANÊ QEDÎMAN: ZÎYARÎ

Arêkerdax:  
Serhat KILIÇ

Merdimo ke welatê ma yê kurdan gêra, heme şarîstanan de, qezayan de, ma şênê vajê heme dewan de zî sey zîyaran (jîyar) cayê pîrozî estê. Kurdan mîyan de taybetî kurdanê zazayan mîyan de no bawerî, ma şênê vajê kultur zî, cayêdê muhîmî gêno. Dêrsimî ra bigêre heya Pîran, Çêrmuge de bi hezaran zîyaran ma şênê bivînê. Se ra se zî nêbo zafinî xusûsiyetê înan pêmanenê. Zîyarî zafinî leweyê (gîlê) koyan de, cayanê berzan de ca benê. Pîroziya xo seke berziya xo ra bigêrê. No pêmendîş hetê rituelan ra zî xo nawneno. Tena yew cî-yayîya asîyaye esto ke o zî adir o. Zîyaranê Dêrsimî de, kîrdanê Raya Heqî de, bi muman her tim yew adiro wekerde esto la demo ke ma ameyê acêr, mintiqayanê kirdanê sunnîyan, no edet wederîyeno.

Bawerîya zîyaran seke aseno binkeyê xo verê îslamîyetî ra gêno la îslamîyetî ra pey yew sentez virazîyayo. Xeylî edetanê xo reyde îslamîyetî ra durî yo labelê şarê ma ke şî zîyaran ser o sureyanê Kur'anî (fatîha, yasîn) zî waneno. Gelekî edetê ke teberê îslamî yê zîyaran de asîyenê. Mavajê mabênê însan û Homayî de mîyançî çin o labelê zîyarî bi xo nê wezîfeyî vînenê. Ge ge no zî asîyeno ke şar hevîya xo hendê Homayî zîyaran ra zî besteno. Demo ke sereyê înan dekwet tenganiye destê xo zîyaran rê akenê.

Nînan ra teber şar dûa û zewtanê xo zî zîyaran ser o keno. Demo ke sond waneno reyha zîyaran ser o waneno. "Na zîyarî to kor bîka", "Zîyarî to kerr û lal bîka.", "Wa ina zîyarî to biseterna"... No hewa gelekî dûa û zewtî fekê şarî de ca gênê.

Zîyarî her tim bi rîvê xo yê başî nêyenê şinasnayîş. Şar çend zîyaran ra hes bîko zî hende zî terseno. Bi goreyê bawerîye heme zîyaran de kalik (bawkalik) esto û demo ke hêrs bi zîrar dano însanan ro. Eke merdim xirabîye bikero yan zî şewa bêgam îstirehetê kalikî biheremno o çax kalik hêrs beno û dano însanan ro. Nînan ra teber eke zîyare merdimî ra biasa merdim nêşêno destawa xo bikero yan zî teber bivejîyo, ganî zîyare ra dûrî bo û xo zîyare ra binîmno. Hewayo bîn zîyare rê bêhûrmetîye bena coka her kes bi nê qeydeyî têgêreno.

Seke mi numûneyî dayî cuya şarî de tena bawerîye de nê gelekî çîyê ke cuya şarî reyde têkildar ê, înan de tesîrê zîyaran esto. Serebutê ke yenê şarî ser o reyha besteyê zîyaran ê. Derheqê ney de ez yew numûne bida. Nor dorê dewa ma de gelekî dewî bi destê dewlete ameyê veşnayîş. Rojêke bîrayê min o pîl hewnê xo de kalikê zîyarî vînenê. Kalik tira vano "Meterse, ez bekçîyê ina dew o.

Ez şîma qeza û belayon ra paweno". Merdimê ma zî bawerîya xo anê ke dewa ma bi saya zîyaran nêweşaya, zîyaran ma pawito.

Ez wazena êdî zîyaranê dewa Pîranî ya Akragê ser o vîndera. Ez bawer kena ke xusûsiyetê nê zîyaran mintiqayê bînan de zî estê. Şînasnayîşê zîyaran ser o nê numûneyî bes niyê la beno ke yew fikir bido ma.

Akragê de panc heb zîyarî estê. Verê hina zaf bî la tayê înan binê awbendî de mendê, tayê înan zî êdî vînd biyê û faal niyê. Bi goreyê pîrozîya xo mabênê nê zîyaran de hîyerarşî esto. Na pîrozîye berzîya zîyaran reyde têkildar a.

Zîyara Mîşraqe mabênê dewanê Akragê, Bazbend û Xaçekî de yew koyî ser o ya. Hetê pîrozîya xo ra nêzdîyan de mer-tebeyo tewr berz yê Mîşraqe yo. Yewna xusûsiyetê Mîşraqe esto ke zîyaranê bînan de çin o, o zî Mîşraqe cinî ya. Bi goreyê vatişan Mîşraqe kênek a û qet nêzewijîyaya. Dormeyê zîyare de gelekî dewî yenê Mîşraqe ser o nê het ra zaf namdar a. Zîyare mîyan de sey zîyaranê bînan dêsê (bend) nîmzî ra yew ca esto, hendê metreyêk yew dês o û serê ey akêrde yo. Merdim berê zîyarî ra dekweno zere yewna dêso çargoşe esto, cayê zîyare yo tewr muhîm uca yo. Merdim ke ame zîyare ser o verê hemîn daranê zîyare lew pa deno dima kemeranê zîyare lew pa deno, tay dûayan keno, demo ke vejîya ganî peyê xo tanêdo zîyare ro, pêpeykî (tînapey) vejîyeno teber. Menga gulane de şar şono zîyare ser o qurban dano, werê xo pewjeno û weno.

Mîşraqe ra acêr zîyara Kewlê aşîkan esta. Kewl Mîşraqe ra nezdîyê yew-di km dûri yo, hina nîmz de manena. Kewlê aşîkan binê Qotê Qelefî de ca gêno. Dormeyê zîyare de yew birro (daristan) hîra esto. Birnayîşê nê daran qedexê yo, gune hesibîyeno, bi goreyê vatişan eke yewer daranê zîyare bibirno zîyare hêrs bena û dana ey ro.

Şar hina zaf seba dejê leşa xo, hewayê çokan, dejê mîyaneyî şono zîyara Kewlî ser o. Merdim ke şî na zîyare verê hemîn daran û kemeranê zîyare lew padeno. Hîrê rey lew pa deno û sereyê xo dusneno pa. Dima dormeyê zîyare ro hîrê rey gêreno se tewafî mavajê. Nê rituelan ra pey sewlanê xo vejeno û warpay dekweno zîyare mîyan uca de qelibîyeno, xo derg keno û vindeno ke zîyare şîfa bida ey. Kîştâ zîyare de yew sekûye esta tehtan ra virazîyaya, her çarşeme, dapîra mi uca de qelibîyayêne û hîrê heb kemeranê zîyare xo ser o ronayêne, yew çokî ser, yew nake ser, yew zî sîneyê xo ser o. No hewa bawer kerdêne ke dejê leşê aye vîyareno. Raşte zî nê çîyan ra dima xo weş hîs kerdêne. Mîyanê bendê zîyare de yew kemera girde esta. Şar yew xînça hurdî gêno, çî waştîşê ey bibo wazeno û keno ke xînçe kemere ro padusno, eke padusîyaye waştîşê ey yeno ca eke nêdusîyaye rey na cerebno. Nînan ra teber bînê a kemere ra herra zîyare gêno dekeno fekê xo, a herre zî tebarik hesibîyena. Heme çîyî ke qedîyayî şar verê xo zîyare de, pêpeykî vejîyeno teber. Zîyare ra acêr yew teyêre esta uca teyî yenê werdiş, o zî tebarik hesibîyeno.

Hetê berzîya xo ra taxma (çaqê) Kewlê Aşîkan de yewna zîyare esta, nameyê a zîyare zî Istonar o. Istonar zî wayîrê xusûsiyetanê çîyayînan o. Yew gede yan zî merdimo pîl ke tersa benê Istonar ser o. Nê ra teber cinîyê ke gedeyê înan nêbenê şonê Istonar ser, girişî ra yew kengula virazenê û debestenê dima çend rey têşanenê, Homayî ra pîtan wazenê. Kîştâ zîyare de yew kizbanêre esta, şar giriş û xilçikan dare ra besteno û çîyêk wehdneno. Hina zaf cinîyî şonê na zîyare ser o.

Yewna zîyare zî ha binê dew de nameyê zîyare zî şêxût o. Bi goreyê vatişê Şêx Mihidîni (birayê Şêx Seîdî) verê tira Şêx Qût vajîyayêne. Binê a zîyare de yew hênî esto, awa hênîyê Şêxûtî gelekî zaf bî la nê serranê peyênan de awbendan ver o kemîyaya. Awa na zîyare tebarik hesibîyena, raşte zî tehma xo zaf weş a. Şar şono ê hênîyî ra elbikanê xo todeno beno keyeyê xo ke nêweşê înan bişimê û tira şîfa bivînê. Binê ê hênîyî de bostanî estê, firingîyê nê bostanan namdar ê. Seba ke awa Şêxûtî reyde aw diyenê, şar zaf erj dano tarrê nê bostanan. Şêxûtî de seba ke awe zaf a şar zafinî uca rê qurban wehdneno, wero ke wehdnayo uca de vila keno.

Binê dewe de, nezdîyê royî de yewna zîyare esta nameyê a zîyare zî Şawlêr a. Seke name ha pa zîyare de yew şawlêra girde estbî la çend serrî ra ver yew welwelike werîşte û dare vayî ver o qelibîyaye. Nê serranê peyanan de şar zaf qiy-met nêdano na zîyare rê, ver bi wederîyayîşî şona.

Şar ke şî nê zîyaran ser o gelekî dûayan keno û waştîşanê xo zîyare ra vano, gelekî varyantê dûayan estê la înan mîyan de o ke mi tewr zaf eşnawito na dîa ya :

*Ya zîyar*

*Ez xwî arzeno to*

*ti xwi barzi Homayê pîlî*

*ya zîyar jon û jîyê mi bigêri*

*tariyê xiznayey xwi di roni*

(ya zîyare, ez xo erzena to ti xo bierze Homayê pîlî.. ya zîyare, jan û jîyê mi bigêre tariyê xezînaya xo de rone)

Ca: Dewa Pîranî ya Akragê

# Hedlîlikê Medlîlikê



Li gundekî xerîb ê kesnedîtî û kesnebîhîstî de du karikên bizinekê çêdibin. Navê yekê hedlîlikê, navê ya din medlîlikê ye. Bizin her roj diçe diçêre li zozana û tê şîr dide karikên xwe. Her roj wexta derdikeve derva, ji hedlîlikê û medlîlikê re dibêje :

- Heta ku ez neyê ser xanî û nebêjim, "Hedlîlikê medlîlikê, derî veke li dayîkê, dayîk çûyê li zozana, şîr kirîyê heft guhana." Hûn ji min re jî derî venekin.

Rojekê dîsa wisa dibêjê ji karikên xwe re û çima gur jî nabihîze . Gur li benda bizinê disekine ku ji mala xwe derkeve û biçê zozana. Dema ku bizin ji mala xwe derdikeve diçe zozanan ,gur dibê îjar dora min e. Gur qederekê paşê diçe ser mala bizinê û dibêje ; "Hedlîlikê medlîlikê, derî veke li dayîkê, dayîk çûyê li zozana, şîr kirîyê heft guhana."

Medlîlikê dibihîze, dibêje:

- Na tu diya min nîn î, tu gur î.

Dîsa gur dibêje:

"Hedlîlikê medlîlikê, derî veke li dayîkê, dayîk çûyê li zozana, şîr kirîyê heft guhana

Medlîlikê dîsa bawer nake û hedlîlikê jî tê

wan dibihîze. Gur dibêje:

- Tu ji min bawer nakî, ka hinkî derî veke, ez gûhanê xwe bikim çandera derî, bi min bimijin ka ez im ya na .

Medlîlikê û hedlîlikê qebûl dikin û derî biçkî vedikin. Çawa qirçînî bi derî dikeve, gur derî tîm dide û herduya jî dixwe.

Dibe êvar ku bizin tê ser xaniye xwe gazî dîke dibê:

"Hedlîlikê medlîlikê derî vekin li dayîke dayîk çûyê li zozana şîr kiriye heft guhana

Mêze dike ku kesek deng nake, çawa qilochê xwe li derî dixwe, derî bi xwe vedibe û tu kes tune ye. Bizin li xwe dixwe ,digrî dîke qêrîn, hawarê li dar dixwe. Cîranê bizinê tîm ku dibê ka çibû bi bizinê . Bizin hal û wextê ku hatiye serê wê ji cîranê xwe re dibêje. Cîranê wê jê re dibên; ka li karikên xwe bigere, mal bi mal, tu yê bibînî. Bizin diçe ser xaniyê hirçê tepê repê dike ,hirç dibêje:

- Ew kî ye tepê tepê, repê repê dîke ,xwelîya binê qatî dike çavên heftsed bawê xwe. Bizin dibêje:

Berhevkar:  
Feqîyê Dînik



- Ew ez im tepê tepê ,repê repê dikim, xwelîya binê qatî dikim çavên heftsed bawê te.Hirc dibêje:

- Tu ji min çî dixwazî.Bizin dibêje:

- Te karikên min xwarîne ka karikên min .Hirc dibêje:

- Na min nexwarine here ser mala rovî. Bizin diçe ser xanîye rovî. Tepê tepê repê repê dikê.Rovî dibêje:

- Ew kî ye,tepê tepê repê repê dikê,xwelîya binê qatî dikê çavên heftsed bawê xwe. Bizin bibêje:

- Ew ez im tepê repê dikim xwelîya binê qatî dikim çavên heftsed bawê te .Rovî dibêje :

- Tu çî ji min dixwazî,bizin dibêje te karikên min xwarîne ka karikên min.Rovî dibêje:

- Min ne xwarine here ser xanîyê gur. Bizin diçe ser xanîyê gur, tepê tepê repê repê dike.Gur dibêje:

- Ew kî ye tepê repê dikê xwelîya binê qatî dikê çavên heftsed bawê xwe .Bizin dibêje:

- Ez im tepê repê dikim xwelîya binê qatî dikim çavên heftsed bawê te.Gur dibêje tu çî ji min dixwazî.Bizin dibêje:

Te karikên min xwarine . Gur dibêje:

- Ez birçî bûm min jî karikên te xwarin. Bizin dibêje:

- Jixwe ew hê piçûk bûn,te çima ew xwarin. Ez ê te bibim şêrîetê. Gur dibêje:

- tamam. Û diçin şêrîetê ba kosî û tûtik . Pêşî gur

dibêje:

- Ez birçî bibûm min karik xwarin.Bizin jî dibêje:

- karikên min hê pirr biçûk bûn bila hinek mezin bibûna te hê ew bixwarana.Kosî û tûtik dibêjin:

- Tamam, em ê çawa fêm kin ku karikên te biçûk an mezin bûne. Bizin dibêje:

- Ka ez ê tiştêk bêjim ku we jî qebûl be em ê wisa bikin, ê dibêjin:

- Ka kerem ke.Bizin dibêje:

- Ez ê qilochê xwe tuj kim û li zikê gur xim. Ew ê karikên min derkevin û hûn jî wê çaxê binerin ka kî hêqliye.Dibêjin:

- Temam ...Qilochê bizinê tûj dikin tûj dikin ,li zikê gur dixin çawa bizin qilochê xwe li zikê gur dixê karikên bizinê derdikevin. Kosî û tûtik mêze dikin ku karikên wê her du hîn jî biçûkin.Dibêjin:

- Bizinê berdin bila karikên xwe bibe mala xwe û gur giredin heb bi heb diranê wî kaşkin .Gur tê girêdan, diranê wî tê kişandin û bizin jî hedflîka xwe û medflîka xwe dibe mala xwe.

Ew li wî gundê nedîyar çûn ser jîyana xwe, em li vî diyarî ji kar û barê xwe bûn.

Rehme li hazir û guhdar û guhmertala.

Xebrojka me li vir qedîya.


**Çavkanî:** Ji diya xwe guhdarî kiriye û bixwe nivisandiye.

**Dem:** 2016

**Herem:** Farqîn/ Amed



Berhevkar:  
Hasan AKBOĞA



## JEHR JI MARÊ KOR, TENDURISTÎ JI XWEDAYÊ DILOVÎN

Rojekê li gundekî mirovek zefnexweş hebûye. Navê wî jî Hogir bûye. Lê ji vê nexweşiya Hogir re tu çare û derman tunebûye. Malbat, cîran û gundiyan heta ku nexweşiya Hogir xeter, giran û bêçare nebûbû li wî xwedî derdiketin û hemû pêdiviyên wî didîtin. Nan û ava wî dîdanê, serê wî dişûştin, xwarin û vexwarina wî dinêrin. Lê dema ku Hogir êdî kotî bû, nexweşiya wî kete asta herî xeter, êdî ev karên rojê ji kesên derdora Hogir re girantir dihat. Tu hekîm, şêx, mela, bijîşk nema bû ew lê gerandin, birin li cem hemû kesan. Lê mixabin tu kesî ji vê nexweşiyê re çare û derman nedît.

Hemû rê hatibûn ceribandin heta birin li cem Loqmanê Hekîm jî. Lê nêrîn, zanist, huner û bi tecrubeyên Loqmanê Hekîm jî ji vê nexweşiyê re rê nedît, ku birînen Hogir bikewîne. Û Loqmanê Hekîm di dawiya dawî de ji malbatê re got:

- Mixabin çareya vê nexweşiyê nîn e.

Malbata Hogir şaş û metel man û bi awayekî çavpirsiyarî li Loqman nêrîn û jê pirsîn:

- Ya Loqman me bihîstiye ku te heta niha ji xeynî mirinê dermanê hemû nexweşiyên dîtiye. Tu çawa dibêji dermanê vê nexweşiyê tune? Loqman bersivand û got:

- Bi sonda qesemê û zanebûna ku xwedê daye min, ez dibêjim derman û çareya vê nexweşiyê tune ye....

Malbata Hogir piştî van gotinên Loqman Hekîm vegeyabûn malê û ew anîbûn gund. Ji ber giranbûna nexweşiyê û zêdebûna birîn û kêmen Hogir, êdî malbata wî heta dê û bavên wî jî nikaribûn lê binêrin. Heta bîzê wan nedîçû ku nêzîkî wî bin. Û bi wî awayî malbat jî lê xwedî der nediket. Malbat û

cîrana di dawiya vê rewşê de biryarek dan û gotin:

- Êdî wiha nabe. Em nikarin ber xwe bidin, divê em ê kotî bibin. Biavêjin cihekî dûr ku çavên kesekî bila wî nebîne. Jixwe ne pak dibe, ne jî dimire.

Piştî vê biryara civatê, gundiya Hogir hildan birin cihekî ji gund dûr û li ser çiyayekî bilind. Avêtine wir û piştî xwe danê vegeyriyan hatin gund.

Hogir ji ber nexweşiyê wisa bûbû weke kulmek qurmiçî bû, çilmisî bû û hema bibû weke gepekê. Li ser çiyê dema ku Hogir bi ser xwe ve hat, kete nava fikir û ramanên kûr. Û dirêj dirêj ponijî. Xwe bi xwe ji xwe dipirsî: "Gelo rewşa min ê çawa be?" Û êdî tu hêviyên wî jî nema bûn.

Hogir demek şûn de dît ku şivanek ji dûr ve xuya dike û ber bi wî ve tê. Şivan jî Hogir dît. Her çiqas nêzîk dibe ruyê şivên jî pê re tirs dibû. Dît ku mirovekî kal, pişthotik, çilmisî li erdê ye. halekî perîşan de maye. Şivan nêzîkî wî mirovî bû. Û bala xwe dayê halê wî ne hal e. Şivan dît ku birînen Hogir der bûbûn, xwîn û kêr jê diherikî. Hogir bi lavakî ji Şivên re got:

- Ez birçî me!

Şivan piştî vê pirsê, li halê Hogir nêrî. Kete fikara û kir nekir bîza wî nedîçû ku di tasa xwe de xwarin an jî şîr bide wî. Demek şûn de şivan li derdora xwe nêrî ku tiştêkî kûr bibîne û di wê de xwarinê bide Hogir. Şivên li kêleka keviyekî qalikekî kûsiya dît. Ew qalik anî, şîr ji miheke qer dot û qalikekî kûsiyê ku tije şîr, danî ber Hogir. Bala xwe dayê ku Hogir di xew ve çûye. Şivên seba ku Hogir ji xew şiyar nebe hêdîka qalikekî kûsî danî ber serê wî û çû ber pezê xwe.

Demek şûn de Hogir him ji ber jana birînan him jî ji ber birçîbûnê ji xewê veciniqî û çavên xwe vekir. Li derdora xwe nêrî. Dît ku şivên şîr daniye ber serê wî. Hewl da ku qalikekî tije şîr hilde destê xwe û vexwe. Ji nişka ve marekî reş xwe şiqitand hate ser tasika şîr. Devê xwe xiste nava şîr û hemû vexwar. Qasek şûnde mar vereşiya û ew şîr tevî vereşangê gişk tije tasê kir. Piştîra kişiya çû winda bû. Hogir ev bûyera ku qewimî bi awirên ecêbmayî temaşe kir û şaş û metel ma.

Hogir demekê hema wisa sekîni. Kûr kûr ponijî. Nizanibû wê çî bike. Lê pêra xurexura aşîkê wî bû. Ji birçîna nizanibû çî bike. Ne taqet hebû di bedena wî de, ne jî kesekî ku deste xwe dirêjî wî bike hebû. Şivan jî xuya nedikir. Hogir beriya ku şîr vexwe hinekî fikirî û xwe bi xwe re wiha got:

- Niha bîzê min naçe ku ez vî şîrê vereşangî vexwim. Lê xeynî vê jî tu tiştêkî ku ez zikê xwe pê têr kim tune. Heke ez venexwim ez ê birçî perîşan bim. Belê dibe ku tiştêkî jî bi min were. Lê jixwe li ber mirinê

me. Bi van nexweşiyên ez zêde najîm. De hema çî dibe bila bibe ez ê vexwim.

Hogir bêçare û bi bêdilî ew şîrê di tasê de hêdî hêdî vexwar. Û xêlek şûn de ji nişka ve ji xwe ve çû, xeriqî kete erdê.

Demeke dirêj li ser vê bûyerê re derbas bû. Hogir çavên xwe vekir û li derdora xwe nêrî. Destê xwe li laşê xwe gerand. Şaş û metel ma. Her wekî qet tiştêkî wî nemaye. Wekî ku tu nexweş nebûye. Dîsa dest avête birînen xwe lê nihêrî. Ew birînen ku kêr û xwîn jê dihatin hemû qalik girtine û êdî naêşin. Destê xwe avête qalikên ser birîna û ew qalik tev hatin xwarê, fena kirasê mara.

Hogir rabû ser piya û qolinca piştî xwe jî şikand, ew qambûra piştî wî jî êdî tune bû. Wekî xortekî bedena wî dilivîya. Cil û bergê xwe dawêşand. Ser guhê xwe paqij kir. Her wekî rewşa ewil derew bû. Ew girêya malkambax bi vî awayî vebû û Hogir gihîşte tenduristiya xwe. Hogir biryar da ku ber bi gund ve here. Bi awayekî zindî û rûken bi rê ket. Wextê ku gihîşte gund, berê xwe da mala Loqmanê Hekîm. Hogir ji Loqman pirsî:

- Ka te ji bona min digot derman û çareya nexweşiya wî tune ye! Loqman:

- Min dizanibû ku dermanê te heye. Lê lihevanîna wê zehmet e. Divê şîrê miya qer di qalikekî kûsî de bê dotin. Mar wê vexwera û dîsa verişiya. Te yê jî ew verişiyaya weke derman vexwara û pak bibûyayî. Me dikaribû miyeke qer bidîta û şîr jî jê bidota. Me dikaribû qalikekî kûsiya jî bidîta. Heta me dikaribû ew jî bi marekî bida vexwarin. Lê, marê çawa tê de vereşiya? Kîjan hêz wê mar bida verişandin?

Belê Loqman bi vî awayî bersiva Hogir da û ew xist nav fikir û ramanan.

Peyam û wateya kirînen Loqman û encama vê kurte çîrokê ev e; divê meriv her tim baweriya xwe bi Xwedayê xwedanê navê "Şaffî" yê re baş bîne. Û hêviyên xwe ji hêza Xwedê tu caran nebire û neşkinê.

Jehr ji marê kor, tenduristî ji Xwedayê dilovîn...

**Çavkanî:** Diya berhevkar

**Herem:** Agirî

**Dem:** .01.12.2012

Arêkerdoxe:  
Semra BÎRTANE



# VATEYÊ VERÊNAN

Dîk mireno çim silo di moneno.  
Silo bonî ser ra nêkiweno.  
May paley erînay keyna vaştirî tirawit.  
Aqilo sivik baro giron.  
Zono leqleq serî rê teqreq.  
Kutiko ko nêzono bilawo , wayirê keyê re mêmano herînenno.  
Hoday esto xem çino.  
Margirewte herindey resne ra tarseno.  
Her dîk siloyê xo ser veyndeno.  
Roc yeno roc ser ro.  
Werek bîro serdey parî ro.  
Hergo vaş koktê xo ser yeno.  
Heto aqilo peye yeno verên şono.  
Delda sîya ra gûrîx nêkuweno.  
Sere ko nêdeceno şaş pabesteno.  
Nêzono veyvey komî yo kuçiko rîdeno.  
Îstore çina ar hadre kenî.  
Wargo kor geyreno rocdo muj.  
Vengê dawûl dûrî ra weş yeno.  
Dişmenî babo nêbeno dostê lawo.  
Hema dere nêdiyo çoko weronceno.  
Ûngura ke luyê nêresena vona çi tirşa.  
Karê mexrebî mevardîne nimac.  
Aqil aqil ser ra wo.  
Mekê keso bena nefso.  
Kê çi biromî ay çînenê.  
Dest esto destê ser ra.  
Comîrd mireno nome moneno , ga mireno post moneno.  
Loqmeyo xişn borê ,qala xişn meki.  
Kê komî henek bikê yena serey kê.  
Aqil emrî de nêyo serre do.  
Ningey xo goreyê leheyfê xo darg bikê.  
Luya geyraya , şêrdê bestî ra hewlêr a.  
Nêzonayey eyb nîya,nîpersey eyb a.  
Desto vengi ra repî nîvecîna.  
Zûrî ra qal nîvecîna.  
Gîyo vişk kî ra nêdiseno.  
Tase zûrî ra nêçirengena.  
Fekê şarî şilabend nîyo ke kê bestê.

Mintiqe: Pîran



Amadekar û Berhevkar:  
Mehmed Emîn HEZER

## Melayê Gulê

Rehmet day<sup>1</sup> bavêt<sup>2</sup> hazir guhdaran, berê xwe' b dane piling û şêran, jinê çêtirin ji mêran. Hebî nebî gundekî da Melayê Gulê hebî. Melayek feqîr, xerîb û nezan bî, çî tişt nedzanî. Gelek jî tirsoke bî. Heta dest nivêja xwe jî bin dehmana jina xwe da vedgirt. Xelkê kenya xwe wê melayêt tîna. Jinikên gundi<sup>3</sup> çar çaran gotne Gulê:

- Gulê ew çî mêre, wi halî da hama rojekê ser destnivêjê pêle û were bila serê te jî rehet bît. Gundê melayê me da Gurgê Mirofxwer jî hebiye. Çî maba bin derî't xwar<sup>4</sup>. Mirişk, pez, kurîşk hama çî ber derî ba Gurgê Mirofxwer efi netkir. Axayê gundi jî cevap<sup>5</sup> da milleti got kê wî Gurgê Mirofxwer bînit, ez ê sed zêrê zer bidemê.

Rojekê dîsa destnivêja Melayê Gulê têt, jina xwe dete gel xwe't çine destnivêjê. Wê carê xeberêt jinên gundi têne bîra Gulê. Gulê, mela hêla ser destnivêjê û bezî hate gundi. Mela ku dît jina wi't bezît kire qîreqîr û hewar. Gurgê mirofxwer jî hay mela bî. Gurg van deran simsim<sup>6</sup> dorrexêt<sup>7</sup> mela zivirî. Mela xwe'<sup>8</sup> gurgi da. Got:

- Ew e kerê mixtari ye, ez dê bê me mal belkî ser xatra wî kerî gulê derî bo min veket.

Gurgê xwe bire ber derî Got:

- Gulê gulê rabe min kerê mala mixtari îna<sup>9</sup>. Em dê sibê bo xwe pê daran kêşin.

Gulê ber pencerê zêndayê<sup>10</sup> mela Gurgê Mirofxwer girtî. Gulê kire qîrîn:

- Gundîno! Werin mela Gurgê Mirofxwer girti. Zû cewabekê bidene axa.

Sê çar mirovêt<sup>11</sup> axa hatine cêpmaîn<sup>12</sup> dane Gulê:

- Kiçê mela û Gurgê Mirofxwer? Ew melayê hinde he tirsoke neşêt<sup>13</sup> tinê çî tî destnivijêd çawa wi Gurgê Mirofxwer bigirît.

Heqeten zêndanê Mela gurgê mirofxwer girti, îna<sup>9</sup> ber derî. Mirofêt axa gurg girtin birin. Mela ta yek hatê, tirsîya. Qet negotinê jî te gurg girtiye. Axa mela gazî kire mala xwe. Gotê:

- Ka were, te ew Gurgê Mirofxwer girtiye, ez ê sed zêran bideme te. Mela he'd<sup>14</sup> got:

- Min nevêt min çî gurg negirtîne, kerê mala mixtari bî.

Zêrêt Mela danê, jina wi pê keyfxweş bî salakê du salan pê wan zêran idare kirin.

Wê carê jî şehrek<sup>15</sup> ketiye nav bişe gundi<sup>16</sup>. Çî kes neşêt bo xwe biçît daran bînit.

Gundiyan xeber dana axa. Gotine axa:

- Bîst sih mirofêt xwe de gel Mela bila biçin wi şehri bigirin an jî bikujin ca em jî rehetî êdî biçin darêt xwe bînin.

Xeber dana mela, mela bieci<sup>17</sup>. Gulê rabî nan ,kade bo çêkirina ratiba<sup>18</sup> wi dagirt . Mela he'dibêjît:

- Ez neşêm ez ê çawanê biçim wi şehri bigirim dê min bixwit. Gulê gotê:

- Tu ji rabe gel hevalêt xwe here ya xudê<sup>19</sup> destê te îna tu ji hama wê bike. Wan çî kir tu jî wê bike. Mela mecbûr ma gel mirofêt axa çû. Rojekê duyan nobed girtin, şêhre xwe peyda nekirin. Rabîn ca nanê xwe bixwin kada mela destê wi da ket givirî<sup>20</sup> mela da ber kada xwe. Kada wi heta binê dara kewzanê hat. Got:

- Villah ew dare law e bilind e. Ez ê ser wê darê rûnêm. Heta ew ne şêhri xwe'digirin.

Çû ser kewzanê tenaw<sup>21</sup> rûnişt, kete spih kuştinê. Qedereke<sup>22</sup> dirêj derbas bî. Şêhr hat stuhê xwe qurmê dari hisû<sup>23</sup> îna bir, îna bir dar hejiya mela kete ser piştâ şehri. Her du guhên şehri girtin gazi hevalêt xwe kir. Heval lê xirbîn<sup>24</sup> şehre xwe girtin. Çovên Melayê xwe maçî kirin. Gotnê:

- Mela te çî kir, te çawa girt? Mela got:

- Villah hema Xudê çêkir.

Şêhrê xwe girtin birne gundi. Axa carek dî mela xelat kir.

Melayê Bexdayê mehtê melayê Gulê bêhîsibîti. Ilmê mela, qaweta mela heta Bexdayê çûye. melayê Bexdayê got:

- Ka gazi wi melaî bikin, ka ew çî mela ye wesa.

Gazi Mela kirin, Mela hate dîwana Melayê Bexdayê. Feqîri xwe da piştâ deri. Melayê Bexdayê gotê:

- Kerem ke ez xulam, kerem ke serê jori, ma ew der cihê te ye.

Çû cihê jori ber teniştâ melayê Bexdayê rûnişt. Melayê Bexdayê ilma wi melaî gelek meraqit kir. Destê xwe şiba çixziyekê çêket înan bir, înan bir. Melayê Gulê jî destên xwe hindî şa<sup>25</sup> vekir û rabî çû. Melayê Bexdayê got:

- Villah babo ez neşê me wi melaî. Ilmê wi melaî gelek e. Min destê xwe vehe înan bir anî ez cuva<sup>26</sup> dîni me, ewi jî destên xwe vekirin anî ez seri kanî me.

Mêrikek ji diwanê rabî ji derve melayê Gulê girt. Gotê:

- Mela, tu Xudê! Te çî gote melayê Bexdayê we he bêdeng bî, te zû berda. Mela gote mêrki:

- Vilah, ewi destê xwe înan bir înan bir anî gote min "Jina min serê jori radzêt, pêyêt wê jî heta ber deri tîn, jina min hind bejin dirêj e". Min jî destê xwe hindî min şa, min vekir ani min jî gotê "Xwelî serê te, jina min yek e xir e girovir, aha ew e qûnêt wê."

Herêm: Gever/Colemêrg

Çavkanî: Zelîxaya Keça Mela Hamid

Temen: 55

<sup>1</sup> Dayik

<sup>2</sup> Bavên/"êt" didevoka Colemêrgê de Qertafa Veqetandekê ya pirjimariyê ye.

<sup>3</sup> Didevoka Colemêrgê de qertafa tewangê ya nêr "i/i" ye

<sup>4</sup> Çîma babin deri dixwar

<sup>5</sup> Xeber

<sup>6</sup> Jibo dek û dolaban li cihêkê geryan.

<sup>7</sup> Dêrdor

<sup>8</sup> Xwe li

<sup>9</sup> Anîn

<sup>10</sup> Mêzekirin

<sup>11</sup> Mirovên/"êt"di devoka Colemêrgê de Qertafa Veqetandekê ya pirjimariyê ye.

<sup>12</sup> Cêpmayîn: agahî, mizgîn

<sup>13</sup> Nikare

<sup>14</sup> He di

<sup>15</sup> Şêr

<sup>16</sup> Cihên dar û ber/Daristan

<sup>17</sup> Tirsîya

<sup>18</sup> Xwarina pale û rêwîyan

<sup>19</sup> Xwedê

<sup>20</sup> Gindirî

<sup>21</sup> Rehetî

<sup>22</sup> Dem/Zeman

<sup>23</sup> Sûtikandin

<sup>24</sup> Kombûn

<sup>25</sup> Karin

<sup>26</sup> Cihoka avê

# MAMIK

1. Çar im çîr im,  
Behr im bîr im.

2. Ji pîrs hetanî Xurs,<sup>1</sup>  
Ji biçûk û mezinê mala bavê xwe bipîrs,  
Kesê dîtiye golik di zîkê çêlekê de avis.

3. Hundirekî şûştî mûştî,  
Çardeh (heft)(pênc) heb axa tê de rûniştî.

4. Qutiya du dermana,  
Venabe heta axir zemana.

5. Şêrîno li darîno,  
Darîno li gobelo,  
Gobelo bi rê ket,  
Pê peno bi dû ket.

6. Sima hêstirê,  
Sî û sê mal tê de distirin.

7. Hundirekî bê derî,  
Tê de rûniştî axayekî bêserî

8. Diçim serê zinarekî  
Dikutim bizmarekî  
Deng diçe heftê û hezarekî

<sup>1</sup>Xurs: Navê newalekê, ku ji duwanzde gundan pêk tê, li herêma Mêrdînê ye.



# BERSIV




# DEKÎ



- 1-Ez şina kê xalan, pîrnîkê hemîn tadayî.
- 2-Ez nan pewcena tebera ronena ,nimac di şina çîk çînyo.
- 3-Tanzî şina geyrena kîngê bo , yerey yena verê beyra.
- 4-Dapîrek derero şina tim vitvityena.
- 5-Çiwaşa çewt pê hewt koyon di kewt.
- 6-Ez şina binê dewaran di geyrena hebêk çîwaşa raşte çîna.
- 7-Ez şand hewşê xo kena pîre bîzan nimac di werzena hebêk çînyo.

## VERPERSÎ



- 1- Nihey
- 2- Estarey
- 3- Lastîgî(solî,şekalî)
- 4- Awe
- 5- Rayîr
- 6- Qocî
- 7- Estarey

Arêkerdoxe:  
Leyla GULTEKÎN  
Herem:  
Şela Heydo/Dara Hênî



Institut kurde de paris



kurde de Paris

